# *Aqil, zêhn û ziman*

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

*Aqil, zêhn û ziman*

Weşanên SORAN e
.
2015
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-945956-01-4

.

..

## AQIL, ZÊHN Û ZIMAN

Aqil, dîroka pêşketina wê, pirr kevn diçêt. Her wusa, dema ku mirov bahse aqil bike, divê ku mirov dîroka hizirkirinê ji destpêkê hilde li destê û bi dest hanîna li ser ziman bike. Li vir, mirov dema ku bi dest hizirkirinê kir û pê de, bi aqil dît. Bi aqil dîtin, wê weke aliyekî hişarî bê. Her wusa, li vir, dema ku em weke hişarîyê bi aqil dîtinê werênina ser ziman, divê ku li vir gotina ´hiş´ bi teybetî weke gotina hîm hildina li dest û werênina ser ziman. Gotina hiş, her wusa ne gotinaka ku em tenê dikarin bi hizirkirinê û ankû bi dest hizirkirinê re bi sînor werênina ser ziman a. Ji wê zêdetirî, weke gotinaka ku di zimanê me(di kurdî de) de bi cih bûya, têgîneka di derbarê wê hizra bi hizirkirinê re ku bûya re jî bi xwe re dihêne ser ziman. Ev jî, weke hişmendîyeka hizrê jî ya. Bi gotinaka din, em dikarin weke hizra hizrê jî werênina ser ziman.

Hizra hizrê, wê weke gotin û ankû têgîneka ku li ser pêşketina aqilê mirov re wê were ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de aqilê ku hin bi hin êdî piştî bi hizirkirinê re ku bi destpêşketina xwe dike û pê de, wê bi dest kifşkirinê bike. Hizir, bi serê xwe nerîneka li jîyanê ya. Lê dema ku hişmendîya wê hizrê afirî û pê de, wê di jîyanê de ew hizir êdî weke têgîneka afrîner ya zindî jî bê. Em li vir, vê rastiyê weke rastîyeka têgînî jî divê ku werênina ser ziman. Çîrok û dîroka hizirkirina mirov, pirr kevn a. Her wusa, dema ku em bi dest hizirkirina di derbarê hizirkirinê de bikin, weke pêvajoya wê hizirkirinê ya pêşî, em divê ku hîskirinê weke rengekî hizirkirinê ê pêşî bibînin û werênina ser ziman. Dema ku em vê rewşê bi vê rengê werênina ser ziman, divê ku em serdemên berî dem û serdemên şariştanîyê, di vê çerçoveyê de werênina ser ziman.

Dîroka hizir, her wusa, em divê ku di vê çerçoveyê de weke dîrokek bi hiş werênina ser ziman. Li vir, dema ku mirov bi dest hizirkirinê kir û pê de, zimanê mirov jî pêş dikeve. Têkiliya ziman û hizirkirinê, wê bi gotinan re ji navikê ve bi hevdû ve girêdayî bê. Em divê ku vê rastiyê jî, her wusa bi hevdû re girêdayî werênina ser ziman. Ziman, dîroka wê, giring a ku mirov werênê ser ziman. Her gotinên ziman, wê weke hişekî salixkirî bê. Em li vir, divê ku vê rastiyê di serî de bibînin.

Li vir, di destpêkê de, em divê ku vê yekê balê bikişênina li ser ku ziman û aqil, weke mijareka ku hertimî li ser wê hizrên cuda hatina ser ziman a. Di dîrokê de, gelek zanyar û fîlosofan, aqil û ankû hizirkirin, bi

hebûna ziman re bi sînor dîtina. Di vê çerçoveyê de ziman, weke hebûna wê aqilê ziman dîtina. Bi gotinaka din, dema ku mirov li gorî wê têgîna wan ya di vê warê de ku mirov bihizirê, divê ku mirov bibêje ku dema ku ziman nebê, wê aqil û ankû hizirkirin jî nebê. Li vir, ev rewşa weke têkiliya di nava aqil û ziman de, weke mijaraka ku navaroka têgînên felsefeyê jî bi xwe re dide kifşkirin a. Bêgûman, her gotina salixkirî, weke aqilekî ya. Lê ji wê wirdetir, divê ku mirov aqil weke heyîneka ku heyî û ankû afirî jî werêne ser ziman.

Mirov, nikarê aqil û ankû hizirkirinê, tenê bi gotin gotinê û ankû hizir hizirkirinê re bi sînor werêne ser ziman. Divê ku mirov hinekî derkeve dervî wê. Her wusa, divê çerçoveyê de, dema ku mirov aqil weke rastteqiyekê herê kir û pê de, êdî ziman jî weke ku ji nû ve di mejiyê mirov de were salixkirin, têgînek bi mirov re çê dibe. Ziman, weke amûrekî ku wê dihêne ser ziman dibê. Lê li vir, dema ku mirov ziman tenê di vê çerçoveyê de jî werêne ser ziman, wê pirr kêm û ne têr bibe. Ji ber vê yekê, ev herdû mijar jî, divê ku di serî de ji ziman bi ber aqil ve û bi aliyê din ve jî ji aqil bi ber ziman ve mirov nêzîkatiyê lê bike û werêne ser ziman. Wê hingî, her wusa weke rastîyek giring ya bi aqil werê ser ziman.

Ziman, aqilê salixkirî ya. Gotinên ziman, her wusa mirov dikarê wusa werêne ser ziman. Her gotin, dema ku mirov di çerçoveya wê de dihizirê, mirov divê ku darêjk, lêker, wate, kirde û her wusa têgînên wê re bi serê xwe werêne ser ziman. Ev jî, wê hingî, gotina zêhnê di serê me de salix bike.

Çerçovaya wateyê ku bi darêjkbûyî, wê bi gotinê re werê ser ziman. Her wusa, her gotin, çend ku weke ku di jîyanê de weke ´kirde´yekê dimêne jî, ewçendî jî bi heman rengî weke têrkerîyeka li jîyanê jî li berçav a. Salixkirina gotinê, ew darêjka ku di ber nerîne mejiyê mirov de diafirêne, her wusa wê bi wê re weke têgîneka bidarêjkî û çerçoveyî dimêne. Em vê rastiyê dibînin. Lê ew darêjkî û çerçoveyîya wê jî, wê bi rewşên ku di jîyanê de afirîna re wê bibê. Dema ku min destê xwe gihand êgir û destê min şawitî, ezê bibêjim ´destê min şawitî´. Ev wê bi serê xwe, weke rewşeka ku hatî bi têgîhiştin kirin bê. Wê weke têgînekê bê. Ev gotin, ji rewşa ku hatî dîtin, wê bi dîmenkirina wê re di mejî de xwe bi gotinê re bide dîyarkirin.

Dîyarkirina bi gotinê re a rewşê, wê li ser gotinê re bibe. Ev ji aliyekî çendî ku weke hanîna ser ziman a gotinê bê jî, lê wê hanîna ser ziman a rewşê bê. Di vê çerçoveyê de wê were dîtin. Her wusa gotin, têgîna

salikirî ya. Em dema ku wê gotinê dihênin ser ziman, em wê têgînê dihênin ser ziman.

Her têgîn jî, zanîn a. Her zanîn jî, hiş a. Her wusa her hiş jî, bi weke hişarîyekê pêşketina wê re, wê weke astaka têgînî ya bi aqilî jî bê. Em di kurdî de ji wê re dibêjin ´bîrewerî´. Bîrewerî, ketina farqê de ya. Her wusa, dema ku mirov bahse ketina farqê bike, mirov wê bahse hişarê bike. Hişar, her wusa, ew ketina farqê de ku bûyî, bi wê re salixkirina wê dibê. Li vir, ev rewş, wê weke rewşek têgîhiştî jî were dîtin. Zanîn, dema ku em bahse wê dikin, em bahse têgîneka ku di mejî de bi têrkerî heyî dikin. Gotina zanînê, her wusa, xwediyê kirdeya xwe ya ku girtîya ya. Em li vir, dema ku li ser wê kirdeyê dihizirin, em ber bi aqil ve diçin. Her wusa, bi wê re êdî em hizirkirinekê li ser wê têkiliya di nava aqil û ziman de jî dikin.

Li vir, div ku mirov vê rastiyê baş fahm bike ku aqil, heyîna wê zanîn a. Weke kirdeyekê, dema ku mirov gotina ´zanînê´ hilde li dest wê rengê aqil bi xwe re werêne ser ziman. Bi gotinî, dema ku mirov gotina ´zanînê´ lê dihizirê, weke gotinaka ku mirov bi wê aqil fahm dike. Yanî, aqil, weke kirdeya vê gotina zanînê dihê ber me.

Aqil, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke têgîneka ku mirov wê dihêne ser ziman a. Di vê çerçoveyê de mirov fahm dike ku aqil weke ´tiştekî ku heyî´ ya. Her wusa, ew tişta ku heyî, weke kirdeya gotina zanînê ku dihê ser ziman jî, wê ew derk û ankû fahma me ya di derbarê jîyanê de bê. Li vir, bo fahmkirina têkiliya di nava gotin û kirdeya wê aqil de, divê ku mirov di nava mejî de hûr û kûr herê. Her wusa, divê ku mirov rengê hizirkirina mejî baş fahm bike û hilde li dest.

Mirovekî ku ji destpêka bûyîna xwe û heta mazinbûna xwe ku di mezelekê de bi tenê hatî mazin kirin û ti tişt nedît, wê çawa bê. Ev mirov, em farz bikin ku ti gotinên ziman jî di mejîyê wî de tûna na. Her wusa, ew tenê gotinekê jî nizanê, wê hingî çawa bike? Meji, wê çi bike. Her wusa, ziman, ku weke ku tê gotin ku tenê rêya ragihandinê bê, wê çaxê, wê mejî, bêî hebûna wan gotinên ziman jî, bihizirê û di xwe de biafirêne. Her wusa, dîtin û bi wênakirina di mejî de wê rewşekê di vê çerçoveyê de derxê li holê. Mejî, di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê xwediyê têgîneka kifşkar bê.

Mirovê ku ti gotin di mejiyê wî de tûna na, dema ku êdî bidest dîtinê kir û pê de, wê ew rewşa ku dîtî di mejîyê wî de bi naqş bibe. Wê rewş, weke tiştekî ku bûyî, di meji de bimêne. Lê wê mirov nikaribê, wê werêne ser ziman. Kengî ku ew rewş salixkir, ya bi gotin kir û pê de, wê

karibê werêne ser ziman. Di aslê xwe de bi gotin kirina rewşê, rewşeka pirr piştre ya mejî ya ku mejî êdî pirr zêde serdest a. Ew rewşên ku car bi car mirov wan ´hîs´ dike lê nikarê werêne ser ziman, ew rewşna bêgotin in. Her wusa ew rewş, mirov dikarê wan weke hizirna ku mirov gotinan ji wan re nabînê ku werênê ser ziman. Car bi car, mirov jî, ev gotin kirîya û gotîya ku «min gotin nedî ku ez bi wê werênina ser ziman.» Ev gotin bi serê xwe, wê têgînekê li vir werêne ser ziman. Em li vir, divê ku vê rewşê, ji du aliyan ve bixwênin. Aliyek ji aliyê aqil û ankû hizirkirinê ve ya. Aliyê din jî, bi gotinê ya. Aqil, bi wê rewşa ku mirov gotî, ´min gotin nedî ku ez bi wê werênina ser ziman» re, xwe ji gotinên ziman serbixwe dike û weke kirdeyeka têgîhiştî dihêne ser ziman. Ev rewş, wê weke rewşek teybet ya kirdeyî bê. Ji xwe, aqil bi gotinê re weke ´kirde´ ya. Lê dema ku em ji aliyê jîyanê ve lê dinerin, weke ku Zerdeşt jî dihêne ser ziman, di çerçoveya dûalîtîyekê de aliyekî din ê têgînî ê jîyanê ya. Her wusa, ev alî, bi hizirkirinê re ya. Em farz bikin ku em ti carî nikarin hizir bikin. Em dijîn. Em jîyan dikin. Lê em tenê bi aliyê ku dijîn ê bûjenî û hwd re hena û hwd. Aliyê din ê aqilî nîn a. Wê çawa wê tenê ew jîyane têrkerî w hebe ku mirov wê dijî ya. ..

Aqil, weke têgîneka ku mirov bi wê bi fahma di jîyanê de, wê weke têgîna dîtina jîyanê jî bê. Her wusa dema ku mirov bahse ´dîtina bi aqil´ dikin jî, em bahse vê rastiyê dikin. Dîtina bi aqil, weke aliyekî ku mirov divê ku pirr zêde hûr û kûr li ser bisekinê ya. Ev wê, weke aliyekî ku emê hewl bidin ku wê fahm bikin jî bê.

Fahmkirin, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, di hundurê xwe de weke kirdeyek vêşarî wê têgîna «dîtina bi aqil» bi xwe re werêne ser ziman. Ji xwe salixkirina têgîna gotina fahmkirinê, hinekî jî, temenê wê li ser vê têgînê ya. Di hundurê gotina fahmkirinê de, emê têgîna ´dîtina bi aqil´ weke têgîneka hîmî ku xwe dide dîyarkirin, werênina ser ziman. Têgîna dîtina bi aqil, her wusa, li vir, weke têgîneka ku em divê ku wê baş fahm bikin a. Her wusa, weke kirdeyeka di hundurê gotinê de dema ku mirov wê hilde li dest, wê tenê weke aliyekî bi fahmkirinê re salixkirî bê. Lê li vir, ev kirde, weke ku em wê bi têgîna gotina ´aqil´ re dihênin ser ziman, weke têgîneka kirdeyî a têrkerî xwe dide dîyarkirin. Dîtina bi aqil, wê bi têgîna xwe re, me di nava hizirkirina me de bibe û bi xwe re di çerçoveya têgîn û nîqaşên li ser darêjka gîyanê re bide sekinandin. Li vir, di hundurê gotina dîtina bi aqil de, weke kirdeyeka vêşarî, têgîna darêjkî, heya. Em di serî de divê ku vê yekê kifş bikin.

Têgîna dîtina biaqil, bi mirov re di çerçoveya pêşketina aqil de dibê. Bi wê re jî, di çerçoveya darêjkîya wê de, dema ku mirov hewl bide ku wê werêne ser ziman, weke heyîneka hişarî wê xwe bide dîyarkirin. Bi mejî re dîtin, hemû dibê dîtina bi aqil. Ev dîtina bi aqil, di vê çerçoveyê de dema ku mirov vê yekê werêne ser ziman.

Dîtina bi aqil, bi mejî re xwe diafirêne. Her wusa, ew dîtina me ya li jîyanê ku heyî, wê jî bi gotinê re bi hişarî dike. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov vê dinerê, mirov wê bi wê hişarîya wê ya ku afirî re binerê û wê fahm bike. Dîtin, her wusa, di çerçoveya dîtina ku bûyî de diafirê. Bi wê re, divê ku mirov bibêje ku dîtin, wê bê nerîn. Nerîn, her wusa têgîna hişarî a li derve ya.

Em dema ku li jîyanê dinerin, em gelek tiştan di hundurê jîyanê de dibînin. Her tişta ku me dît, wê bi darêjk û awayê wê yê ku heyî û me dîtî re wê bi me re weke têgînekê xwe bide mayînda kirin. Ev, tişta ku me dît, piştî ku me dît, wê bi me re weke dîtineka salixkirî wê bimêne. Dîtina salixkirî, her wusa, ew nerîna ku bûya ya. Dîtin, piştî ku bû û ppê de, weke têgînekê heya. Ew têgîn jî, êdî weke hişarekê mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Li vir, dema ku mirov li tiştê nerî û ew dît, wê ew tişta ku me dîtî, bi awayekî ku me dîtî re wê bi me re xwe bide salixkirin. Ew dîtin, wê piştre bi wê heyîna xwe ya ku me dîtî re wê hebe. Li vir ew dîtina ku hatî dîtin, wê weke heyînekê hebe. Dîtin, weke birîqînekê êdî nerîn a. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dîtin, bi dîtinê re weke têgîneka salixkirî wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî, bi derka mejî re ya.

Dîtin, weke derka mejî ya bi nerîna li tiştê re ku diafirê, her wusa bi wê re êdî xwe weke hişarekê dihêne ser ziman. Çerçoveya wê tiştê, awa û rengê wê yê ku hatî salixkirin di hundurê wê nerînê de, wê çerçova, awa û rengê wê dîtinê bin. Her wusa, divê ku miirov werêne ser ziman ku nerîn, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov wê bi gelek hevgirtinên bi hevdû re wê kifş dike. Di çerçoveya wê dîtina wê de, dema ku mirov wê dahûr bike, mirov wê vê yekê bi rehetî kifş bike. Di hundurê, awirekî li jîyanê de, mirov dema ku nerî, wê bi dîtina me re, gelek tiştên ku bi ber çavên mirov bikevin bi hevdû re wê hebin. Ew hemû bi hevdû re nerînek in. Lê di wê nerînê de, ew tişt bi hevdû re hena. Wê nerînê diafirênin. Yanî, çerçoveya darêjka wê nerînê bi derkîya wê re dide dîyarkirin.

Têgîna dîtinê, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi vê rastiyê re wê kifş dike. Her wusa, her nerîn, wê weke dîtinekê bê. Lê her dîtin jî, derkeka bi nerînî ya. Nerîna, derka ji jîyanê ya. Her wusa, piştî ku ew

dîtin bû û pê de, ew nerîn zanînaka ji jîyanê ya. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman ku têgîna nerînê, her wusa weke têgîneka bi hişarî mirov dikarê wê werêne ser ziman. Dîtin, dema ku mirov weke nerînê wê hanî ser ziman, di naqabîna wê dîtinê û wê weke nerînê hanîna ser ziman de têgîna hişkirî ya wê heya. Ev têgîna ku wê dike nerîn.

Çerçoveya dîtinê, weke çerçoveyeka ku mirov bi biyên xwe re digrê ya. Her wusa, dîtin, wê weke têgîneka ku hat dîtin bê. Mirov, tişta ku dibînê, wê di mejî de digirê. Ev dîtin û girtina wê ya di mejî de, her wusa, wê bi pêşketina xêva mirov re êdî bi demê re pêş bikeve.

Em dema ku dibînin di jîyanê de her wusa wê tişta ku mirov wê dibînê, mirov wê di mejî de digirê. Mirov wê tiştê bi rengê ku dibînê re digirê. Lê ew tişt li jîyanê, weke ´tiştekî´ ku heya, wê bi girtina mejîyê me re weke ´derkekê´ wê hebe. Ev derk, êdî biriqîna wê tiştê ya. Bi gotinaka dîtin, dîtina wê tiştê ya. Dîtina tiştê wê, biriqîna wê bê. Di vê çerçoveyê de ev têgîna tiştê ku weke ´madeyê´ jî dihê hanîn ser ziman, bi wê re wê xwe weke hizrekê bi mejiyê me re bide dîyarkirin. Tiştê û ankû ´madeyê´, xwe bi mejiyê me re kirîya weke têgînekê. Her wusa, ew têgîn û ankû ´derk´, wê weke wê tiştê û ankû madeyê, xwediyê awa, reng û darêjkê bê. Ev rewş, bi mejîyê xwe re bi gotinî me çawa bi navkir û pê de, wê bi wê re, bi navê wê tiştê ku mel ê kirî re, wê ew tişta heyî û ya têgînî ya biriqîna wê jî, xwe di têgîna dûalîtîya wê de bide dîyarkirin. Her wusa gotin, bûjenîya xwe ji wê rewşê digrê ku wê rewşê bi mejî û dîtinê re bi xwe re salix dikê ya.

Ev salixkirin, weke salixkirineka ku mirov divê ku ji du aliyan ve lê binerê ya. Yek, ji aliyê tişta ku jîyanê heya ya. Ya din jî, ew birîqîna wê ya têgînî ya. Wê bê navê wan herdûyan. Di jîyanê de wê tişt û ankû made, wê navê bistêne. Piştre bi nav re, wê biriqîna wê jî bi gotinê re salixkirina wê ya darêjkî bistêne.

Salixkirina bi gotinê re, wê di vê çerçoveyê de bi navkirina tiştê û ankû madeyê re dîtina(biriqîna tiştê) weke kirdeya wê gotinê bi xwe re bide dîyarkirin. Ev jî, wê ji tiştê bê. Kirdeya salixkirî û ku weke bûjenî ku dihê dîtin, wê ev kirde bê. Kirdeya bûjenîkî, kirdeya bi tiştê ew salixkirî ya. Ev kirde, kirdeya afirîner û ya bi hesanî ku hatîya fahmkirin û têgîhiştin a. Ev kirde, ji wateya gotinê zêdetirî, darêjka tiştê ya ku hatî dîtin a.

Em dema ku bahse kirdeyê bikin, em divê ku li vir, wê salixkirina bi wê re baş fahm bikin û werênina ser ziman. Li vir kirde, têgîna bi tiştê re ku hatî salixkirin a bi darêjk a. Her wusa, dema ku têgînê navê ´kirde´

stand, hingî mirov dikarê fahm bike ku ew bi darêjk a. Ev jî, kirdeyê bi wê dîtina wê ya tiştê re ku ji wê biriqîya dike kirdeyek têrkerî. Kirdeya têrkerî, kirdeya ku darêjkî ya. Darêjk, li vir, çerçoveya tiştê ya bi awa, reng û heyîna wê re ya.

Têgîna kirdeyî, li vir, dema ku mirov wê di hilde li dest, mirov vê aliyê wê baş fahm dike. Her wusa, kirde, weke têgîneka têgîhiştî jî ku mirov dikarê wê werêne ser ziman, wê li vir, weke zanîna ku em dikarin wê werênina ser ziman bê. Kirde, li vir çend ku bi darêjkî mirov wê bi çerçove, awa, reng û heyîna tiştê re salix dike jî, lê dîsa weke hizirkirinekê xwe dihêle. Mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de jî werêne ser ziman.

Lê li vir, dema ku mirov li kirdeyê dihizirê, bi wê re çerçoveyekê hizirkirinê bi xwe re dide dîyarkirin. Ew çerçoveya hizirkirinê, her wusa, bi hişarî xwe dide dîyarkirin. Çerçoveya hizirkirinê, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku temenê wê li ser dîtina tiştê ya bi hişarî ya. Hizirkirin bixwe jî, piştî dîtina bi hişarî re pêş dikeve. Hizirkirin, fahmkirina tiştê ya bi hişarî ya. Tişt, bi hizirkirinê re weke têgînekê ya. Her wusa, ev jî, wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, hizirkirin, her tiştê, dike weke weke têgînek derkî ya mejî. Ev jî, weke aliyekî hizirkirinê ê zêhnî ya ku mirov bi teybetî divê ku li ser wê bisekinê ya.

Têgîna tiştê, bi hizirkirinê re diafirê. Her wusa, di mejî de ew weke derkê heya. Derk, fahma bizanînî û hişarî a tiştê ya. Her wusa, bi gotinaka hesanî ku mirov bibêje biriqîna wê ya ji tiştê ya. Tişt, bi biriqîna xwe re, xwe dike têgînekê. Her wusa, ev jî, wê were dîtin. Bi dîrokê re, hizirkirin, piştî ku pêşket û pê de, êdî hin bi hin aqil pêşket. Aqil, li vir, weke ancama dîtinê ya. Mirov dikarê aqil li vir, weke ancama dîtinê ya derkî jî werêne ser ziman. Her wusa, em jiv ê aqilê re dibêjin fahmkirin jî. Fahmkirin, hişarîya aqilî ya. Yanî dîtina bi mejî re ya. Dîtina bi mejî re li jîyanê, nerîna bihişarî ya. Mejî, derk dike. Her wusa piştî ku derk kir û pê de, nerîn dike. Ev jî, êdî piştre weke birîqenekê û ankû piştre hişarekê wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, teybetîya mejî ya hizirkirinê, wê bi girtinê re bi hevdû re bibe. Girtin, di xêvê de ya. Xêv, hevgirtinê bi nerînê re diafirêne. Her wusa, em dema ku bahse hevgirtinkirina xêvê werênina ser ziman, ji minaqe dîtina xewnê baştir wê ti mînaq nebin ku em li vir bidin.

Xêv, wê weke minaqek baş bê ku mirov wê hewl bide ku fahm bike. Di çerçoveya derkkirina bi rêya zêhnê de wê xêv, aliyekî temen bê. Heta ku em dikarin bêjin ku wê hîm bê. Her wusa, temenê pêşketina zêhnê mirov jî, wê xêv weke aliyekî temen bê ku mirov bi teybetî li ser wê

bisekinê. Xêv li vir, wê hemû derkên ku girtina wê, bi xwe re bide qaydkirin. Bi wê re jî, ew qaydkirin, wê hişarîya wê bi afirê. Di rengê hizra hizrê de ku mirov wê hişarîyê fahm bike wê rast bê. Ev jî, wê têgîneka ba bê.

Li vir, dema ku em bahse girtina hişê bikin, divê ku mirov xêvê weke aliyekî hîmî hilde li dest. Her wusa, wê ew girtina di xêvê de, bi demê re xwe salix bike, hevbigirê(sentezkirin) û her wusa êdî bi demê re bi afirêne. Li vir, aqilê me, bi demê re di vê çerçoveyê de wê pêş bikeve. Gotina pêşketina aqil bi demê re wê, têgîneka hevgirtinê(sentezê) werêne berbîra me. Em li vir, divê ku vê yekê jî, werênina ser ziman ku ev wê di xêvê de bê. ..

Aqil, weke têgîneka mirov a hişî ya. Her wusa, mirov bi gotinê hişê dikarê wê aqilkirinê werêne ser ziman. Hiş, têgîna ku em bi aqil bi nav dikin bi xwe re salix dike. Her wusa, her hişarkirin, wê bi xwe re salixkirinaka aqilî bike. Di aslê xwe de, mirov dikarê bibêje ku hişarkirin, wê aqil di têgîna kirdeyek têrkerî de werêne li holê. Her wusa, hişarkirin, wê têgîna çerçoveya darêjkê jî, bide dîyarkirin. Ev jî, weke aliyekî din ê ku em divê ku bi hişarkirinê re fahm bikin a.

Dema ku em bahse aqil dikin, em li vir, divê ku vê yekê bi teybetî werênina ser ziman ku bi gotinên ziman re aqil, xwe di çerçoveyek salixkirinekê de dide dîyarkirin. Weke kirdeya gotinê xwe dide dîyarkirin. Gotin, bi wateya ku lê hatîya lêkirin re wê fahmekê bide mirov. Ev fahm, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov digihijê tişta ku mirov ji gotinê fahmkirî. Li vir, pirr giring dibê ku mirov wê ´tişta ku mirov ji gotinê fahmkirî´ wê fahm bike. Ev, wê xwe weke aqil bide dîyarkirin. Tişta ku ji gotinê dihê fahmkirin, wê rengê aqil bê. Her wusa, di çerçoveya gotinê de weke kirdeya gotinê jî, wê xwe bide dîyarkirin. Gotin û kirdeya wê, li vir, dema ku mirov hewl dide ku wê fahm bike, mirov di farqê de bê û ne di farqê de bê, mirov li ser têgînekê disekinê. Her wusa, ew kirdeya ku em bi wê wateya gotinê re dihildina li dest û hewl didin ku wê fahm bikin, ev wê weke aliyekî din ê giring bê ku mirov wê fahm bike bê. Her wusa, têgîna kirdeyê, wê li vir, wê weke sawêrekê xwe bide dîyarkirin. Ev sawêra ku wê têgînê bi mirov re dide çêkirin ku ew fahma ji wê ´aqil a´. Her wusa, em li vir, divê ku li ser rastîya gotinê baş bisekin in. Gotin, çend ku weke têgîneka ku dihê nivîsandin din jî bê, mirov nikarê wê bidest bigrê ya. Her wusa, ew di çerçoveya darêjkkirina mejiyê de me heya. Her wusa ew darêjkkirin û konsantraya ku bi çerçoveyî mejî çêkiriya û salixkiriya, bi wê re mirov

dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de gotin, weke kirdeyeka têrkerî mirov dikarê wê werêne ser ziman. Her wusa, ev kirdeya têrkerî, dema ku mirov li wê dihizirê, bi darêjka wê yaku afirî û êdî hatî salixkirin re, wê weke têgîneka şenber ya li berçav bê. Salixkirina kirdeyê, wê têrkerîyeka heyberî ji wê re bide qizinckirin. Ev jî, wê kirdeyê bi darêjka wê re êdî dike têgîneka têrkerî jî. Li vir, ku em hinekî jî wêre bikin û bi wirde herin û gotinê weke têrkerekê werênina ser ziman, wê di çerçoveya mejiyê mirov de xwediyê hin wateyna bi fahmkirinê re bê. Ji wê zêdetirî jî, her wusa, ew darêjkkirina wê, wê aliyekî giring bê. Gotin bi xwe, dema ku em di çerçoveya mejî de lê dihizirin, weke ku afrînerîya bûjenî a mejî ya. Di vê çerçoveyê de ev têgîna ku mirov re çê dibe, li ser wê wê salixkirinê û hişarîya wê salixkirina di derbarê wê de re dibê. Ev salixkirina ku me li hinekî li jor bi çend gotina bahse wê kir, emê li jêr bi berfirehî li ser bisekin in. Lê li vir, divê ku mirov çend gotinan bo fahmkirina vê xalê bi wê re bike. Ev jî, li vir, giring a. Her wusa, salixkirin, hîmê afirandina têgînê ya di mejî de. Mejî, her salixkirina ku kir, wê di çerçoveya têgîna bûjenîyekê de wê bi heyberî hilde li dest û bide dîyarkirin. Ev jî, wê êdî weke aliyekî wê yê din bê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Salixkirina mejî, wê giring bê. Li vir, em divê ku hinekî li ser wê salixkirina mejî bisekin in. Ev jî, wê li vir giring bê. ..

Dema ku mirov li wê salixkirina mejî dihizirê, her wusa mirov pirr bi dilper dibe. Mejî, bi xwe, wê dilperîyê bi mirov re dide dide çêkirin. Dema ku mirov hewl dide ku wê salixkirina mejî fahm bike, mirov afirandina wê hewl dide ku fahm biike. Ez bixwe, dema ku wê afrînerîya mejî lê dihizirim, weke ku çawa ku zaroyek pêşî di ´embrîyom´ê de ya û piştre dibê ´fostor´ û piştre êdî ew zaro pêş dikeve û şekl û awa distêne dihêne berbîra min. Di mejî de afirîne têgînekê, her wusa, weke afirîna wê zarokê di malzaroka jinê de mirov dikarê bişibenê û werêne ser ziman.

Di mejî de, ew derkkirina di mejî de ji derve, wê di çerçoveya wê hildanê de pergalek çerçoveyê ya rewşê bide dîyarkirin. Her wusa, bi dîtinê re dibê xwediyê çerçoveyekê di mejî de. Her wusa, ew çerçova, wê têgîneka ku mirov li ser wê re dikarê afirîna darêjka wê çerçoveya wê têgînê jî fahm bike wê bide me. Li vir, dema ku mirov wê lê dihizirê, mirov bi wê re têgînê fahm bike.

Têgîn, li vir, di vir de ew hildana ku bûya dimejî de ya. Lê bi hişarkirina wê re ew têgîn êdî dikarê weke têgîn were ser ziman. Ev jî,

wê êdî di mejî de bi fahmkirina wê re bibê. Li vir, salixkirinên di xêvê de û ankû ku mejî kirina, wê bi hevgirtinên ku dike re çerçoveyê bide dîyarkirin. Her wusa,, xêv, wê rewşê, bi wêne bike. Em li vir, dikarin, kişandina wêneyekê weke mînaq bidina nîşandin. Ev kişandina wêneyê, wê rewşek ji rewşa cihê bê. Lê ev rewş, piştî ku bi wênekiirn bû û pê de, êdî ne tenê wêneyek a. Ji wê zêdetirî jî, weke her wêneyê têgîneka jî. Her wusa, têgîneka şenber ya ku hatî kirin a.

Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov çend wêneyan bikişênê û du ji wan wêneyan yek yê jinê û yek jî yê mêr bê. Em ji nîvî ve herdû wêneyan dênina ser hevdû û biçirênin û bikina duqat. Piştre jî, wê wêneyê ku me çirand aliyê rastê ê mêr û ê çapê ê jinê weke ku yê hevdû bê bi hevdû ve bike. Wê di wê wêneyê de ji nîvî ve jin û ji nîvî ve jî mêr bê. Ev, wê bê salixkirineka nû bê. Her wusa, ev rewşabi hevdû ve kirina, di serdema mitolojiyê de di mejî de hatîya kirin.

Her aqil, ji gelek hûrgilan pêk tê. Her wusa, her hûrgilek, weke rastîyekê ya di wê aqilê de. Dema ku mirov hewl dide ku wê fahm bike, her wusa, mirov divê ku vê yekê bi başî fahm bike ku aqil têgîneka jî.

Aqil, bi gotinê re dihê ser ziman. Lê aqil di mejî de diafirê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman. Aqil, bi dîtin û bi hişarkirna wê dîtinê re xwediyê hinek pêvajoyên afirandina xwe ya di mejî de ya. Pêvajoyê afirandina aqil, di mejî de, pirr tevlîhev in. Dema ku mirov afirandina aqil di mejî de hewl bide ku fahm bike, divê ku mirov pêşî, hewl bide ku xêvê û pergale wê ya heyî di mejî de fahm bike. Ev, wê temenekî hîmî ê afirandina wê zanînê bê.

Salixkirinên di mejî de, wê temenê afirandina aqilê me bin. Her salixkirin, wê bi xwe re aqilek bê. Her aqilek jî, zanînek a. Her zanîn jî, xwediyê fahmekê ya. Her fahm jî, dihê derkkirin. Her derk jî, ji derve xwediyê dîtineka hildayî ya.

Aqil, dema ku mirov wê hilde li dest bi pêvajoyên wê ên di mejî de, mirov divê ku di çerçoveya wê ya afirîna di mejî de hilde li dest. Her wusa, aqil, darêjka wê ya ku heya, mirov dikaerê li wê bihizirê. Li vir, dema ku mirov li vê dihizirê, di cih de di mejiyê mirov de têgînek diafirê ku gelo li vir, rakendiyeka fizyolojikê heya û ankû nîn a. Bo ku ev têgîn bi mirov re çê bibe, gelek sedem hena. Sedema pêşî ew a ku li vir, mirov dihizirê ku têgîna zêhnê dervî heyîna zimên ku xwediyê heyînekê ya. Her wusa, dema ku mirov di vê çerçoveyê de dihizirê, wê çaxê, weke ku me li jor hanî ser ziman, ziman dibê weke rêya ragihandinê ya wê têgînê û ankû aqilî. Li vir, divê ku mirov li ser vê xalê baş bisekinê. Li vir, gelek

zanyar û filosofan, aqil û ankû têgîna zêhnê bi ziman ve girêdayî hanîna ser ziman. Gotina ku ´aqilê mirov ê ku mirov fêr dibe, bi gotinên ku mirov wan fêr dibe re bi sînor a.´ Ev li vir, mijaraka ku pirr zanînê dixwezê ya. Em divê ku hinekî li vir li ser vê bisekin in. Dema ku em hewl didin ku li ser vê bisekin in, pêşî, mijara têkiliya ziman û aqil weke mijaraka sereke derdikeve li ber me. Mijara ziman û aqil, weke mijaraka sereka ya. Em li vir, nikarin, weyn û rola ziman, di pêşxistina têgîna mirov a zêhnê mirov de înkar bikin. Lê li vir, gelo têgîna zêhnî, bi ziman bi hîm a? Ev jî, dem ku mirov li wê dihizirê, her wusa, di çerçoveya kirde û gotinê de ku mirov li wê dihizirê, mirov digihijê gelek ancamên di vê çerçoveyê de. Lê em divê ku bi têgîneka aqilî derkevina li ser vê re û li vê rewşê bihizirin.

Em dema ku hewl bidin ku li vir, têkiliya ziman û zêhnê fahm bikin, em divê ku ji dû aliyan ve fektorên ku bandûrê dikin werênina ser ziman. Aliyek, bi derkî ji derve ya. Yanî, dîtinên ku dihên dîtin û her wusa ketina ber çerçoveya nerîna dîtinê de, bandûra wan a. Ev jî, weke aliyekî ku mirov divê ku bi teybetî li ser wê bisekinê ya. Li vir, dema ku em têgîna bi derka derveyî re hildina li dest, divê ku mirov di temenê wê de hişarê weke aliyekî û fektoreka giring hildina li dest. Hişar, wê derkên derveyî ên dîtinî bandûra wan çê bike. Dîtin, dema ku bi bû, wê bi hişar bê. Her wusa, ji xwe di jîyanê de car bi car mirov dibêje ku ´mirov ket farqê de´. Ev gotina, dibêje ku ´ez ketim farqê de´, mirov dikarê di çerçoveya têgîna hişarê de werêne ser ziman. Ketina farqê de bûn, bi serê xwe, mijaraka ku mirov dikarê bi hişarê re werêne ser ziman a.

Ketina farqê de, bi dîtinê re ya. Mirov, bi mejî dibînê. Her wusa wê tişta ku dît, wê bi mejî re bibînê. Ev dîtina mejî ku bû, ku weke dîtinaka hişarî ya, êdî wê di wê çerçoveyê de di mejî de mayindatiya wê hebe. Di vê çerçoveyê de wê were dîtin û ser ziman. Ketina farqê de bûn, her wusa, di vê çerçoveyê de giringa ku mirov werêne ser ziman. Wê têgîna dîtina mejî bi xwe re salix bike. Mirov, car bi car, di jîyane xwe de, carna ku gelek tişt li ber mirov û ankû li berçavên mirov in jî, mirov wan weke ku nabînê li mirov tê. Piştre, bi carekê ku mirov ket hişê wê de, êdî mirov wê bibînê. Ev, bi dîtina bi mejî re dibê. Mejî, ku dît, êdî wê ew tişt were dîtin. Wê were kifşkirin. Kifşkirin û dîtin, her wusa li vir, di vê çerçoveyê de wê bi dîtin û ankû kifşkirina mejî re wê werina ser ziman.

Dîtina bi mejî re, wê weke aliyekî giring bê ku mirov li ser bisekinê ya. Her wusa dîtina bi mejî re, dîtina bi hişarî ya. Mejî, wê dîtina ku girt, bi xwe re salix dike. Mejî, wê dîtinê bi tişta ku dît re weke tişt dibînê û

hişarê di derbarê de çê dike û wê derk dike. Êdî bi vê wê re, wê hildan bibe.

Zaroyekî piçûk, dema ku leyistikekê dileyizê, ew leyistika ku leyist, wê çerçoveya xatên leyistikê di mejî de kifş bike. Vê yekê, wê bi nerînê re bike. Li vir, dema ku em çerçoveya leyistikê, weke darêjkekê mirov wê hilde li dest, divê ku mirov wê dervî têgîna ziman hilde li dest. Her wusa, mirov divê ku ji ziman cudatir wê hilde li dest. Ev jî, wê weke aliyekî giring bê ku mirov wê werêne ser ziman.

Zaroyek, dema ku bi leyistikê re çerçoveyek hat danîn li berê, wê çawa ew leyistik were leyistik were leyistin, wê li wê bihizirê. Her wusa, ev jî darêjka leyistikê ya. Darêjka leyistikê, wê weke rastîya leyistikê ku çawa dihê leyistin bê. Di vê çerçoveyê de dema ku rêz û dor hat leyistina leyistikê, wê li gorî wê darêjkê zarok wê bileyizê. Ev darêjk zarok, wê pêşî fêr dike.

Lê li vir, dema ku em bahse wê ´fêrbûna leyistikê´ dike, mirov weke k u bahse fektoreka derveyî dike li mirov tê. Ev zaro, heta ku wê leyistikê fêrnebê, wê nikaribê wê leyistikê bileyizê. Ev jî, weke aliyekî ya. Ev di mejî de ya. Lê dema ku em di çerçoveya mejî de hildina li dest jî, em divê ku bi wê fektora derveyî ya, fektora hundrayî jî ji bîrnekin. Ev fektora hundurayî jî, xêv û hildanên wê na. Ev aqilê ku bi darêjkî di xêvê de ya, wê ew jî, di wê rewşê de kifşkar bê. Her wusa, li vir, dema ku mirov zaroyeka piçûk a pitikî hilde li dest, mirov divê ku werêne ser ziman ku ew zaro, hê ku nebûya û ne hatîya dunyê, ew di mejîyê xwe de xwediyê wê fereset û ankû potansîyale ya. Ev, bi awayekî rakendî, girtîya. Ev rewşa bi zaro re, wê piştî ku bû û hat dunyê û piştre, wê êdî xwe hin bi hin bide dîyarkirin. Ev zaro, heya ku bi carekê ku fêreka ku hîç wê jîn nekirî were bîra wê. Her wusa, piştî ku mazin bû û piştre jî, ev rewş bi derfeta ku bi wê re bibe. Ev rewş, di temenê wê de heyîna xêvê û girtinên di hundurê wê de hena. Dema ku mirov temenê mirovekî hilde li dest, divê ku mirov weke 70 ´ ankû 80 salî werêne ser ziman. Lê ev temen, ti carî bo xêvê nabûhûrê. Xêv, xwediyê rakendiyeka ku diçêt ta serdemên destpêka mirovî ê hizirkirinê jî ku bi wê re heya ya.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse fektora xêvê bike weke aliyekî hundurînî di temenê wê pêşketin û fêrbûna zaroyê de. Di vê çerçoveyê de, piştre jî ku zimanê zaroyê pêşket, bi alikariya fêrên ku di wê çerçovaya mazinbûna xwe de ku dijî de wê salixkirinan bike. Di vê çerçoveyê de, her wusa zimanê dayikê, wê hertimî temenê pêşketina wê zaroyê bê.

Dema ku zaro, mazin bû û pê de, wê hê ku ne nebûya û ne hatîya dunyê jî, gelek ji wan gotinên ku bi dayikê re hena, weke rakendî wan bi xwe re dihilde. Her wusa, hê di zikê dayikê bidest fêrbûna zarokê wê weke aliyekî teybet ê vê fahmkirinê bê ku mirov bi teybetî divê ku wê fahm bike ya.

Em li vir, divê ku vê yekê fahm bike ku têgîna zêhnî, wê weke têgîneka ku bi rêya ziman dihê ser ziman werênina ser ziman. Lê li vir, dema ku em bahse têkiliya zêhnê û ziman bikin, em divê ku werênina ser ziman ku têkiliyeka pirr tevlîhev di nava wan de heya. Her wusa, weyn û rola ziman, ji ragihandinê zêdetirî heya di wê çerçoveya têkiliya bi zêhnê re de.

Gotinên ziman, tenê têgîna zêhnî salix nakin û nayênina ser ziman. Ji wê zêdetirî weyneka wan ya bi têkilî û girêdanî heya. Ew jî, her wusa, mirov dikarê bi têgîna ziman re werêne ser ziman. Li vir, dema ku mirov bahse salixkirina gotinên ziman dike jî, li vir, çendî ku ji wê zêhnê salixkirin dihê kirin bi heman rengî di çerçoveya têgîneka lêhatinekê de jî ew salixkirina bi kirde û ankû wateya gotina ziman re dihê kirin. Ev, wê di çerçoveya pergalek aqilî a ku bi wê têkiliya zêhnê û ziman bi hevdû re dihê danîn wê were ser ziman.

Em li vir, divê ku vê yekê jî, werênina ser ziman ku têkiliya zêhnê û ziman, di vê çerçoveyê de ji ya ku em dizanîn kûrtira. Her wusa, bi pergalî, divê ku mirov di destppêkê de ji du aliyan ve wê salixkirina bi kirdeyî werêne ser ziman. Aliyê pêşî, bi watekirina gotinê û aliyê duyemin jî bi têgîna zêhnê re lêhatinîya ku dihê lêgerîn û çêkirin a. Ev jî, di çerçoveya hoyandinek têgînî de bi mejî re dihê û dibê. Hoyandina di nava gotin û kirdeyê de, wê rengê hoyandina di nava têgîna lêhatinîya zêhnê û ziman de jî werêne ser ziman. Ev jî, wê weke aliyekî din ê ku mirov divê ku wê baş fahm bike ya.

Ez li vir, dema ku li gotinê dihizirim, ez vê yekê dibînim ku çendî gotin di wê çerçoveyê de hoyandî ya. Minaq, gotinên zimanê kurdî pirr kevn in. Ji serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan û hwd, ta roja me, gelek pêvajoyên têgînî ên aqilî bi wan re buhurî na. Ev pêvajo, wê gotinan, bi gelek rengan, bi wate bike. Her wusa, bi têgînî, dem bi dem ji nû ve salixkirina gotinan ku dibê jî, wê ne temenê vajîbûnaka wê de, lê di çerçoveya hoyandinaka di wê de wê were û bibe. Li vir, em divê ku vê têgîna hiyererşîkî a di nava kirde û gotinê de baş fahm bikin.

Li vir, dema ku mirov li ser têgîna aqil dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de bi aqilî mirov wê rastiyê baş kifş dike. Aqil, wê weke

kirdeya jîyane mirov bixwe jî bê. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê rastiyê baş bi gotinê re werêne ser ziman ku gotin darêjkîya ku wê diafirênê û dihêne ser ziman, wê ew darêjk, kirdeyê bi hişarîya wê re di jîyanê de bide dîyarkirin. Her wusa, li vir, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku her slaixkirin wê têgîneka afrînerîyê bi xwe re werêne li holê. Salixkirin û ankû bi navkirin, weke salixkirina darêjkê û her wusa bi hişarkirina wê ya jî. Ev jî, dema ku mirov li wê dihizirê, mrov dikarê vê jî di dewama wê de bibêje ku salixkirin, têrkerîyeka wê ya darêjkî bi wê re ya ku divê ku mirov bi teybetî wê kifş bike ya. Ya ku wê aqil bike aqilê afrîner jî, wê ev rastî bê.

Gotin, her wusa, li vir, divê ku mirov weke aliyekî giring ê zêhnî jî werêne ser ziman. Zêhn, xwe bi wê dihêne ser ziman. Li jor, me têkiliya ziman û zêhn, ji hevdû cuda da nîşandin. Lê li vir, mirov, weke pêvajoya duyemin weke ya minaq pêşketina bi zarokê re mirov dikarê ziman weke aliyekî giring ê zêhnê jî werêne ser ziman. Her wusa, dema ku zaroke, bi zimanê dayika xwe, li çîrokekê û hwd bi vegotinî lê hisand, wê çerçoveya têgîna bi gotinên çîrokê re wê were û di serê wê de xwe bide salixkirin. Minaq, gotinên ´baş´ û ankû ´ne baş´ ku di nava vegotinê de hatina salixkirin û ser ziman, wê kifşkirineka wan ya bizêhnî wê hebe. Ev jî, wê êdî rengê ziman û pêşketina ziman, di çerçoveya têgîna zêhnê de hinekî dîn giringtir û bi watetir bike. Zarok, salixkirina wan gotinan bi rengê ku di mejî de kir, wê salixkirinê bi wan re bide kirin. Her wusa, wê mejiyê xwe di wê çerçoveyê de pêş bixe. Li vir, dema ku em di çerçoveya zaro de, bibêjin, divê ku mirov bibêje ku her gotin, ji gotin û wateya wê zêdetir, weke zêhnekê ku zarok wê digirê jî dibê.

Dema ku mirov li zarokê dihizirê, mirov divê ku bibêje ku ziman di pêşketina zarokê de, weke aliyekî zêhnî jî tê dîtin. Bi teybetî di zarokên piçûk de zêhnê, di çerçoveya fahmkirinê de lê dihê nerîn. Her wusa, ast û radaya fahmkirina zarokê, dide nîşandin ku zarok çendî bi aqil a. Di zaroeyak sê û ankû çar salî, dema ku **leyîstokek** dane destê wê ku bi wê bileyizê, wê li wê bi hizirê. Piştre roja din, ku wê zaroyê ku leyistoka xwe windakir û ankû ku danî cihekî û nezanî ku zanîya li kûderê, ku jê hat pirsîn ku ´leyistoka wê li kûderê ya´, wê bersivê nedê û di mejiyê xwe de lê bihizirê. Bersivê ku bide û bêje ez nizanim ´mirov dikarê têkiliya wê bi wê hizirkirina wê re dênê û ne dênê jî. Ev pirs, weke pirseke hîmî ku ji zarokê hatîya pirsîn a. Minaq, dema ku mirov pirsê bigûharênê û ji pirsekê zêdetirî gotinekê bibêje ku ” zarok, li leyistoka xwe dihizirê ku danîya kûderê.´” Ev wê weke darekê bê. Lê wê rewşeka hizirkirinê a

zêhnî bi xwe re wêrêne ser ziman. Piştî ku zarok li leyistoka xwe hizirî ku wê bibînê, wê demeka kin û yan jî dirêj de wê bibînê û yan jî nebînê. Li vir, têgîna hişkirinê ku zaroyê leyistoka xwe danîya kûderê, wê weke têgîneka hîmî bê. Li vir, di vê hişkirinê de, wê di wê rewş û temenê piçûk ê zaroktiyê de fektorên hundûrayî ên weke xêvê û hwd, bandûra wan zêdetirî hebe. Lê li vir, em nikarin fektorên derveyî jî înkar bikin. Ji ber ku fektorên derveyî, ku heya mirov dibina serxwe, wê weke fektorna ku pêşî hişkirinê digirin bin.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku di dîtinê de çendî ku weke têgîna ziman giringîya wê, wê hebe. Di vê temenê zarokê de wê têgîna ziman, xwe bi têgîna fahmkirinê re bide dîyarkirin. Zarok, di salixkirina wan gotinan de, hêza salixkirina wê, wê zarok bigihêne dîtina leyistoka wê. Em li vir, dema ku li ser gotinên ziman re, hewl bidin ku vê rewşa têgînê ya bi zarokê re fahm bikin, em bibînin ku gotin, di salixkirina rewşê de kifşkar a. Lê gotin, li vir, çendî ku di mejiyê zarokê de jî bê, weke ku bi zarokê re wê gûmanê dide çêkirin. Zaroyeka leyistoka xwe li serşo´yê da ardê û winda kir, wê piştre li wê bigirihê û wê leyistoka xwe di cih de di serşo´yê de bibînê. Lê piştî ku wê zaroyê leyistoka xwe dît û piştre hat û bi dayîka xwe re rûnişt û dayika wê ji wê re çîrokek vegot. Ku di çîrokê de dîsa zaroyek heya û vêcarê, zaroya di çîrokê de leyistokeka wê heya û wê jî leyistoka xwe li **pêjgehê** windakir. Ev wê di mejiyê zarokê de bicih bibe ku zarokê leyistoka xwe di pêjgehê de windakirîya. Wê weke ku ji bîr bike ku zarokê di serşo´yê de leyistoka xwe windakirîya. Ev, rewşa ”weke jibîrkirinê”, wê bi zarokê re bibê. Lê zaro, wê ji bîr nekê. Ew rewşa berê ku wê jînkirîya û leyistoka xwe li serşo´yê windakirîya wêke têgînekê wê di serê wê de bê. Lê wê di wê kêlîkê de wê ji bîra wê herê. Ew wê di mejiyê wê de di xêva wê de bicih bibê. Darêjka wê rewşê, wê piştre bi rengna din ku zaro di farqê de bê û ankû ne di farqê de bê, wê xwe bi wê re bide dîyarkirin. Her wusa, ev wê temenê hin afrînerîyna jî bê bi zaro re. Li vir, dema ku mirov li vê rewşê dinerê, mirov rastî, têgîneka din jî tê. Her wusa ew jî ev a, ku têgîna windakirinê, bi zaro re afirî ya. Piştî ku zaro leyistoka xwe windakir û pê de, mirov dikarê vê pirsê bike ku ”zaro, wê li kûderê binerê bo ku leyistoka xwe bibînê(?).” Di aslê xwe de bersiva vê pirsê bi zarokê re heya. Lê ew ne di farqê de ya. Li cihê ku wê li wê leyistoka xwe windakirîya, ew li wir maya û ew jîyankirîya û derbas kirîya. Dema ku hat pirsîn ku ”zaro, wê li kûderê binerê bo ku leyistoka xwe bibînê(?)”, hingî pirseka ku bersiva wê tê ´zanîn´ ku bi zaro re heya bi kirina wê re lê

tê lêgerîn. Zaro, wê vê yekê kifş bike. Dema ku zaro, ji fektorên derveyî ku heya wê dibina ser xwe ku dûr were girtin, wê zaro hiş bike ku leyistoka xwe li kûderê bibînê. Li vir, ev têgîna ”dîtinê”, weke kirdeya hîmî ya vê rewşê ya. Wê dîtinê divê ku zaro bi xwe re bike. Li vir, fektorên ku wê alikar bin ji zaro re ku wê bibînê, di serî de ji aliyê hundûrînî ve xêva wê ya. Hey û bal, li vir, weke dû gotinên ku em divê ku weke kirdeyîya rewşê hildina li dest in bin. Heya zaro, wê dîtina zaroyê bi xwe re bênê. Lê wê nede dîyarkirin ku zaro çendî bi aqil û ankû ne bi aqil a. Ya ku wê li vir bide dîyarkirin, ew hey a. Em li vir, divê ku vê yekê, bibêjin ku di zaroktiyê de fêrkirin bi heybûnê re divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, heybûn, hoyandina li rewşê ya.

Zarok, dema ku leyistoka xwe li hundûrû windakiribê, wê piştî ku windakir û ket lêgerîna dîtina leyistokê de, wê ew hîsa hundûr bi wê re hebe. Bi wê hîsê re wê berê xwe bide hundûr. Li hûndûr li kûderê windakirîya? Wê li wê bigerîhê. Mejiyê zaro, wê vê yekê bike. Li vir, fektora hîmî, ew fektora hûndûrînî ya. Her wusa, xêv a. Lê fektora derveyî û bandûra wê jî, heya.

Zaro, di wê temenê xwe de nikarê rewşa derve bibînê û bi xwe re bi têgîn û hişar bike. Ya ku wê bi zaro re, wê valahiyê dagirê jî, ew fektora hûndûrînî ya, yanî xêv a.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di fahmkirina rewşeka tevlîhev de mejiyê zaro, li ser salixkirinên xwe re diçê. Her wusa, ew salixkirin jî, gotinên ku di mejî de salixkirî na. Naskirina gotinan, wê di mejî de zaro serbest bike. Lê kirarîya zaro ku wê çê bike, wê zaro bi zêhnê xwe re têkiliyê bi hevdû re dêne. Di vê çerçoveyê de bi vir ve girêdayî mirov dikarê vê yekê jî bibêje ku mejiyê zaro, serkevtîtira bo dîtina bersivê. Her wusa, di nava leyistokan de, dema ku hinek leyistok hatina danîn ber zaro û hinek ji wan leyistokan hatîya xistin hundûrê qotîyeka sergirtî de. Piştre ji zaro hatîya pirsîn ku ´di hundurê qotîyê de çi heya´. Zaro, pêşî dîtibû ku çi bû û hatibû xistin hundurê qotîyê de. Di kifşkiirna vê wê leyistoka di hundurê qotîyê de zaro bi dîtin û kifşkiirna xwe re serkevtî ya. Ev, rewşeka u zêhnê zaro dide nîşandin a.

Bi awayekî din, piştre qotî tê vekirin û leyistokên di hundurê wê de tên derxistin. Piştre qotîya vala dihê danîn ber zarokê. Piştre ji zarokê(zarok ku sê û ankû çar salî) tê pirsîn ku ”çi di qotîyê de hebû?” Li vir, pirsa çi di qotiyê de hebû, wê ji zarokê were pirsîn, di dîtina bersiva wê de zarok serkevtî ya. Her wusa, ev pirs, xwediyê xwediyê hokera

dema buhurî ya. Her wusa li pirsê lêkera dema bûhûrî ji zaro dihê kirin. Zaro, wê di dîtina xwe de dibînê.

Em li vir, vê yekê jî bibêjin ku dema ku mirov li rewşa zarokê dinerê, dema ku di çerçoveya aheng, têgîn û her wusa pergalekê de çendî ku kirarîya tevlîhevî werê danîn ber zaro, wê mejiyê zaro tevlîhev nekê. Ev jî, girêdayî hoyandina zarokê ya bi aheng û pergalîya rewşê ve ya. Zaro, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi gotinî kifşkirinên xwe dihêne ser ziman.. Lê zarok, ji ya ku êdî hin bi hin dihêne ser ziman, zêdetir jî xwediyê wê ya di serê xwe de. Divê ku mirov di serî de vê yekê bi zaro re kifş bike. Yanî, têgîna her gotina ku zaro hanî ser ziman, tiştekî ku nû ku hanîya ser ziman a, li vir, gotinaka divê ku mirov li ser pirr bihizirê û nîqaş bike ya.

Her wusa, li vir, mirov divê ku vê yekê werêne ser ziman ku zaro çendî dikarê xwe werêne ser ziman. Dema ku em di çerçoveya têgîna ´xwe hanîna ser ziman a zaro´ de li mijarê binerin, hingî, ew rewşa ku weke rewşa zaro ya ´xirabûna ziman´ jî dikeve ber nîqaşê û lêpirsînê de. Her wusa, her rewş, li gorî xwe û rastîya rêbaz û teherê dixwezê bo xwe hanîna li ser ziman. Rewşa xirabûna ziman jî, di gelek rewşan de, mirov dikarê bi çerçoveya ku zaro xwe di wê de nabînê de werêne ser ziman. Ji wê wirdetir jî, mirov dikarê bi rewşek zaro ya ne têgihiştî re mirov dikarê werêne ser ziman.

Li vir, mirov dikarê vê yekê jî, werêne ser ziman ku ev rewş bi me dide têgihiştin ku rewşek û ankû kirareka ku zarok wê tê bi testkirinê re ku serkevtî bê, heya ku hemû zaro di wê de ne serkevtî bin. Dema ku weke şablomekê heman testê li hemû zarokan mirov bike, wê hingî, di hinekan de başîyê û di hinekan de ne başîyê bide nîşandin. Heta ku di hinek testên ku pirr bi ”aqilane” tên hasibandin de, ew zarokên ku ”weke ne zêde jîr” û ankû ”pirsgirêka wan ya fahmkiirnê heya” û hwd, ku dihê dayîn nîşandin, serkevtîtir bê. Ev jî, her wusa, ji aliyê kirarî, nêzîkatî û her wusa rewşên testkirinê ve dewlemendiyekê dixwezêt. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi vir ve girêdayî werêne ser ziman ku her rewşa ku zaro di wê de serwaxta, rewşa ku zaro bi mejiyê xwe afirandîya. Di rewşên ku weke qalib dihên danîn ber zaro, rewşên ku di wan de zaro wê serkeve û ankû sernekeve bê. Ji ber ku ew ne zêhnê zaro ya. Lê dema ku zaro, bi zêhnê xwe kir, wê di wê de serkevtî bê. Ev jî, wê bi derfetbûna zaro re ku karibê xwe werêne ser ziman re wê bibe. Zaro, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi zêhnê xwe re serkevtîtira ji zêhnê ku hatîya danîn li pêşîyê.

.

**Jîr û têkilîya wê ya bi ziman re.** ..

Em divê ku li vir, têkiliya jîrê û ziman jî hildina li dest, her wusa ziman bi xwe jî, em dikarin weke têgîneka jîrî hildina li dest. Serdestîtîya li ziman, wê jîrîya mirov xort bike, serdestîya mirov di fahmkirinê de pêş bixe û bawerîya mirov bi mirov bêne. Ev jî, wê bike ku mirov zêdetirî vekirî bê ji pêşketinên pêşketinên din re. Her wusa vekirîbûna ji pêşketinên derveyî re bi awayekî wê civaknasî re ku mirov werêne ser ziman, wê rengekî din ê jîra mirovî jî bide dîyarkirin. Ev jî, wê her wusa, weke ancamaka têgîn û fêra mirov bê. Me li jor bahse zaro û pêşketina wê kir. Emê li jêr, hê li ser vê mijarê rawastihin. Lê li vir, em divê ku hinekî pêşî li ser têgîna jîrê ya bi ziman re bisekin in. Ev jî, giringa ku mirov li ser bisekinê.

Ziman, bi xwe re jî, dema ku mirov li wê dihizirê, di çerçoveya aqil û jîrîyekê de mirov dikarê werêne ser ziman. Di kurdî de gotina ´jîr´, weke gotinaka pirr kevn a. Her wusa ev gotin, têgînekê di derbarê pêşketina aqilîya mirovî a mirov de didêt mirov. Her wusa, dema ku mirov li vir, li ser ziman re li jîrê nerî, mirov vê yekê, dikarê fahm bike. Ziman, bi gotinên xwe re têgînaka jîrî û aqilî a bi bîrewerî ya. Ev têgîna bîrewerî, bi fêr û jîyanbûnê re hin bi hin zêdetir dibê û pêş dikeve. Ev jî, tê wê wateyê ku jîr pêş dikeve. Em li vir, divê ku werênina ser ziman ku şert û mercên mirov, zorê didina hizirkirina mirov. Her wusa, her şert û merc bi rengekî hizirkirinê dide kifşkirin. Li vir, ne şert û mercên xizanî û dewlemendiyê di jîrîya mirov de wyn diileyizê. Ya ku di jîra mirov û pêşketina mirov de weyn û rol dileyizê sê rewşên hîmî na. Yek, xêv a. Ya duyemin fêr û cerba jîyanî ya. Ya sêyemin jî, xwandin û fêrbûna. Her wusa, ev jî, di nava jîyanê de pêşketinê didina kifşkirin.

Em li vir, divê ku vê yekê baş fahm bikin û werênina ser ziman ku jîr, wê fahmaka têgînî ya bi aqilî bê. Li vir, jîra ziman, dema ku mirov wê hilde li dest, mirov çendî ku li wê serdest a, wê mirov serwaxttir û jîrtir bike. Zimanê jîrî jî, zimanê dayikê ya. Em vê yekê jî divê ku binxat bikin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê baş werêne ser ziman ku mirov ji çerçoveya xwe jî fêr dibê. Her wusa, bi dîtin, xwandin û her wusa fêr û ceribandinê, mirov dialimê. Alimîna mirov, wê her wusa, aliyekî aqilîya mirov bê. Li vir, weke ancamna jîrbûnê, xortbûna jiberkirinê û ankû di xêv de girtinê û hwd, wê pêş bikevin. Ev jî, li ser ziman re pêş dikeve. Mirovê ku serdestîya wî li zimanê wî yê civatî û dayikê heyî, ew mirovê

ku dikarê weke xwe gihandinê jîra aqilî. Her wusa, di nava civatê de, têgînên ´hanakkirinê´ û hwd, wê rengna giring ê jîra zimanî û aqilî ya li ser wê re bin. Em li vir divê ku vê yekê werênina ser ziman. Li vir, em vê yekê jî, bibêjin ku çend cûreyên jîrê hebin jî, di temenê wê de têgîna civatî û civaknasî ya civatî weke hîm û bingîhîn a. Em vê yekê divê ku bi teybetî binxat bikin û werênina ser ziman. Mirov, dema ku bi aqilê xwe pêşket, mirov wê di temenê wê de çi bibnê? Wê ziman bibînê. wê xwe hanî ser ziman bibînê. Bikarhanîna aqilê xwe û vaca xwe bibînê. Bi têkiliyên xwe yên civatî û civaknasî û hwd bibînê. Wê bi xwe adilandina xwe ya bi keseyetîyê û dîtinê re bibînê. Wê bi têkiliya xwe ya bi xwezayê û hewirdora xwe re bibînê. Wê bi rengê têj û gûhdarkiirna xwe ya bi musikê û xwandina xwe ya bi wêja û hwd re bide dîyarkirin. Her wusa, bi dîmen dîtin û her wusa awakirinê bide dîyarkirin. Her wusa, ji van rewş û rengan û gelek rewş û rengên din ên weke van mirov dikarê jîrê werêne ser ziman. Mirov dikarê bi jîrê re werêne ser ziman.

Li vir, jîr, weke aliyekî giring ê pêşketina mirov ya aqilî ya. Mirov dikarê weke aliyê pêşketina aqilê xwe jî werêne ser ziman. Bi wê re, mirov dikarê jîrê, weke têgîneka bi serwerbûn û bi karhanîna aqil jî werêne ser ziman. Jîr, hişarîya bi aqilî ya. Mirov divê ku di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ev rewşên jîrî ku mirov dikarê li wan bihizirê, di jîyane mirov de bi mirov re hena. Her wusa, aqil, di jîyanê mirov de bi mirov re heya. Her wusa, rewşên têkildanin û her wusa fahmkirinê jî bi hevdû re di jîyane miirov re bi mirov re hena. Em vê yekê, di jîyane xwe de dibînin. Di jîyane xwe de dîtinên mirov, têkilî û fahmên mirov û her wusa tevgerên mirov vê rastiyê radixina li berçav. Jîrîtî, hinekî, di ahengekê di dewamiya jîyanê de ji mirov dixwezê ku mirov di çeçroveyekê de bi vaca wê re tevgerê bide nîşandin.

Gotina ´kirinên aqilane´ ku mirov di jîyane xwe de dihêne ser ziman, her wusa mirov dikarê vê çerçoveyê de werêne er ziman. Kirinên aqilane, kirinên ku mirov di derbarê wan de xwediyê zanîn û têgînê ya. Her wusa, hişê mirov di derbarê wan de heya ya. Mirov, dema ku kirinekê dike, mirov dizanê ku ew kirin çi ya û ancama wê çi ya û her wusa di derbarê wê kirinê de hişarîya mirov di mejiyê mirov de heya. Ev jî, aliyekî jîrîya mirov ya bi aqilî ya.

Kirinên aqilane, weke ku me li jor bi gotina bi aqil di farqê de bûn û ankû ketina faqê de û hwd re, mirov dikarê werêne ser ziman. Ev rewş, her wusa wê weke rewşna jî bin. Li vir, jîr, dema ku mirov bahse wê dike, mirov dikarê bi aqil û bi karhanîna aqil re jî werêne ser ziman..

Mirov çendî dikarê kirinên bi aqil bike, di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse jîrê bike. Kirinên bi aqil, ew in ku mirov dihisê wê de bê na. Her wusa, di ahengekê de wê aqiliyê bide nîşandin a. Ev rewşa jîrîya bi aqilî ya.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku di temenê jîrîya keseyetîyê de têgîna dîrokê ya serdemên buhurî jî heya. Ew jî bi qas serwerîya li ziman ku serwerî li wê bû, wê bi xwe re jîrîyeka têgîhiştî werêne. Dîrok, hîmekî giring ê ku mirov li vir divê ku werêne ser ziman a..

Civate kurd, ji şerê cihanê ê yekemin ve piştî ku rejimên weke rejmên îranê, tirkiya, Îraq û Sûrî û hwd ava bûn û pê de, di nava wan de hat qatkirin. Yek jî ji wan rejiman ew mirovatî neda nîşandin ku destûrê bidina kurdan ku bi zimanê civate xwe perwerdeya xwe ya civatî û keseyetî bibînin. Lê ji nava civatê, gelek kesyetîyên ku dibistan jî ne xwandibûn, piştre bi helbest, ceribandin, roman û pirtûkên di warên din de nivîsandin. Tevî ku van mirovan perwerdeyek ne hildabû jî, ev nivîsandin kirin. Van mirovan, tevî ku ti dibistan jî ne xwandin û wusa nivsandin? Ev di ancama çi de bû? Ev rewşa van çend mirovên ku bi zimanê civate xwe ku dinivîsandin, dide nîşandin ku serwerbûna li zimanê civate wan, wê ji wan re bê perwerdeya herî mazin ya bi temen dîrok. Tenê, zimanê civate xwe zanibûn û hinekî li wê serwerbûn, têra wan dikir ku binivîsênin. Her wusa, li vir, em divê ku jîra bi ziman û têgîna dîrokê û felsefeya wê ya ku di nava civatê de dijî re werênina ser ziman. Ti civat, nîn a ku ji têgîhiştina dîroka xwe dûr dijî. Dema ku bi civatîtî hat jîyîn, wê hingî, ew dîrok jî, biveje. Her wusa dîrok bi wê civatîtîyê re werê vejandin. Ya ku mirov di vê rewşê de bi rewşa kurdistanê re dibînê jî ev a.

Zimanê kurdî, li herêmên kurdistanê ku bakûrê kurdistanê bê û ankû herêmên din ên weke rojhilat, başûr û rojavayê kurdistanê bê, ku di nava civaknasîya civatîtîya xwe de jîya, hingî digihijî wê asta afrînerîyê. Ev yek, bi awayekî vekirî bi jîrîya dîrokî ya kurd re hatîya dîtin û kifşkirin. Mirovekî ku hîç perwerde nedîtî ku pirtûkan binivîsêne, mirov divê ku li ser wê jîrîya zimanî re bi dîroka civatê re werênina ser ziman. Ev jî, weke aliyekî giring ku mirov divê ku wê li vir kifş bike û werêne ser ziman a.

Jîr, her wusa aqil a. Aqil jî, bi gotinan û ziman dihê ser ziman. Li vir, dema ku em gavê biavêjin û bi ber jîrê ve herin, divê ku mirov, ji ziman destpê bike. Her wusa bi ziman re bi ber aqil û fahmkirinê ve herê. Ji wê jî, bi ber zanîn û jîrê ve herê. Zanîn, ew aqilê ku mirov bi jîrî dikarê wê

werêne ser ziman a. Di nava kurdan de jî, ev bi vî rengî dihê hanîn ser ziman. Her wusa, ew qalibên fêrbûnê ên zimanî ku di serdemên berê de bûna, ew jî, di dema dahûrkirina xwe de têgîneka civatî ya aqilî bi xwe re bi dîrokê re radixina li berçav. Li vir, em vê yekê baş fahm dikin ku jîr, têkiliya wê bi serwerîya ziman re pirr zêde heya. Ji wê jî, wirdetir, têgîn û têgiha dîrokê, wê weke temenekî giring bê ji wê û pêşketina wê re. Her wusa, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman. Di zimanekî kevn de, têgîna jîrî a aqil, mirov dikarê pirr zêdetir kifş bike. Her wusa, zimanê kurdî, vê derfetê bi dîroka xwe re didêne ber me. Di vê çerçoveyê de em vê rewşê, bi têgîna ziman û dîrokê re di temenê pêşketina jîra civatî a kurdistanî de jî divê ku werênina ser ziman. Bi têgîna dîroka wê ya civate wê re ziman, heyîna wê, jîrîyeka giring dihêne û didêne ber me. Em li vir, vê yekê jî divê ku werênina ser ziman. Jîrîya zimanî, li vir, bi giringî divê ku mirov wê kifş bike. Jîrîya zimanê, wê bi serwerbûna li ziman û jîyanbûna civaknasî a civatî û bi têgîna dîrokê re wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin.

Ziman li vir, bi jîrê re weke têgîneka hîmî derdikeve li ber me. Li vir, divê ku em bibêjin ku çendî ku ziman derkeve ber me jî, divê ku em bibêjin ku jîr, weke têgîneka ku bi rêya ziman re dihê ser ziman a.

Li vir, dema ku mirov li axiftina mirovekî dinerê, li gorî şert û mercên ku dijî, wê bêjeyan bêne cem hevdû û hevokan ava bike. Her wusa ziman li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov dibînê ku aqil bi wê re xwe dihêne ser ziman.

Mijara têkiliya ziman û aqil, hertimî di nava zanyar û filosofên serdemên berê ên kevnera de jî bûya mijara nîqaşan. Gelekan ji wan li wê têkiliyê hizirîna û di çerçoveya ziman de aqil hanîna ser ziman. Her wusa Zerdeşt, di çerçoveya ziman de aqil û bi aqil re ziman dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de aqil, weke beşeke serbixwe dibînê û dihêne ser ziman. Dema ku ew bi dûalîtîya xwe re laş û gîyanê ji hevdû çûda dihêne ser ziman, her wusa aqil jî, weke beşeka bi serê xwe dihêne ser ziman. Ev jî, di wê demê de jî dibê mijara nîqaşan, gelek ji wan zaneyên wê demê, bawer dikin ku piştî ku mirov mir û pê de, wê aqil jî pê re winda bibe ji holê herê. Lê hinekan jî bawer dikirin ku piştî ku mirov mir jî, wê aqil bijî. Zerdeşt jî, yek ji wan kesan bû ku bawer dikir ku «wê aqil, piştî mirina mirov jî wê bijî bi gîyana mirov re.» Di vê çerçoveyê de hanîna ser ziman. Di vê çerçoveyê de li ser aqil, piştre jî di nava zanyar û filosofên demê de wê li ser aqil ev nîqaş bidom in.

Di nava civate kurd de bi sedsalan hatîya bawerkirin ku ´piştî ku mirov mir û pê de, wê aqilê wî herê xwûdê.» Heta ku dihat bawerkirin û gotin ku «wê hemû kirin û kiryarên mirov, di hundurê wî aqilî de bin û wê ew aqil herê cem yazdan(xwûdê) û wê wan ji yazdan(xwûdê) re werêne ser zima.» Ev aqil, di serdemên berî zayînê de jî hebûya. Piştre jî, wê hebe û werê ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveya vê hevokê û aqilê de wê gelek aqil werina ser ziman.

Hewldana fahmkirina aqil, wê dîrokê bi xwe re bide nivîsandin. Her wusa, wê ev hewldan di temenê pêşketina civatîtîyê de jî bê. Li herêmên mesepotamya(kurdistanê), wê aqil pirr zêde were xabitandin.

Li ser aqil hizirîn, wê her wusa pirr zêde bibe. Wê hewl bê dayîn ku aqil çiya û werê fahmkirin. Hewldana fahmkirina «koka aqil», wê were dayîn nîşandin. Hewldana fahmkirina koka aqil, her wusa, wê were ser ziman. Gotina «koka aqil», weke gotinaka ku di nava civate kurd de pirr zêde hatîya ser ziman a. Her wusa, di vê çerçoveyê de gelek nîqaş û aqil meşandinên ku heta roja me dihên zanîn jî hena. Em dema ku bahse aqil û pêşketina wê ya di nava civatê de bikin divê ku em van aliyan jî li berçav bigrin û werênina ser ziman. Dîroka aqil, wê pirr kevn herê. Di destê me de, î ro bineter hena ku em dikarin bibêjin ku gotinên aqil ên di zimanê kurdî de ên weke ´hiş´, ´zanîn´, ´ziman´, û hwd, hê di dema hûrî û mîtannîyan de dihatina bikarhanîn bûn. Ev gotinên aqil in. Gotinên aqil, zêde bikarhanîna wan, pirr zêde balê dikişêne li ser xwe. Her wusa dema ku em li ser zimanê kurdî jî, wê lêkolînê dikin, em rastiyê vê rastiyê tên. Her wusa, navê destana «gilgamêş» bixwe jî, ku di kurdî de tê wateya «gayê gir» û û ankû «yê weke gir û weke gayê mazin a» û hwd, dihêne ser ziman. Şibandin, bi aqil dihê kirin. Li vir, ev şibandina weke gayekî, têgînekê di derbarê meşandina aqil a wan demên berê de jî didêt me. Ev şibandina ku bi navê ´gilgamêş´ re dihê kirin, dide nîşandin ku aqil pêşketîya û şibandin li ser têgîna aqilî re dihê kirin. Ev rewşa şibandina weke ga, wê têgîneka aqilane bê. Em divê ku vê yekê di serî de werênina ser ziman.

Ev rewş, di zimanê kurdî de pêşketî hena. Her wusa, şibandina bi vî rengî weke ku bi navê ´gilgamêş´ re ku dihê dîtin, di zimanê kurdî de heta roja me jî dihê kirin. Ev, rewş, di temenê bi teybetî, wasifkirin û ankû bi şibandinê hanîna ser ziman de ya. Yekî ku bi xirabî were şibandin, wê sawalaka ku ne baş tê zanîn û ku zirerê dide mirov wê were naqandin û weke wê were şibandin. Her wusa, bi heman rengî vajî wê jî dihê kirin. Ev rengî têgînê, bi serê xwe jîrekê bi ziman re û li ser gotinên

şibandinê ên ku hatina kirin re dide nîşandin. Şibandin, jîrek a. Divê ku mirov vê yekê jî baş fahm bike. Şibandin, wê têgîneka jîrî ya aqilî bê. Ev jîr jî, jîreka civakî û civaknasî ya.

Jîr, li vir, li ser ziman re dihê dîtin. Her wusa, minaqa şibandinê, rastîya jîrê ya bi ziman re û bi gotinê re dihêne ser ziman. Ev, weke têkiliyeka zimanî ya bi civaknasî ya.

Dema ku em li nava civate kurd digerihin, gelek vegotinên ku ji serdemên berê dihêne vegotin, em wan dibînin û kifş dikin. Ev jî, aliyekî din ê jîra civaknasîya civatîya ku mirov dikarê bi wê fahm bike. Vegotinên ku tên ser ziman, bi dîrokê re ji dem û serdemên berê dihên ser ziman. Ev vegotin hemû jî, bi hevdû re têgînekê dihênin ser ziman. Ev têgîn jî, aqilekî hevbeş ê civatî ku bi dîrokê re hata roja me ku xwe daya domandin a.

Jîr, li vir, dema ku mirov li ser ziman re werêne ser ziman, divê ku mirov hinekî li ser bi watekirina gotinan re jî lê binerê. Ji ber ku ev jî, weke aliyekî zimanî ê jîrî ya. Salixkirina gotinan û ankû ji nû ve bi watekirina gotinan, wê jîra zimanî werêne ser ziman. Ji nû ve bi watekirina gotinan, aliyekî jîrî dihêne ser ziman. Her wusa, li vir, wate li wateyê kirin û ankû ji wateyê fahmên nû derxistin, wê di vê çerçoveyê de jîrîyek bê. Jîrîya zimanî li vir, dema ku mirov bahse wê bike, divê ku mirov rewşa ´hanakkirinê´ ya li ser gotinan re werênina ser ziman. Hanakkirina li ser gotinan re, wê di temenê ji nû ve bi watekirina wan de bê. Ev jî, wê weke aliyekî din ê wê fahmkirinê bê.

Bi hanakkirinê re gotin, bi wateya wê re li gorî rewşê ji nû ve dihê salixkirin û ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê aqil, xwediyê afrînerîyeka teybet ya bi rengê aqil a. Hanakkirin, rengekî nû ê jîrîya aqil a. Em dikarin bi gotina hanakkirinê bibêjin ji aqil derxistina aqil a. Di vê çerçoveyê de, kirina aqil û gotina temenê ku mirov ji dil ji wê şahî û ankû hêstna bi vî rengî û ankû vajî wê bigrê. ..

Hêst, dema ku mirov bahse wê bike, divê ku mirov li vir, zêhnê mirov re li ser wê hinekî bihizirê. Her wusa, hêst, aliyekî giring ê aqilî jî ya.

Têgîna hêstê, wê li vir, giring bê ku mirov bi zêhnê re werêne ser ziman. Her wusa, hêstên şahî û ankû vajî wê ên hêrsbûnê û hwd, bi hemû hêstên din re, zîzbûnekê bi xwe re didina nîşandin. Hêst, dide nîşandin ku şîyarbûn bûya. Şîyarîya bihişarî, mirov bi hêstan re dibînê. Her wusa, ji vê yekê mirov bahse aqilê hêstîyar dike. Aqilê hêstîyar, aliyekî aqilê mirov ê bi zîz û jîr a. Aqilê hêstîyar, her wusa li ser wê heta roja me pirr

zêde hatîya sekin in. Bahse wê hatîya kirin. Li vir, divê ku mirov ji vê têgîna aqilê hêstîyar gavê biavêjin û hinekî bahse têgîna zêhnê jî bikin. Têgîna hişarî, wê bi biyên me re bike ku mirov hilde. Dîtin, destlêdan, têjgirtin û hwd, wê çend ji wan rêyên hildanê bin. Dema ku mirov têja xwarinê digrê, her wusa mirov bi wê hişarîyê digrê.

Têja xwarinê, weke ku me girtîya bi mirov re heya. Ev jî, dema ku mirov têjên din digrê, mirov bi wê re levkirinekê dike ku çêkê. An jî, têjên ku mirov cûda û cûda girtina, bi salixkirina wan re hewl bide ku têjeka din ya bi tahmtir derxê li holê. Têj jî, têgîneka ku divê ku mirov li vir bahse wê bike. Her wusa, ev hemû jî, bi hişarî bi me re çêbûna na. Ev têj, bi me re xwe dijîn. Têja ji xwarinekê ku mirov xweş dibînê girtinê û têja ji hanakkirinaka mirov kirîya ku digrê, ji hevdû ne çûda ya. Tenê, awa cûda na.

Têj jî, weke jîrîya hanakkirinê mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa ew jî jîreka ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a. Hanak, jîreka civatî ya. Têj jî, tahma xwarinaka ku mirov ji wê girtîya. Her wusa, ku bi mirov re rehetbûn çêkirîya ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku jîrîya aqil di vê çerçoveyê de dide li der. Em li vir, dema ku bahse têkiliya di nava zêhnê û ziman de dikin, her wusa, ji aliyê ziman ve bi gotinê re em bahsê dikin. Lê ku mirov ji aliyê zêhnê ve jî lê dinerê, mirov di vê çerçoveyê de wê kifş dike. Her wusa, hanakkirina bi gotinan, minaqek başa ku mirov bi wê ji aliyê zêhnê ve bi jîrîya aqilî bi ziman re ku wê werênina ser ziman. Têgîna hanakkirinê, divê ku mirov weke aqilê civaknas jî werêne ser ziman. Her wusa, bi hanakkirinê, ziman û civaknasîtî, li ser gotinan re weke ku mahraka wan ya têgînî heya. Têgîna hanakkirinê, wê her wusa weke jîrîyeka ku bi wê mirov dikarê baş fahm bike ku ziman çawa di xizmeta aqil û jîrê de ya. Her wusa, di nava wê têkiliya ziman û zêhnê de ku ziman, li gorî têgînê çawa xwe dîde dîyarkirin, mirov di vê rewşa hanakkirinê û jîra wê de kifş dikin.

Em dema ku hewl didin ku rastîya zêhnê û ziman bi hevdû re fahmbikin, em di farqê de na ku em mijaraka dîrokî hewl didin ku fahm bikin. Ziman, weke mijaraka dîrokî ya ku di xwezaya jîyane mirov de ya. Her wusa, di temenê xwe hanîna li ser ziman a mirov de ya. Mirov li ser ziman re xwe dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ziman, wê di vê temenê de weke hîmekî dîrokî û çandî bê bo mirov. Em di çerçoveya civatîtîyê de ku lê binerin, wê aliyê ziman ê xwe hanîna ser ziman bi ziman re ji wê bi wê re aliyê wê yê çandî û têgînî jî were dîtin.

Têgîna aqil, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa mirov bi ziman re wê dibînê. Ziman, xwe dike rastîya hanîna ser ziman a aqil. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werêne ser ziman ku aqil û ziman, wê bi hevdû re werina ser ziman.

Dema ku em aqil dihênina ser ziman, em bi ziman dihênina ser ziman. Ji destpêka dîrokê û heta roja me, bi ziman mirov xwe hanîya ser ziman. Pêvajoyên pêşketina ziman hena. Ev pêvajo, hemû jî dema ku mirov bi têgîna aqil re lê dihizirê, mirov dibînê ku di çerçoveya salixkirina aqilî de êdî hem ziman afirîya û hem jî aqil êdî pêşketina xwe jîya ya. Yanî li vir, aqil û ziman bi hevdû re pêşketina. Mirov, di mejî de hertimî dihizirê. Mirov bi gotinên ziman dihizirê. Gotinên ziman, di mejî de, wê di çerçoveya wê darêjkkirina têgînê, wê afirandinê bidina kirin.

Di serdemên ku ziman bi gotinên bi dengê ne dihat axiftin, bi nîşanakan mirovan axiftin dikir. Her wusa, ev nîşanak jî, xwediyê têgînekê na. Ew jî, rengekî zimanî ê axiftinê ya. Li vir, em dema ku bahse ziman dikin, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku bi gotinên ziman re hevbeşîya ku diafirê, ew jî, wê li ser wê re hevbeşbûn bibe. Li vir, salixkirina gotinên ziman û her wusa bi wate kirina wan, wê weke ku weke hevdû bin. Mirov, li ser gotinan re xwe dihêne ser ziman.

Ji destpêka dîrokê, dema ku mirov bahse têgîna aqil dike, her wusa, bi aqil re weke mijara pêşî a hanîna ser ziman a. Mirov çawa û ji ber çi dihêne ser ziman. Her wusa, mirov pêwîstî pê dîtîya ku pêşî ziman fahm bike. Her wusa, li vir, em vê yekê jî divê ku werênina ser ziman ku çendî ku ziman pêşketîya, wê aqil pêş bikeve. Bi wê re jî, bi heman rengî çendî ku aqil pêşketîya, wê ziman jî xwe pêş de biafirê. Yanî, weke du heyînên ku hevdû ji ji singê şîr didin wê aqil û ziman bin. ..

Aqil, xwediyê dîrokeka pêşketinê ya demdirêj a. Ev dîrok jî, dîroka hizirkirinê ya. Dîroka hizirkirinê, dema ku mirov bahse wê dike, di cih de gotina ´ziman´ di mejiyê mirov de şaq dide. Ev jî, têkiliya wan ya bi hevdû re radixe li berçav. Têkiliya aqil û ziman, her wusa, wê di çerçoveyê debi hevdû re pirr zêde wê hebe. Aqil û ziman, wê bi hevdû re pêşketina xwe bikin.

Em dema ku bahse aqil dikin, ji aliyekî ve aqil, weke kirdeya gotinê xwe di mejiyê mirov de dide dîyarkirin. Her wusa, ev rewş jî, bi zimanê re xwe dide dîyarkirin. Mirov wusa digihijê wê têgîhiştinê di mejiyê xwe de ku dema ku gotinên ziman nebin ku mirov bi wan xwe werêne ser ziman, mirov wê nikaribê xwe werêne ser ziman. Ev, weke hîseka mirovî ya.

Di serdemên aqil de, bi teybetî di serdemên felsefeyê de wê ziman, pirr zêde xwe bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku pêşketina aqil û ziman, wê bi hevdû re di ahangekê de bê. Her wusa, çendî ku aqil pêş dikeve, wê ewçendî jî ziman jî pêşketinê bide jîyankirin û dîyarkirin. Ev têkiliya ziman û aqil ya bi hevdû re, her wusa ti temenê fahmkirinê de mirov divê ku werêne ser ziman. Fahmkirina bi jîyanê re wê bi aqil bibe. Hanîna wê fahmkirinê a li ser ziman jî, wê bi ziman bibe. Ziman, rêya xwe hanîna ser ziman a. Ziman, heyîna hanîna ser ziman a. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de wê werêne ser ziman. Di dîrokê de fîlosof û zanyarên ku hatina û çûna, dema ku mirov li zanîna wan û zimanê wan dinerê, mirov rastîya wan kifş dike. Mirov, weke zindiyekê ku dihizirê ya. Di mejiyê xwe de dihizirê. Dema ku dihizirê jî, bi gotinên ziman dihizirê. Her wusa, mirov dema ku di hundurê xwe de bi xwe bixwe re diafirê jî, hingî dîsa ziman bikardihêne. Mirov bi xwe bixwe re jî dide û distêne. Her wusa jî, li ser ziman re dibê. Ziman, weke têgîneka ku mirov li vir, divê ku wê bi teybetî fahm bike ya. Ziman, bi fahmkirina xwe re wê aqil pêş bixe.

Ez li vir, divê ku vê yekê werênima ser ziman ku di serdemên berê de Zerdeşt jî, dema ku diaxift, giringî dide axiftinê. Her wusa, giringî dide levhanîna gotinên xwe. Di vê çerçoveyê de wî ziman, weke rêyeka rastkirinê jî dîtîya.

Li vir, dema ku mirov bahse dîroka aqil bike, mirov divê ku bi wê re bahse ziman jî bike. Hemû hanînên ser ziman, bi ziman dibin. Wê aqil, xwe bi ziman re werêne ser ziman.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê baş fahm bike ku ziman di jîyane mirov de weke heyîneka afrîner a. Her wusa, mirov di jîyane xwe de jî bi zimanê xwe re rêxistinî û pêşketina xwe dide kirin. Yekî ku nikaribê xwe werêne ser ziman, wê nikaribê, di jîyane xwe de rastkirinê jî bike. Ev, weke aliyekî ku mirov bi teybetî divê ku li ser bisekinê ya. Di vê çerçoveyê de ziman, giringîya wê bi jîyane mirov re dihê dîtin.

Girîngîya ziman, mirov di vê çerçoveyê de kifş dike. Me li jor bahse zarokê û fêrbûna wê kiribû. Her wusa, divê ku mirov li vir hinekî din jî di çerçoveya ziman de bahse wê bike. Zarok, berî ku were dûnyê di zikê dayika xwe de fêrî ziman dibê. Her wusa, bi awayekî rakendî ji dayikê buhurîna li zaro, wê pêşketina bi ziman re biafirê. Ev, di çerçoveya bîolojikî û fizyolojikî û hwd de, divê ku mirov li wê binerê.

Zaro, çend ku di herdû salên xwe yê n pêşî de, weke ku nizanê biaxiftê û ankû ´axifê´ jî ya, em nikarin wê bêziman bihasibênin. Her

wusa, tevgerîyên zaro ku ew xwe bixwe re salix dike, mirov divê wan jî weke rengekî têkildanînê ê zimanê bi hasibênê û werêne ser ziman. Ev serdemên zarokê ên herdû salên pêşî, di aslê xwe de weke salna ku temenê jîrîya zarokê û karîna wê diadilênin in. Mirov divê ku di vê çerçoveyê de giringîyekê bide zimanê zarokê ê vê demê. Zimanê zarokê ê vê demê, wê li gorî şert û mercên ku ew di nav de mazin bûya ya bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku zaro zimanê ku di dema bûyîna xwe ya di zikê dayika xwe de û hwd wê di van salan de bi xwe re biadilêne. Ji xwe, li ser wê adilandinê, wê piştre yek bi yek bi dest gotina gotinan bike û piştre êdî hin bi hin biafirê. Zaro, di vê çerçoveyê de jîrîyeka wê ya teybet heya.

Ev salên pêşî ên zarokê, wê temenê salên piştre ên weke sê, çar û pêncan bê. Di van salên piştre de jî, wê zaro, êdî li ser wê adilandinê re adilandina xwe baştir bike.. Fêrbûnê wê bike. Temenê wê fêrbûnê, her wusa, divê ku mirov bi zaro re heya. Zaro, bi xêva xwe re xwediyê wê temenê ya. Piştre, êdî hin bi hin bi perwerdekirinê re wê xwe ji wê temenê pêş bixe. Li vir, divê ku mirov dualî vê rewşa perwerdeyê werêne ser ziman. Aliyê temen, xêv û aliyê din jî perwerdekirin. Li vir, ew ahenga ku di nava van herdû aliyan de zaro, di xwe de bi hîskirinê hîs dike. Her wusa, çendî ku li gorî wê hîskirinê bû jî, wê êdî pêşketinaka baş bi xwe re bide çêkirin. Bo zarokê, dayik û hal û tevgerên wê ib axiftina wê re weke modelê ya. Ev jî, weke aliyekî din ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û fahm bike ya. Zaro, dixwezê ku li ser hîsê re bi dayikê re têkiliyê dêne. Her wusa, ev jî, wê di temenê pêşketina wê de giring bê.

Hebûna dayikê, hal û tevgerên wê, wê zêhnê zarokê hin bi hin bidest pêşxistinê û şekl bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku zaro, di van salên xwe de çendî ku bersiv ji wan hîsên xwe re digirê, wê ev çendî pêşketinê bi xwe re bide çêkirin. Her wusa ew navenga civatî ya ku ew xwe di wê de rehet hîs bike jî, wê bandûrê li wê bike. Li vir, piştî salên çar û pêncan û hwd, wê daraza zarokê ya herêkirin û ankû redkirinê wê biafirê.

Daraza zarokê, li vir, di aslê xwe de di çerçoveya gotinên wê yê ´herêkirin´ û ankû ´redkirinê´ de ku dihêne ser ziman de, mirov dikarê rengê pêşketina wê jî fahm bike û bixwêne. Her wusa zaro, wê bi wan hal û tevgerên xwe re wê pêşketina xwe bide li der. Wê bide nîşandin. Di vê çerçoveyê de wê zaro, çi fahmkirîya û çi di mejiyê wê de hebe, wê bêne ser ziman. Darazên zarokê, ên ji yek saliyê heta sê saliyê de wê di çerçoveya ên dayikê de bin. Lê piştre wê gûharîn bi wan re biafirê. Wê

gûharîn rû bide. Wê zaro, pêşî çerçoveya wan hal û tevgeran bi hişar bike di mejiyê xwe de. Li gorî rewşên ku di wê serdema xwe de jî ku dijî jî, wê darazê li wan pêş bixe. Ew salên zaroyê ên ku ew di wan de daraza ′herêkirin′ û ankû ya ′redkirinê′ ku dide nîşandin de, wê zaro bi dîtinên xwe re hal û tevgeran bike ber lêpirsînê de di mejiyê xwe de.

Li vir, em bahse zaroyê kir. Emê li vir hinekî din jî li ser zaroyê bidomênin di vê çerçoveyê de. Zaro, dema ku hê ji dayikê bû û pê de, wê bi awayekî bi pergal û sazûman were dûnyê. Zaroyeka ku bêpirsgirêk ji dayika xwe bûya, wê di çerçoveya amede de werê dûnyê. Zaro, ji çi re amede ya? Her wusa, di dema ku tê dûnyê de şert û mercên pêşketina wê weke mirovekê bi wê re hena. Bo axiftinê di xêva xwe de barkirî dihê dûnyê. Her wusa, piştî ku zaro hat dûnyê û pê de, wê di heyvên pêşî de dest derxê. Lê wê di hundurê wan heyvan de, bidest bi rengkirina dengê xwe bike. Her wusa, hin bi hin wê wî dengê ku zaro derdixe, wê zaro wî dengî bike weke dengekî ku êdî hin bi hin ji wê gotin werina fahm kirin. Minaq, zaroyeka kurd, dema ku pêşî deng derxist û piştre wê gotinên weke ”dada”, ”hada”, eza”, ”Haha” û hwd wê derxe. Çend ku dema ku zaro, diaxiftê yek kêm û yek zêde nêzî hevdû wî dengî derdixin jî, wê li gorî pergale zimanê dayikê ku ji wê bûya wê, reng bide wan dengên ku derdixe. Her wusa, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku zaro, wê piştre wan dengên ku derdixe wê bike dengên bi gotin.

Zaro, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di nava wan şert û mercên ku di nava de mazin dibê wê şekl û awa bistêne. Dengên ku derxê, wê her wusa, di vê çerçoveyê de bê.

Zaro, piştî ku hat dûnyê û pê de, wê bi wan çavên xwe yên xweşik ku hertimî li hewirdora xwe dinerê, wê hewirdora xwe kifş bike. Her tişta ku bi ber çavên wê dikeve, wê bi dîtina bi navên wê re wê di xêva wê de werina qaydkirin. Ew qaydkirin, çend ku zaro , ne hişara wê de jî bê, wê ew qaydkirin hemû temenê bi gotinî deng derxistina zaro jî biafirênin. Her wusa, zaro, wê dengê xwe bi awa bike.

Zaro, di van heyvên xwe yên pêşî de, wê bi dest têkildanînê bike.. Têkildanîna wê ya pêşî jî bi dayika wê re ya. Zaroyek ku nû hatî dûnyê û çend heyvî bê, di wan heyvên xwe yên pêşî de nikarê gotnan werêne ser ziman. Lê dema ku birçî bû wê deng bike. Ankû wê li ser dayika xwe bigrî. Bi heman rengî dema binê xwe lewitand jî wê bi wê rengê tevbigerihê. Giriyê zaroyê ên heyva pêşî, rengekî têkiliyên wê ên bi dayikê re û ankû bi hewirdorê re di hundûrê xwe de hawêne. Zaroyeka ku sê û ankû çar heyvî, dema ku dema ku yeka xarib rahiştiyê de wê bigrî Lê

dema ku çû destê dayika xwe wê di cih de ew giriyê wê bisekinê. Ev jî, wê dide nîşandin ku bi zaroyê hîseka ku bi wê re zaro têkiliyê didêne û weke ziman bikardihêne bi wê re heya. Ew hîs, wê di temenê axiftina wê ya piştre de jî bê.

Her wusa, girîyê zarokê, em çend ku weke girî bi nav dikin, em nikarin tenê weke girî bi nav bikin. Ew girî, rengekî têkiliyê di nava xwe de dihawêne. Ew girî, dema ku bû, dema ku mirov di nava şert û mercên wê de lê binerê, mirov wê sedema wê jî kifş bike. Yanî dayika wê ji cem çû û jê dûrket êdî girî. Yan, devereka wê êşîya wê di cih de bi şî bidest girînê bike. Yan, dema ku yeka xarib ku ne dayika wê bê ku rahiştiyê de wê bidest girînê bike, û hwd. Dema ku mirov li vê pêvajoya pêşîya zarokê binerê, mirov wê bi vî rengî gelek sedemên girîna wê biibînê. Di nava wan şert û mercan de, herî zêde dayika wê dibînê û dizanê ku ji ber çi girîya ya. Ji ber ku ew hertimî bi wê re ya. Zaro jî, li dayika xwe ya hoyandî ya. Dema ku zaro nikaribê ´çaparaska´ herê, wê destê rakê hawa bi ber dayika xwe ve**. Di kurdî de zaroyeka ku li ser çokê xwe bidest çûyinê kir, ji wê çûyina zarokê re tê gotin çaparaska**.´ Piştî dema zarokê ya çûyina bi çaparaska hat û bû, êdî wê zarok herî zêde bi mêyla xwe berê xwe bide dayika xwe. Wê bi ber wê ve herê. Dema ku ew li deverekê bê û dayika wê li devereka din bê, wê zaro bi ber wê ve herê.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku zaro, piştî ku çaparaska çû û pê de, wê êdî hin bi hin bidest bikarhanîna gotinan jî bike. Wê bi dest têgîhiştina rewşan û naskirina wan bike. Di wê dema wê de ku bi wê re dijî û dema xwe di buhurêne, wê zarok wan nas bike. Dema ku ew rajinê de, wê ji wan ne tirsê û ji wan baznedê. Wê herê cem wan. Di vê çerçoveyê de wê hoyendinek di mejiyê zaroyê de bi wê re bibe. Zaro, wan dîtinên ku dibînê, ji xwe re weke model bikardihêne di mejiyê xwe de. Di jîyanê de hal û tevgerên wan ên ku dibînê ji xwe re dike mînaq û weke dike.

Zaro, di wê çerçoveyê de dimejiyê xwe de ahengekê dide çêkirin. Li gorî wê ahenge jî, êdî pêşketina xwe bi re dijî. Her wusa, piştî ku hinekî din mazin bû û pê de, êdî wê bidest axiftinê bike.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku di dema ku zaro dihê dunyê de di mejiyê xwe de weke ku ji van rewşên ku bijî re ku amede ya bê, dihê dûnyê. Di vê çerçoveyê de zaro, weke ku amede bê mirov wê dibînê. Zaro, di mejiyê xwe de amede tê dûnyê. Ji dayika xwe tişta ku girtî, ne tenê ew dayikatiya wê ya. Ji wê zêdetirî jî, ji mejiyê wê jî, di çerçoveya feresetê û ankû potansiyelekê de gelek tişt hildana. Ew

hildanên ku ji dayikê hildane, wê wan di wan heyv û salên xwe yên pêşî de bi dîtin û şert û mercên ku di nav de dijî re wê bi awa û şekl bike. Minaq, zaro, ji dayikê, potansiyale darêjkê digirê. Lê wê bi jîyankirinên xwe re wê di jîyanê de bi awa bike.

Ev rewşa zaroyê ku me hanî ser ziman, di çerçoveya wê têgîna potansiyaliyê de ku me hanî ser ziman de wê zaro, çerçoveyeka zimanê jî ku bi wê re bûya û afirîya wê ji dayika xwe werê dûnyê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku zaro, wê bi demê re wê potansiyalê êdî pêş bixe. Wê zaro, wê potansiyalê pêş bixe. Mirov dikarê vê hildane potansiyalê ji dayikê bi vî rengî bi minaq bike. Wê weke ku gîyane darêjkê ji dayikê bigrê. Lê wê ew bixwe darêjkê di jîyane xwe de bi jîyankirin û girtinên xwe re di mejiyê xwe de biafirêne û pêş bixe.

Di vê çerçoveyê de zaro, ji dayika xwe xwediyê rakendiyekê ya. Ev rakendî, wê di xêvê de jî bibe. Li vir, mirov divê ku vê yekê jî, werêne ser ziman ku berî ku zaro werê dunyê ku dayikê xewnek dîtibê, wê ew xewn, bi zarokê re jî bi xêvî xwediyê heyîneka ku em nikarin li vir salix bikin bê. Ev dewamiya ji dayikê li zaro, wê bi xêvê re bê navber bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku zaroyekê ku di nava civate xwe de mazin bû, wê bi zimanê wê û çanda wê re zûtir pêş bikeve. Lê ku di nava civateke din ya beyenî de mazin bibe, wê dîsa weke mazin bibe, lê wê bi tememî di mejiyê xwe de ne weke wê bê. Wê cûdahiyeke bi wê re hebe. Çendî ew zaro, dikarê wê cûdahiyê salix bike û fahm bike, wê ew jî bi jîyane wê re xwe bide li der.

Çerçoveya civatî û zimanî li vir, divê ku mirov herwusa di vê çerçoveyê bi rakendî werênina ser ziman ji dayikê li zaroyê.

Zaro, di dema axiftina xwe de jî, çend ku car bi car weke ku gotinan ji mazinên xwe bigrê û dûbarê bike jî, lê ew di aslê xwe de ne dûbare kirin a. Mejiyê zaroyê, wusa zîz a, wê kifş dike û piştre dide gotin. Ev jî, her tişta ku ji devê zaro derdikeve di çerçoveya xwemaliyekê de dide hanîn li ser ziman. Zaro, di vê çerçoveyê de dema ku tê dunyê jî bi vaca zimanê dayikê û çerçoveya wê re ku amede tê dûnyê. Di vê çerçoveyê de xwe pêş dixe. Xwe pêşxistina wê ya di vê çerçoveyê de wê zaroyê jî di jîrîya wê de pêşdetir bibe. Zaro, çend ku zimanê civate ku di nav de mazin jî bê ku bi wê mazin bibe, lê ku ew ziman ne zimanê dayika wê bê, wê di wê zimanê de zêde ne serkevtî bê. Di aslê xwe di vê çerçoveyê de hê di piçûkatîya zaro de pirsgirêkên pêşketinê bi zaro re xwe didina dîyarkirin. Ji ber ku mejiyê zaro, li gorî wê çerçoveya wê ya ku ji dayikê girtî dihizirê û dixwezê ku biafirêne. Lê dema ku rastî rewşeka din hat, wê zû

bi zû bi wê rewşê re hevnasînê nekê. Ev zû bi zû hevnasîn nekirin, wê bandûra li ser pêşketina keseyetiyê, perwerde û fahmkirina zaro pirr zêde wê hebe. Teybetîya zaro, ew a ku pêşî pêwîstî bi wê heya ku hevbasînê bike. Di salên xwe yên pêşketinê de zaro, ew dengên ku derxistin ku wergerandina gotinan û hanîna ser ziman, wê piştre di wê rewşa nû ya ku ket nav de, yan weke xirabiyekê û yan jî weke kêmesîyekê xwe bi wê re bidina li der. Zaro, li vir, weke ku ji temenê xwe yê ku li ser wê mazin dibû, jê qût bûbe lê tê. Bi wê re jî, êdî wê piştre ev jî temenê bûrîna velîstin(şok)ên ku bijî. Zaro, ku di temenekî mazin de jî bê ku di dema perwerdeya xwe de ku rastî zimanekî din hat û ankû cih guharand, wê vê rewşê bi velîstin(şok)an bi buhurêne. Minaq, zaroyekî kurd, ku heta heftsalîya xwe bi zimanê dayika xwe bi kurdî mazin dibe. Lê piştî heftsalîya xwe ku bi dest dibistanê kir û pê de, wê bi zimanê tirkî bi dest dibistanê bike. Ev jî, wê temenê ne serkevtin û velîstinên ku bi buhurênê bê.

.

**Aqil û ziman û bi pêşketinên felsefîkî re têgîna zêhnê**.

Dema ku mirov bahse pêşketina aqil bike, divê ku mirov dîrokê ji destpêka wê werêne ser ziman. Her wusa, destpêka pêşketina şariştanîyan, mirov dikarê bi têgîna felsefîkî a ku pêşketîya re werênina ser ziman. Serdemên berî demên şariştanîyê jî, em divê ku weke serdemên berî serdemên felsefeyê werênina ser ziman. Dema ku mirov dîroka mesepotamiya û ankû ya kurdistanê, li wê dinerê, mirov rastî dîrokeka aqil ya pirr demdirêj a li ber diclê û firatê tê. Her wusa, serdemên sûmerîyan û berî wan serdemên pêşketina bi hizir in. Serdemên weke ên neolîtîkê û berî wê, serdemên ku mirov êdî bi pergalî bi dest têkil danînê kirîya ya.

Di van serdeman de hê aqil, wusa zêde pêşneketîya. Di van serdeman de, mejî, xwediyê têgînekê ya. Xêva mirov de girtinên bi hezaran salan hena. Ev girtin, wê hin bi hin hevgirtin(sentez) di nava wan de biafirin û wê êdî bi dest nîşankirinê bikin. Aqilê pêşî ê ku di van serdeman de pêşketîya di rengê hîskirinê de ya. Her wusa, gotin hê ji dev dernekevin. Mirov nikarê deng derxe. Hê qiriqa mirov bo deng derxistina bi gotinî li gorî ku tê gotin qays û awa ne girtîya. Lê hema bêja di wê serdemê ya. Êdî hin bi hin bo gotin derxistinê qayd digrê. Di nava wê qays girtinê û girtina di xêvê de têkiliyeka ku em divê li vir bahse wê bikin heya. Her wusa, di vê çerçoveyê de afirandinek heya.

Mirov berî ku bibînê, wê pêşî dengna ku derdixe bike. Wê dîtinê bike. Her wusa, di hêtên şikeftan de xêzkirin û danîna li ser hevdû a keviran bo sittera xwe, wê aliyekî din ê vê pêşketinê bin. Mirov, pêşî bi dest dîtina bi aqilê xwe dike. Piştre bi dest hanîna wê ya li ser ziman dike.

Ev serdemên ku êdî bi dîtinê re girtin di mejî de çê dibe, wê çîrokên wê yên pêşî ku di mejî de diafirin, wê ji rengê jîyankirina wan bê. Ev jî, wê bi demê re êdî bi dest hanîna wan ya li ser ziman bê kirin. Hanîn wan ya li ser ziman, wê şoreşeka aqil bi xwe re bêne. Piştre li dûv wê jî, wê hin bi hin şoreşên din ên aqil bi wê re li dûv hevdû bên.

Hanîn li ser ziman, wê di ancama girtinên di mejî de ên bi hezaran salan bê. Wê mejî, xwe bi wê têr bike û bi afirêne. Wê xêva mirov tişî bibe heta ku karibê êdî biafirêne. Piştî ku xêvê bidest girtinê kir û pê de wê êdî bidest hevgirtinê bê kirin. Hevgirtin, wê weke teybetîyeka xêvê êdî pêş bikeve. Lê ev êdî wl rengê pêşketina bi girtinê a di xêvê de bi wê hevgirtinê re biawayekî geometrikî wê pêşketinê êdî di wê xêvê û bigiştî di mejî de bide çêkirin. Her wusa, piştre beşên din ên xêvê, di mejî re diafirin.

. Hizir, di pêşketine xwe de, bi hizrên weke hizre ´xwûdê´ re hinek pêvajoyên pêşketine di buhurêne. Ew pêvajo hemû, bi hev re hizra xwûdê di ancama xwe de diaxifênin. Bi vê yekê re mirov, karê vê yekê ji bêje ku hizir, çend ku hizre xwûde di serê mirovan de hinekî dî zelal dibe. Di van serdeman de hizra xwûdê wê pêş bikeve û serdest bibe. Mirov, êdî di serê xwe de xwe digihênine wê hizre ku ku xwûde ya. Ew ancamaka ku pir mazina, ku di pêvajoya pêşketine hizir de bûya ya. Lê ku xwûde hebe ku ´li kuderê ya´ û ´li kû ya´? Her weha hinek pirs jî, di serê mirovan de bidest çêbûne dibin. Ev jî, bihizir dibin. Ew jî, bi xwe re hinek pêvajoyên din dihêne. Pirsa ´ka´, di serê mirovan de çêdibe. Bi çêbûnê re, lêgerîn dest pê dike. Lê berî ku mirovahî di vê xata vê hizrê de werê wê astê hinek pêvajoyên din di buhurêne. Weke pêvajoyên ku key xwe weke xwûdê di denezêne û hwd. Keyên ku derdikevin ji, xwe weke xwûdeyan denezênin. Bi vê yekê re, weke demeke weke ku hizre xwûdê tê bibersivandin. Bi vê yekê re, êdî ku li bersive wê pirse tê lêgerîn, êdî dema xwedê-keyan jî, bi ber dawiyê ve diçê. Ev jî, rastî serdema pêşketina felsefeyê tê. Hin bi hin êdî demek dî diafirê. Ew dem ji, li ser hizre xwûdê ya. Ew hizir jî, piştre her weha dihê bi darêjkkirin, ku dihê gotin ku ´yekî ku mirov diafirêne û çêdike heya´. Bi vê hizrê re, êdî dihê têgihiştin ku ewê ku key ku dibêje ku ´ez xwûda me´ ji, yekî ew jî afirandiya. Bi vê yekê re, êdî li xwûde lêgerîn dest pê tê kirin. Di dema

xwûde-keyan de xwûde li ardê bû. Ji ber ku wan xwe weke xwûde denezendibû. Lê ku têt têgihiştin ku ew mirova û ne xwûdaya, êdî piştre têt têgihiştin ku xwûde li azmana ya. Bi vê yekê re, êdî dihê hizirandin. Bi vê yekê re, êdî hizre ku ´ew afrînerê hertiştî ya´dihê ser ziman. Lê hê ji hizre xwe gahandina hizre xwûde ji hole ranabe. Mirov, hê ji di xweze xwe bigihinê wî û hizre wî. Bi vê yekê re, hizirkirin, lêgerîn û çûnûhatin çêdibe. Divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman, ku hizre xwûde, di nav mirovan de wan digihêne hevdû û wan bi hev re digihinê pergalaka navxweyî. Êdî mirov di nav xwe de bi pergal jîn dibin. Bi vê yekê re, divêt ku mirov di cih de ji bêne ser ziman ku êdî dema çêbûn û pêşketine şariştaniyan de ji diafirê. Bi vê yekê re, divêt ku em êdî bahsa çêbûn û pêşketine şariştaniyên demên sûmeriyan bike.

Sûmeriyan, di dîrokê de gavaka giring bi şariştanîya dema xwe re avêtin. Wan bi vê yekê re, navê xwûde, li azmana bidest bicih kir û li ardê jî bi avakirina şariştaniya xwe re xwe kirina nimînêrên wî li dûnyê. Bi vê yekê re, êdî bi wan re demeke nû ji ji bo mirovatiyê dest pê kir. Dema şariştaniyê, ji vê xata felsefe û pêşketine wê û di nav mirovatiyê de bicihbûna re demeke girîng diafirêne. Bi vê yekê re, hizir jî pêş dikeve. Mirov bi pêş ve diçê. Çend bi pêş ve çûbûn bû, êdî bi pêşketine hizir re pirsîn çêdibe. Bi pirsîne re, êdî bi hizir re, lêgerîn û hizirkirin dest pê dike. Lê berî ku em her weha di afirandina rêzên xwe de pêde herin, divêt ku em vê yekê ji bêjin. Derketine olê, divêt ku em bênine ser ziman. Ji ber ku ew jî demeke nûya di vê pêvajoya pêşketine de. Ne tenê ji bo vê xata hizir, ji bo mirovatiyê ji demeke nû ya. Ol, ku mirov bi çend gotinan bahsê bike, mirov wê bibine ku di pêşketinê de û di pêşketine hizir de demeke pêşketi ya. Dema pêşketine şariştaniyê ya. Ol, bixwe ji, dibe bîrdoziya şariştaniyê bi hebûn û pêşketin û hizre xwe re. Bi olê re, pergalbûn ava dibe. Pergalbûn ji, hîmê şariştaniyê diafirêne. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku hizre mengîweriyê, bi pêşketine xwe re, her weha demên pêşketinê kifş dike. Di demên nû yên ku tên jî, êdî ´olperestî´ û ´olperestvan´ derdikevine hole. Olperestvan jî, olperestiyê dikin. Ew, di rastiya xwe de, filozofên wê hizrê yên herî mazin in. Dema pêşketine olan jî, bi sê pêvajoyên demdirêj dibe. Dema pêşî, ku di serî de hê ku mirov ji nû ve bi hizir dibe ya. Di vê demê de, ji ber ku hizir bi pêşneketiya, û ku hin bi hin hizir bi pêşdikeve, êdî tişte ku dibine û nasdike, ji xwe re weke xwûde an jî afrîner dibinê. Ev dem jî, dema totemê ya. Yanî dema dagerîyan a. Dema duyem jî, dema mîtolojîyê ya. Ev dem jî, bi totem û dageriyên dema pêşî ku bûna bi watekirin û bi

hizirkirin û bi xwe xwûda danezandina mirovên key re bi pêş dikeve. Dema sêyemîn ji, bi fahmkirin û têgihiştina wan dagerî û totem û mirovên ku xwe weke xwûde denezendina û kifşkirina ´hizra xwûdê´ ya. Ev dema sêyemîn, dema olan a. Êdî ol derdikevin. Êdî dihê têgihiştin ku ´xwûdayak heya ku hemû kesî û tiştî diafirênê.´ Bi vê yekê re, gelek mirovên ku dihizirin û bi hizirkirina xwe re mazin dibin jî, hizrên vê demê diafirênin. Ew jî, dibina filozofên hizre demê. Bi van pêşketin û deman re, gelek dem û pêvajoyên ku dihên û dijîn dibin.

.Em li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku wê piştre li ser wan rengên jîyangerîyên ku weke çîrokan ku êdî tên vegotin, wê piştre nivîsandina wan bibe. Lê dem heta ku werê wê dema nivîsandina wan, wê çend hezaran salan bi ser xwe ve bide buhurandin. Piştî ku nivîsandin bû û pê de, êdî aqil bidest afirandinê kir. Aqilê ku diafirê, êdî hem di afirê û hem di afirêne. Her wusa, êdî pêvejoyek bi nivîsandinê re diafirê. Kêvilbarên nivîskî ên bizmarî ên serdemên sûmerîyan, wê temenê jîyane şariştanî a bi rêgez û rêzkarî bide çêkirin û avêtin. Her wusa, her nivîs, weke binetereka nivîskî wê êdî hebe. Em dikarin her binetera nivîskî, weke pirtûkeka roja me û ji wê maztir jî bihasibênin.

Aqil, wê êdî di jîyanê de bi afirêne. Li vir, em divê ku vê yekê jî bibêjin ku her binetera nivîskî, weke binereteka xêvî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, ev binetera nivîskî wê êdî jîyanê bi awa û şekl bike. Di jîyanê de êdî wê li ser wê re hizirkirin bê kirin. Ew bineterên ku dihên nivîsandin, wê bên xwandin. Bi xwandina wan re, wê hişarî di derbarê gotinan de bi afirê. Her wusa, li vir, her gotin, zanînaka aqil a. Her gotin, wê weke têgîneka ku jîyanê dide kifşkirin bê. Em vê yekê jî divê ku werênina ser ziman ku her gotin, wê xwediyê bandûreka mazin jî bê li mejî. Nivîsa nivîskî, wê bandûra wê pirr zêde li mejî hebe. Mejî, her cara ku wê dixwêne, wê bi hişar dike. Ev jî, wê weke aliyekî giring ê pêşketina aqil a bi demê re bê. Serdemên aqil ên piştre ku weke serdemên mitolojiyê û hwd dihên bi navkirin di serdemên şariştaniyê ên destpêkê de wê di vê çerçoveyê de bidest pêşketina xwe dikin. Serdemên mitolojiyê, divê ku mirov bi giringîyekê werêne ser ziman. Ev serdem, serdemên ku êdî mejî bi dest afirandinê dikê na bin. Mejî, wê di xwe de bi van serdeman û bandûra wan re bi dest qaydkirinê bike. Jiberkirin û hwd, pêş dikeve.

Serdemên mitolojiyê, wê weke serdemna aqil ên giring bin. Her wusa weke serdemna buhurîna li serdemên aqil û piştre ên felsefeyê jî bin. Her wusa, temenê darêjkkirin û têgîna wê, di van serdeman de wê

were avêtin. Têgîna darêjkê, weke mîreteyeka van serdeman a ku mirov wê piştre pirr li ser bisekinê bê.

Darêjk, pêşî bi navê ´xwûdê´ re di temenê şenberkirina wê de wê were ser ziman. Piştre jî, ji wê şenberîyê bi aqil bi ber razberîya wê ya bi têgînî û aqilî de wê biçêt. Her wusa, serdemên aqil ên piştre ên aqil û felsefeyê na. Ev serdem, weke serdemna êdî ku aqil pêş dikeve û pêş dixe ya. Aqil, bi pergalî dihizirê û jîyanê di adilêne. Her wusa, bi wê re hanîna li ser ziman a aqil, wê gelemberîyê di nava jîyanê de bi aqil re li ser ziman û hanîna wê ya li ser ziman re bide kirin. Aqil, têgîneka gerdûnî ya. Em divê ku vê yekê bi teybetî binxat bikin û werênina ser ziman. Piştî ku aqil hat ser ziman, ew gelemperbûn û gerdûnbûna wê êdî xwe dide dîyarkirin.

Aqil, wê piştî pêşketina xwe re êdî weke rengê jîyanê xwe bide dîyarkirin. Bi mirov re aqil, wê bi hişarîya mirovî ku pêş dikeve re, aqil weke nerîna mirov a li jîyanê wê pêş bikeve. Her wusa, têgîna aqilî wê bi hanîna wê ya li ser ziman re bi bandûra wê re zêdetir bibe. Aqil, çend ku dihê ser ziman û bi ziman û ankû nivîsandinê ku dihê qaydkirin û pê de, êdî bandûra wê li jîyanê zêdetir dibe. Her wusa, êdî kifşkarîya aqilî derdikeve li pêş. Mirov dihizirê. Bi hizrê xwe re, di dibînê. Her wusa, çê dibe. Aqil, piştî ku bi dest qaydkirina wê ya bi nivîskî hatkirin û pê de, êdî hişarîya wê ya ku pêş dikeve ji wê weke hizirandinekê, dide afirandin. Hişarîya aqil, wê weke aqil û ankû zanînaka di derbarê aqil bixwe de bê.

Li vir, dema ku mirov bahse aqil dike, êdî wê piştre di hundurê wê de hanîna ser ziman wê bibe. Di nava aqil de hanîna ser ziman a jîyanê û hemû tiştên li jîyanê û bi navkirina wan, wê hem pêşketina aqil bê û hem jî wê pêşketina ziman jî bê. Li vir, êdî aqil, bû felsefe. Aqil, pêvajoya wê ya ku bû felsefe, wê êdî bi serdestîya wê ya li jîyanê bê. Çendî ku di nava wê aqilê de salixkirin û hewldana fahmkirina xwezayê û hwd bû, wê hem mirov li wê serwaxt bike û hem jî wê bike ku aqil pêş bikeve. Her wusa, hewldana fahmkirina jîyanê û tiştên di jîyanê de, wê derkeve li pêş. Têgîna jîyanê wê pêş bikeve. Hewldana fahmkirin û naskirina hertiştê li jîyanê pêş dikeve. Her ´tişt´ê li jîyanê weke madeya derveyî li wê dihê hizirin ku were fahmkirin. Ji wê salixkirina wê, dihê gihandin li hizra wê. Hizra tiştê wê jîyanê di bin serwerîya hizrê de bike yek.

Hizra tiştê û tişta di jîyanê de bixwe jî, wê êdî bi hevdû re di rex hevdû de bi têgîna felsefeyê re bijîn. Her wusa, têgînên ku diafirin wê li ser wê re bi afirin. Her wusa, hê di wan serdemên felsefeyê de gihiştina Zerdeşt li têgîhiştin û hizra ´dualîteyê´ ku di serdemên felsefeyê de weke

têgîneka ´dûalismî´ dihê binavkirin wê pêş bikeve. Zerdeşt, bi felsefeya xwe ya dûalîteyê re, temenê wê têgîna tiştê û weke biriqîna tiştê hizra wê jî afirand.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku aqil, êdî di vê çerçoveyê de bi tiştê re afirandina hizra tiştê re pêvajoyek nû ya pêşketina hizrî pêş dixe. Li vir, dema ku em ji hizra tiştê gavê biavêjin û hin bi hin bi ber têgîna zêhnê ve herîn wê rast bê. Ji ber ku wê êdî ev pêş bikeve. Her wusa, zêhn, weke hizir, derk, xêv, hêst, dîtina xewnê û hwd, bi hevdû re ku jîra wê dihênina ser ziman in. Mirov dikarê zêhnê, weke hebûyîna hişarîyê jî werêne ser ziman. Hemû pêvajoyên hişarî û aqilî ku mirov û mejiyê mirov buhurandina wê di nava têgîna zêhnê de bin. Bi aqil pêşketina têgîn û xûyên mirov, wê temenê zêhnê mirov û pêşketina wê jî bi afirêne. Her wusa, di nava felsefeyê de pêvajoyên ku bi xêvê re buhurîna wê pêşketinaka mazin bi mirov û di mejîyê mirov de bidina çêkirin. Li ser vê re vaca aqilî wê pêş bikeve. Felsefe, bi rêgezî û rêzkarîya wê ya têgînî re wê vaca xwe biafirêne. Her wusa, vac, weke heyîna astaka têgînî ya biaqil, mirov dikarê werêne ser ziman. Mirov dikarê bêje ku di ancama wê ast û radayê de vac pêşketîya. Têgîna vacê, di çerçoveya rêzkarî, rêgezî û her wusa pergalî ya bihizir de, wê xwe di çerçoveyaka darêjkî de bide dîyarkirin. Darêjk, weke heyîna pêşketina vacî jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Li ser vê vacê re wê zêhn xwe bide dîyarkirin. Hêst, xêv, hizirkirin û derkkirin, wê weke rengê pêşketina zêhnê ku xwe bidina dîyarkirin bin. Her wusa, zêhn, bi hişarîyê diafirê.

Zêhn, bi mejîyê mirov re hizirkirin, derkkirin, darazkirin, hêst û tevgerîyên ku diafirin, xwe bi wan jî dihêne ser ziman.

Em dema ku bahse pêşketina aqil û pêvajoyên wê ên pêşketinê bikin, emê her wusa, serdemên felsefeyê bi awayekî giring werênina ser ziman. Ev serdemên felsefeyê, wê hin bi hin pergalbûnê bi têgînî di jîyanê de bi xwe re werênin. Her wusa, di felsefeya serdemên kevnera de wê têgîna ´rasyonalîsmê´ pêş bikeve. Ev têgîn, weke aliyekî wê yê felsefîkî ku wê bidest pêşketina xwe dike têgîna vacê wê hin bi hin pêşketina wê bibe. Her wusa, weke ku çawa ku di têgîna vacê de rasyonalîsm, pêvajoyaka giring a û pêşketina vacê bi temen dike, wê bi heman rengî emprisim jî têgîna zêhnê bi xwe re her wusa di vê çerçoveyê de pêş bixe û bi temen bike. Empirism, her wusa, serdema wê, weke serdema wê ya ku êdî felsefe serdemaka zanistê bi xwe re pêş dixê û wê dijî. Her wusa, divê ku mirov wê werêne ser ziman.

Vac, dema ku em bahse pêvajoyên wê ên pêşketinê bikiin, her wusa, emê têgînên weke ´rasyonalîsmê´ bi têgîna wê ya felsefîkî û hwd re werênina ser ziman. Bi rasyonalîsmê wê vac, her wusa xwediyê wê têgînê bê ku êdî di hizirkirinê de xwediyê tehereka ´dîyelektikî´ bê, têgîna ´nakokîtîyê´ li berçav bigrê, û wê fahm bike û her wusa têgîna dahûrîyê di hanîna ser ziman de li berçav bigrê. Ev rêbazên ku di çerçoveya têgînek rasyonalîsmî de dihên hanîn ser ziman, wê bi pergalî felsefeyê jî, di çerçoveya vacaka felsefîkî de bi têgîn, temen û pergal bike.

Felsefeya serdema kevnera wê vacê, di temenê xwe de pêş bixe û piştre bi buhurê. Her wusa, vac, li vir, êdî wê weke aliyekî giring ku mirov li berçav bigrê ya. Têgîna rasyonalîsmê, her wusa li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di çerçoveya têgînek hatî ´rasyonalîte´ kirin de wê bi levkirineka ku mirov bi wê vacê werêne ser ziman, wê were ser ziman. Li vir, têgîna hizrî, her wusa, di vê çerçoveyê de wê bi demê re xwe bide dîyarkirin. Rasyonalîte û ankû vac ku di felsefeyê de pêşket û pê de, wê teorîkîtî pêş bikeve di nava hizrê de. Her wusa, bi çîrok û ankû mîtolojikî hanîna ser ziman, wê ji nava felsefeyê û rengê hizirkirina wê derkeve. Her wusa, her tişta ku ji wê re îzahak ji wê re hat hanîn, wê weke têgîneka felsefîkî û teorîkî ya bi vac bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de gotina” xwûdê, çûya asmana”, wê weke gotinaka hatina serdema felsefeyê ya bi vac bê. Têgînên aqilane ku ji fahmkirinê re vekirîna, di vê çerçoveyê de êdî pêş dikevin. Ev serdema felsefeyê, wê weke serdemeka felsefeyê ku serdemên navîn ên dîrêj ku bi fêrkirinê buhurîna û li ser wê re êdî lêpirsîna ya maqûl û aqilane çîya û çawa ku dihê kirin, bi wê re pêş dikeve. Dahûrkirina hizirkî, her wusa, wê weke têgîneka felsefîkî ya serdema felsefeya bi vac bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênne ser ziman ku felsefeya bi vac, felsefeya, ku êdî aqil bi aqilane di hizirê û daketîya ser rûyê ardê ya. Ev jî, serdemeka aqil û pêşketina wê ya pêşketî ya. Hemû têgîn û felsefeyên serdemên berê ên aqil, di vê çerçoveyê de di berçav de hatina buhurîn. Ya ´rast´ û aqilane, li wê dihê lêgerîn.

Felsefeya vacê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku êdî serdemeka nû ya di pêşketina aqil de. Levkirin, levhanîn û lêhatînî, bi têgînî û felsefîkî lê tê lêgerîn. Bi wê re jî, hizrên weke ´hizrên xwûdê´ ku nayêna vegotin, wê di vê çerçoveyê de bikevina ber lêpirsîna têgîna vacê de. Lê pirsîna bi vacî, her wusa, wê pêş bikeve. Di nava aqil de, ku hebûna zanîn û aqil lê dipirsê û di wê çerçoveyê de ´ ya rast´ û ´ya

xelat´ ku derxê li holê bi aqil meşandinê re dihê kirin. Vac, hinekî jî, wate wê jî ev a. Yanî, bi aqil meşandinê re hewldana kifşkirina ya rast û ya ne rast a. Li gorî vacê, meşandina aqil di vê temenê de ya, ku mirov hemû bi aqil bin û bi hiziribin, wê demê hemû mirovên ku dihizirin û bihizirin mirov in. Her wusa, di nava aqil de li levkirinê lêgerîn, wê weke lêgerîneka bi vacî bê. Lêgerîna bi vacê, wê felsefeyê jî, biafirêne. Di aslê xwe de ya ku felsefeyê di çerçoveya hizirkirinê de rasyonalîze dike jî wê vac û têgîna wê bê.

Rasyonalîze kirina felsefeyê û bi hevdû re di ahengekê de ketina nava lêgerîna wê de, wê di nava jîyanê de jî, wê heman rewşê bi xwe re werêne. Her wusa, ´tevgerîn aqilane´ û hwd, ku bahse wê dihê kirin, wê werina ser ziman. Vac, di vê çerçoveyê de wê heyînên jîyanî û hemû tiştên di jîyanê de weke dîyardeyên ku esas bigrê bê. Bi vê yekê re, wê bi dîtin û fahmkirinê re sînorekî dêne.

Ev sînorê ku bi têgîna vacê re di nava felsefeyê de hat danîn, wê êdî temenê pêşketin û pêşxistina zanistê jî bê. Her wusa, felsefeya dîyardeyî, di vê çeçroveyê de ku temenê wê li ser ceribandinê û hwd a, wê êdî pêş bikeve. Ev jî, wê weke ancamaka felsefeya bi vac ya ku bi demê re pêş dikeve bê. Têgîna ancam û aqil, wê werêne li holê. Ev têgîn, wê weke têgîneka ku hertiştê bike ku bi aqil û felsefeya aqil fahm bike. Bawerîya bi vacê, wê ew bê ku hertiştê di jîyanê de ku karibê fahm bike û ji wan re şîroveyekê werênê bê. Ev têgîn, wê di nava zane û filosofên demê de jî, bê sedema pirr nîqaşan. Gelek zanyar û filosof, wê bawer bikin ku ” mirov dikarê, bi aqilê xwe hemû tiştê di jîyanê de fahm bike.” Her wusa, hinek jî, wê bibêjin ku ” mirov dikarê bi aqilê xwe bigihêne hemû tiştê di jîyanê de.” Ev herdû hizir jî, wê êdî bina hizirna ku temenê şerê di nava felsefeya vacê de dîyar bike. Her wusa, felsefeya vacê, wê di vê çerçoveyê de her têgînên felsefîkî, bike wê rewşê de ku her rewşên ku hena, ku karibê ji wan re şîroveyekê ´rast´ werêne. Ev jî, wê êdî di mejî de bê sedema lêgerînan bi aqil.

Ku em aqil li vir, hildina li dest, her wusa, divê ku em vê serdema felsefeya vacê, weke serdemeka giring û afrîner jî werênina ser ziman. Ev serdem, wê jîyanê, weke ku ji nû ve dîzayn û bi awa bike. Wê di nava rengên jîyanê, tevger û hizirkirinê de li ahengê werê lêgerîn. Ev hewldana di nava rengên jîyanê, tevger û hizirkirinê de li ahengê lêgerîn, wê hin bi hin têgînên weke **estetîsmê** jî temenê wan bide avêtin. Her wusa demên ronasansê ku wê piştre li rojava bidest pêşketina xwe bikin, têgîna levkirinê ya weke ya di nava rengên jîyanê, tevger û hizirkirinê de

li ahengê lêgerîn û hwd, bidest dîzaynkirina jîyanê bike. Çêkirina, peykel û hêkelan, naqşkirina serdorên û pêşîya xanîyan û her wusa hêtên kelehan û hwd, wê ancama vê têgînê de bin. Di hêkelên ku hatina çêkirin de di wan serdemên buhurî de ku mirov bi kevir bê û ankû bi naqkirina bi boyaxê bê, bêqûsûr hatîya çêkirin. Dema ku mirov li wê hêkelan dinerê, mirov dikevê zorê de ku ji rewşa mirovê zindî cûda bike. Ti dibe qay ew mirovekî rasta ku li wir di cihê xwe de sekinîya û bûya kevir. Heta ku ji wê zêdetir û wirdetir jî, di dema çêkirina wan hêkelan de, ew qûsûrên ku di laşên mirov de hena, ew jî, hatina derxistin ji nava wê hêkelê ku hatîya çêkirin. Yanî, bi gotinaka din, hewl hatîya dayîn ku ji ya baş, bi ber ya hê baştir ve ku mirov bi aqilê xwe herê. Di dewama wê de jî ku karibê, xwe bigihêne ya bêqûsûr. Mirov, di mejiyê xwe de hertimî hewldaya ku xwe bigihêne ya bêqûsûr. Hewldaya ku ya herî baş çî ya, wê çê bike û yankû bidest bixe. Ev, wê di temenê têgîna azwerîya mirov de xwe bide dîyarkirin. Azwerî, di temenê wê de xwest, mêl û armanc heya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, fahm bike ku a ku mirov digihijêne vê ast û xalê jî, ev têgîna felsefeyê ya bi vac a. Rol û weyna vacê di nava felsefeyê û hizirkirinê de, divê ku mirov piçûk ne nirxêne. Divê ku mirov mazin binirxêne. Her wusa, wê bi vacê, hertimî hewldana ya herî baş, ku çi ya xwe bigihênina wê. Têgîna felsefeyê, di vê çerçoveyê de, wê bi têgîna vacê re di jîyanê de êdî şoreşan di jîyanê de bide kirin. Her wusa, wê bi wê re hewl bê dayîn ku jîyanek bêqûsûr ku were pêşxistin û ankû avakirin. Vac, wê di vê hewldana avakirina jîyanê de mirov di mejî de bigihêne têgîneka bi pergalî. Her wusa, bi hizirkirinê, hewldana ya levkirî û rast çîya ku mirov wê kifş bike û werêne ser ziman. Bi vacê re rasyonalîzebûna felsefeyê, wê bi xwe re rasyonalîze kirina jîyanê jî werêne. Aqil, di vê çerçoveyê de bi dest afirandinê kirîya. Her wusa, êdî bi hizirkirinê, mirov dihizirê. Mirov dixwezê ku xwe bigihêne ya rast. Mirov dixwezê ku jîyane xwe baş bike. Dixwezê ku baş bijî. Dixwezê ku perwerdeyeka baş hilde û aqilê xwe pêş bixe. Felsefe, her wusa bi pêvajoyên pêşketina aqil re ku wê jîyanê di vê çerçoveyê de bidest adilandinê bike. Di temenê wê adilandinê de jî vac heya. Em li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku mirov êdî di jîyanê de dike ku jîyaneka bi vac ji xwe re pêş bixe û ava bike.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku felsefeya vacê, wê pêvajoyaka bi aqil a pirr giring bide destpêkirin. Piştî ku vac di nava aqil de pêşket û pê de, êdî vacê bi dest rastkirina hemû pêvajoyên aqil ên ku pêşketina jî kir. Ji nû ve şîrovekirina dem û serdemên buhurî û hanîna

wan ya li ser ziman, wê bi wê re bibe. Ev jî, wê bi xwe re rastkirin û dîzaynkirinê di jîyanê de bi xwe re werêne. Her wusa, jîyaneka bi vac, wê êdî were û pêş bikeve. Li jîyanê, êdî bawerî jî, weke ancamaka pêşketina têgîna vacê wê pêş bikeve. Her wusa, ol jî, di wê çerçoveyê de bi awayekî felsefîkî û vacî hatina şîrovekirin. Têgîna gîyan û ´xwûdê´ ji nû ve hat şîrovekirin û hat derxistin li ser jîyanê û mirov re. Li jîyanê jî, weke nimînêrên wê olê, bawermend û bawerî ma. Her wusa, di vê çerçoveyê de pergalek hizrî ya olî jî afirî. Bi di felsefeyê de bicihbûna vacê re wê serdema xwûdanên li ser rûyê ardê jî bi buhurê. Her wusa, êdî di vê çerçoveyê de wê pêvajoyaka nû bi xwe re werêne.

Aqil, di vê çerçoveyê de şoreşeka têgînî bi xwe re kir. Afrînerîya xwûdê ya serdemên berî vacê, ket destê aqil û felsefeyê de. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê êdî di nava rengên têgînên hizrî de wê nîqaşên li dijî hevdû werin û pêş bikevin. Her wusa, herêkirin û redkirina hebûna xweûdê, wê weke ancamaka vê serdemê bê. Bi vacî, felsefeya ku dihizirê, ji ber ku nikarê hebûna wî şîrove bike û salix bike, hebûna xwûdê red red dike. Ev jî, weke aliyekî felsefîkî ê madeyî ya. Aliyê din jî, ê îdealîsmî, wê herê dike. Lê di vê çerçoveyê de herdû alî jî, bi hevdû dikevina nava nîqaşên ku xwe bi vac û aqilane werênina ser ziman de.

Rasyonalîsm wê weke bayekê ku were û hertiştî bide berxwe bê. Di vê çerçoveyê de, nîqaşên ku dihên kirin ên felsefîkî, wê li ser hewldana şîrovekirin û hanîna ser ziman a rastîya darêjkê û bi wê re jîyanê. Lê dema ku li ser darêjkê hizirkirin dihê kirin jî, di wê çerçoveyê de hertişta li jîyanê û li berçav, ji wê re darêjk dihê kifşkirin. Lê tenê ji gotina ´xwûdê´ re ev nayê kifşkirin. Di vê çerçoveyê de, hewldanên şîrovekirin û gihandina şîroveyekê wê sedsalan li dûv hevdû bibe. Felsefe, bi vacê re, êdî gelek têgînên felsefîkî ên weke rasyonalîsmê û hwd bidest afirandina wan dike. Her wusa, felsefeya dîyardayîyê, felsefeya îdealîsmê, felsefeya metalyalismê û hwd werina ser ziman. Metalyalism, ew têgîna fizikalîsmê ku ji xwe re dike bingeh, wê li ser wê re xwe werêne ser ziman. Her wusa, îdealîsm jî, li ser têgîna hizirkirinê û hwd re xwe werêne ser ziman.

Felsefe û dîroka hizir, wê her wusa aqilekî mazin bi demê re werêne li holê û bi afirêne. Ev aqil, wê hin bi hin jî pêş bikeve. Rengê hizirkirinê, wê hin bi hin serdest bibe. Her wusa, pêşketina wêjevanîyê, helbestgerîyê, musikê û hwd, wê bi demê re bibin. Ev jî, wê di vê çerçoveyê de weke têgînna demî ên ku diafirin bin. Hizra felsefeyê, heta ku dihê van serdeman, wê gelek pêvajoyan bi buhurê. Lê dema ku dihê

vê pêvajoyê jî, wê êdî zanistîtîyê pêş bixe. Zanist, wê fêr, ceribandin û her wusa rêbaza vacê bi hevdû re bi hûnê û wê bike temenê pêşketina xwe de. Têgînên weke ên empirismê, wê weke têgînên felsefîkî ku zêhnê dihênina ser ziman, wê têgînên vê serdema zanistê a dema felsefeyê bin. Di vê serdemê de wê zanîn di rêbazên dahûrî, ceribandin, û fêr û vacê bi hevdû re bihûnê. Li vir, nerîna felsefîkî, wê êdî bi zanistî werê ser ziman. Zanist, dema ku mirov bahse wê dike, wê êdî werze, geometrî, fizik, biolojî û hwd wê werina bîra mirov, ev jî, wê weke pêşketinên vê serdema zanistê bin. Serdema felsefeyê ya zanistê, her wusa, dîyardetiyê weke rêbaza hîmî di temenê xwe de dihawêne. Li ser wê re jî, bi fêrî ceribandinê û fêrbûnê pêş dixe. Bi zanistî gihiştina zaninê, wê bi dahûrkirina dîyardeyî û her wusa bi fêr û ceribandinê bê. Pêşketina lebratûwaran û hwd, wê di vê çerçoveyê de bi wê têgîna dîyardeyî û ceribandinê re pêş bikevin. Têgîna felsefeyê, wê di van deman de êdî bi zanistî pêş bikeve. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi pêşketina pêvajoyên zanistitiyê re, wê êdî ne tenê vac weke rêbaza xwe gihandina aqil û ya rastiyê wê were bikarhanîn. Bi wê re jî, dîyardetî, ceribandin û her wusa, ezmûnên mirov, wê di rex vacê de cih û war bigrin.

Dema ku em bahse dîroka felsefeyê bikin, divê ku em serdemên zanistîtîyê bi wê re û di dewama wê de weke serdemna pêşketî werênina ser ziman. Ev serdemên zanistê, wê bi gelek pêşketinan hebûna xwe bide domandin. Her wusa, gelek hizir û rengên hizir wê hin bi hin derkevina li holê. Têgînên weke têgîna estetîsmê, hebûnîtîyê(eksistanisyalismê), sûbjektivîsm û hwd wê pêş bikevin. Piştî serdema ronasansê, wê serdemeka nû bi hizrî di van waran de were destpêkirin. Hizrên ku ji vê demê û pê ve ku derdikevina li holê, wê weke têgînên ´felsefeya hemdem´ werina bi navkirin û ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê hizirkirin, derkeve li holê. Her wusa, bi hizirkirinê re afirandin pêş dikeve. Nivîsandina, romanan, helbest û her wusa nivîsandinên û hwd, wê di vê çerçoveyê de pêşketinên giring bin.

Felsefeya hemdem, weke gotinekê dema ku mirov wê hilde li dest, divê ku mirov wê di çerçoveya têgînên hizrî û şûbjetîya wan de werênina ser ziman. Şûbjektivîsm, wê di vê çerçoveyê de pêşketinaka mazin bi xwe re werêne li holê. Her wusa, şûbjektivîsm, têgînên hizrî ên ku dihên ser ziman, bi hîm û temenekî dîrokî wan dihêne ser ziman. Dîroka hizir, bi giştî weke ki ji nû ve dahûrkirina wê bi şûbjeyeka demî dihê kirin. Hizir û felsefeyên serdema kevnera wê ji nû ve werina şîrovekirin. Her

wusa, bi çavekî din wê li wan werê nerîn. Bi wê re jî, wê ancamna hizrî ên demî di vê çerçoveyê de werênina ji wan derxistin. Her wusa, Platon, di serdema kevnera de jîyan bûya. Lê di dema ronasansê de di bin navê" platonvanên nû" pêşketina bi hizrên wê hizrekê di vê warê de bide me. Herîkînên ku pêş dikevin ên weke «platonvanên nû» û hwd, wê weke hewldanaka şîroveya li gorî demê bê. Felsefe, bi wê re li gorî ast û radaya demê, ji nû ve tê kifşkirin. Di vê çerçoveyê de ku mirov pêvajoya ronasansê werêne ser ziman, mirov dikarê weke pêvajoyeka şîrovekirinê û ankû ´jinûve şîrovekirinê´ jî werêne ser ziman. Teybetîyên şîrovekirina vê demê, ên sereke ew in ku bi aqil û di hundurê aqil de û di çerçoveyê wê de ku dihê kirin a. Gotina felsefeya hemdem jî, di vê çerçoveyê de bi serwerîya aqil û pêşketina wê ya li demê re dihê ser ziman. Ev jî, bi şêwayên weke zanistê û hwd a. Wê felsefeya dîyardetiyê, hin bi hin bi fêr û cerb û azmûnên ku pêşketina temenê wê werê avêtin û wê pêş bikeve. Her wusa, dema ku mirov bahse ´şîrove kirinê´ bike, divê ku mirov wê weke serekeyekê û ankû bi serê xwe weke mijarekê werêne ser ziman. Nivîsandina romanan û hwd, wê rengê şîrovekirina ji jîyanê û hwd werêne ser ziman. Ronasans, wê weke destpêka vê jî bê. Di vê çerçoveyê de ji nûve şîrovekirina aqil û felsefeyên demên berê, wê hem wan carek din di demê de zindî bike û hem jî wê pêşxistinaka bi aqil ku weke temenê li gorî demê bê, wê pêş bixe. Şîrovekirin, biaqil asta afirandinê dihêne ser ziman. Em dikarin ji vê hizrên gav biavêjin û gelek pêşketinên din ên bi vî rengî ku derdikevin kifş bikin û werênina ser ziman.

Dema ku em bahse ´ronasans´ê bikin, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov bahse wê bike. Ji xwe gotina ´ronasansê´ bi wateya xwe re tê manaya ´jinûvebûnê´. Yanî, weke carek din werê dûnyê dihêne ser ziman. Em vê gotina carek din hatina dunyê û ankû ´jinûvebûnê´, di karin di rengê ji nûve kifşkirinê de jî bixwênin. Ji xwe, hizrên ku berê hatina ser ziman, di vê çerçoveyê de weke ku ji nû ve dihêna kifşkirin.

Hizrên ku dihên ser ziman, wê di çerçoveya têgîna felsefeya hemdem de wê werina ser ziman. Di vê çerçoveyê de ev ji nûvebûn û ankû ji nû ve kifş kirin, wê temenekî biafirêne.

Li vir, dema ku em felsefe û hizrên serdema nû ya ronasansê fahm dikin, divê ku em ´vacê´ ji bir nekin û ji nûve car bi car wê şîrove bikin û werênina ser ziman. Ev yek, pêwîstî pê heya. Vac, bi têgîna xwe ya ku bi adilandînî ku pêşxistiya û bi hebûna felsefeyê re di nava wê de daye rûniştandin, wê temenê pêşketina vê çerçoveyê jî biafirêne. Ji xwe, ´felsefeya dîyardetîyê´ ku e bahse wê bikin, divê ku em weke ancamaka

pêşketina têgîna vacîtîyê jî werênina ser ziman. Her wusa, têgînên ´**practise**´î ku wê ji kirinîya jîyanê bi ancamgirtina bi têgînî ku wrrina ser ziman, wê di vê çerçoveyê de bi heman rengî çerçoveyekê bi afirênin. Mirov di jîyanê de çawa dijî? Her wusa, wê li bersivên wê werê lêgerîn. Lê dema ku em bahe felsefeyê bikin, divê ku em vê yekê werênina ser ziman, ku bi hewldana fahmkirina ´çawa´ dihê jîyîn re, hewlde ku ya jîyane baştir ku ji wê ya ku heya çêtir ku çawa werê jîyîn jî, li wê digerihê. Yanî, bi gotinaka din felsefe, hewldana xwe gihandina ya baştirê ji ya ku heya ya.

Di vê çerçoveyê de wê felsefe, di vê çerçoveyê de wê têgînekê bi felsefeya serdema kevnera re bide mirov. Lê bi awayekî şenber, wê vê rastiyê di serdemên nû ên felsefeyê ku weke serdema ronasansê û hwd bi nav dikin de, wê ev yek werê dîtin. Her wusa, bi hizir, hertimî lêgerîna li ya baştir, wê derkeve li pêş. Hewldana kifşkirinê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Serdemên aqil, her wusa, di vê çerçoveyê de hizirna baş diafirênin. Hizrên bi têgînî ku hatina ser ziman, temen di afirênin.Felsefe, wê di nava ´ hewldana xwe gihandina ya baştir ji ya ku heya´ de bê. Ev weke têgînekê mirov wê her wusa bi pêşketinên wê re kifş dikin. Serdemên aqil, her wusa, weke serdemna temenê vê yekê bi demê re diafirênin. Aqil, her wusa, di vê çerçoveyê de pêşketinaka mazin diafirêne. Li vir, dema ku em bahse ´ hewldana xwe gihandina ya baştirê ji ya ku heya´ bikin, divê ku mirov her wusa, bi teybetî, bahse rasyonalîtiya vacê bikin. Ev, wê weke têgînekê di temenê vê rastiyê de xwe bide dîyar kirin.

Ya rastî, wê li gorî çi rast bê? Ankû ya baş li gorî çi ya baş a? Yan jî, ya baştir, li gorî çi û çawa ya? Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike. Felsefeya hemdem di vê çerçoveyê de xwediyê têgîneka felsefîkî ya. Gotinaka felsefeyê jî, wê di vê serdemê de di vê çerçoveyê de bê têgîneka serdestî. ..

Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de li ser van pêşketinan re divê ku mirov bahse têgînên demî ên ku pêş dikevin bike. Hebînîtî, rasyonalism û empirisim ku weke çend ji wan hizrên demî û hîmî ku mirov dikarê werêne ser ziman. Lê têgîna rasyonalismê, divê ku mirov bi teybetî hilde li dest û werêne ser ziman. Di temenê her hizra ku dihê ser ziman de wê li rasyonaliteyekê were lêgerîn. Rasyonalism, di vê çerçoveyê de weke têgîneka ku kifşkar k u êdî di wê de vac rûnîstîya dide kifşkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku dema ku mirov bahse rasyonalîsmê dike, çi qast dike? Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê,

bi teybetî werêne ser ziman. Li vir, rasyonalîsm, wê di vê serdemê de serkevtineka hizrî ya dîrokî bidest bixe.

Herîkîna jîyanê, wê di çerçoveya wê de hewldana fahmkirina wê pêş bikeve. Her wusa li ser wê re jî, rasyonalîteya ku dihê ser ziman, ew rastîya wê ya li berçav ku were dîtin a. Lê li vir, bi hevdû re li ahengebûna lêgerîn, bi hevdû re ne hiştina ketina nava nakokîyê de di dema hanîna li ser ziman de wê rengê vê têgîna rasyonalîteyê bide nîşandin. Bi hevdû re nakokîtî, wê weke du hizir û ankû tiştên ku vajî rastiya hevdû bin. Bi gotinaka din, dijberî hevdû bûn a.

Lê di felsefeyên hemdem de, her wusa, rengna din ê weke vê pêş dikevin. Her wusa ´tez´, li ber wê ´dij-tez´ û her wusa ´sentez´îtî dihê ser ziman. Tez, her wusa, têgîneka ku hatî ser ziman û lê ku hê ne hatîya piştrastkirin û ankû bi ceribendin, fêrbûn û hwd, ku hewl dihê dayîn ku were piştrastkirin a. Bi wê re jî, ku ne di nava nakokîyê de bê. `Tij-tez jî, li hemberê wê, ku bo ku wê teza k u hatî ser ziman ku vajî wê piştrast bike û ankû li şûna wê weke ya rast were li holê ya. Her wusa sentez jî, ku ji tiştên ji hevdû çûda ku bi hevdû re werina kirin yek a. Minaq, gelek tiştên ku bi hevdû re û di nava hevdû de ku teybetîyên xwe li gorî hevdû bikin yek a jî. Li vir, vace sentezê, her wusa, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Li jor, me got ku her aqil gelek hûrgilan di hundurê xwe di hawêne. Her wusa, aqil ji gelek hevgirtinan dihê li holê. Li gorî, vê têgînê her aqilê ku ji gelek hûrgûlên aqilî afirîya, mirov dikarê weke têgîneka sentezî jî werêne ser ziman. Têgîna felsefîkî a dahûrkirinê, li wê dihizirê ku aqil, ji kîjan hûrgûlan pêktê ku fahm bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de, ew hevgirtina hizrî, hevgirtin(sentezkirin)eka ku mirov wê werêne ser ziman.

Hevgirtina hizrî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, rewşeka ku mirov lê dinerê, di hundurê wê rewşê gelek rewşên ku bi hevdû re mirov kifş dike. Lê di çerçoveya wê rewşê de, weke têgînekê û ankû rewşekê xwe didina dîyarkirin. Ev jî, çend ku weke´rewşekê´ jî xwe bide dîyarkirin jî, divê ku miirov weke hevgirtinekê werêne ser ziman. Divê ku mirov ramanekê weke têgînekê werêne ser ziman. Lê her raman, di hundurê xwe de, gelek hûrgilên ku di dema dahûrkirina wê de ku mirov wê kifş bike mirov wê rastî wê were. Ev jî, dide nîşandin ku ramanak hevgirtin(sentezek) a. Her wusa, her raman, dema ku mirov wê dahûr bike, mirov wê gelek aqilana bi hûrgilî ji wê derxe holê. Em li vir, dema ku minaq, gotina ´ramanê´ hildina li dest, emê wê yekê kifş bikin. Gotina ´ramanê´, bahse zanînekê dike. Ev

zanîn, dema ku mirov mînaq wê şenber bike û bahse ´nan´ bike, wê çaxê, mirov wê bibînê ku ew pêvajoyên ku ew di wê re diçê û çê dibe û hwd, wê bi serê xwe weke hûrgilna demî ên hizrî jî werina li holê. Gotina ´nan´, piştî ku çêbûya û pê de, dibê tavahîya wan pêvajo û hizran hemûyan. Li vir, dema ku di vê çerçoveyê de gotina ´nan´ weke ramanekê ku mirov wê dahûr kir, mirov, bi wan pêvajoyên wê re van navaroka wê jî kifş bikin. Her wusa, li vir, gotina nan, weke zanînê û ankû ramanakê, têgînekê hem zanînaka û hem jî hevgirtineka.Em dema ku bahse nan dikin, em bahse wan pêvajoyên wê yên ku ew bi wê re çêbûya jî dikin. Yanî, gotina ´nan´ bi serê xwe pirr razber a. Lê bi wan hûrgilîyên navarokî ên xwe re hebûna xwe diafirêne û dihêne ser ziman. Ew hûrgilî û navarokîya wê jî, dema ku em bi pêvajoyên wê ên bûnê re werêne ser ziman, wê bi hevgirtinekê re werê ser ziman. Yanî, wê bide nîşandin ku gotina ´nan´, gotinaka hevgirtinî ya.

Li vir, dema ku me bahse gotinê kir, em ji wê dewam bikin, her wusa, li vir, dema ku gotinê di hildina li dest, ew gotin, her wusa, di çerçoveya kirinîya jîyanî de xwediyê wateyekê ya. Lê gotin bi serê xwe pirr razber a. Her wusa, dema ku tenê weke nav werê ser ziman jî, ew razberîya wê heya. Li vir, dema ku mirov bi hizrî û felsefîkî li ser wê dihizirê, mirov gotinê, bi pêvajoyên wê ên bûnê ên li jîyanê re wê dihêne ser ziman. Weke ku me minaq bi gotina ´nan´ re hanî ser ziman. Her wusa, bi rewşên jîyanê re wê pêvajoyên navarokê ên gotinê dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa, mirov gotinê weke hevgirtinekê dibînê. Gotin, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di navaroka wê de çendî ku mirov hûr û kûr diçê, şenberîyê ji mirov dixwezê bo fahmkirina wê. Ev jî, wê gotinê, weke cihanekê derxe li ber me.

Her wusa, dema ku mirov li vir, bahse hizir dike, her wusa li vir, hizir û gotin, têkiliya wan ya bi hevdû re, di vê çerçoveyê de derdikeve li holê. Her wusa, gotin, bi hizir, hatîya hûnandin. Bi wê re êdî ew bûya aqilek. Ew jî, êdî tê zanîn. Piştî ku ew bûya darêjkîya wê afirîya û hatîya afirandin û pê de, êdî ew bûya xwediyê têgîneka têrkerî. Her wusa, ew gotina ku li berçavê me û di mejiyê de xwediyê têgîneka têrkerî ya, dema ku mirov hewl dide ku wê fahm bike, her wusa, bi pêvajoyên wê jîyanî re mirov wê bi hevgirtineka jîyanî re wê kifş dike.

Gotin, di nava xwe de pêvajoyên jîyanî dihêne ser ziman. Her wusa, weke ku me bi gotina ´nan´ re hanî ser ziman, her wusa bi gotina ramanê û ankû aqil re jî mirov dikarê werêne ser ziman. Dema ku em bahse

gotina aqil dikin, em dîroka wê ya ji destpêka aqil, dihildina li dest û dihênina ser ziman. Her wusa, êdî bi wê re di dîrokê de pêvajo bi pêvajo aqil çawa pêşketîya û çi dem buhurîya mirov wê kifş dike. Gotina, aqil, dema ku em pêvajoyên wê newina zanîn û fahmkirin, gotinaka pirr razber û ku nayê fahmkirin a.

Gotina, aqil, weke ku me li ser gotina ´nan´ re hanî ser ziman, her wusa mirov bi wê re dihêne ser ziman. Ev gotin, di vê çerçoveyê de rastiyekên pêvajoyî ên jîyanî ku hatîina jînkirin êdî bi wê re dihêne ser ziman. Dema ku em bahse gotina aqil dikin, her wusa, serdemên aqil, çawa hatina ser ziman, di kîjan demê de çi aqil û raman hatina ser ziman, di kîjan demê de pêvajoyên çawa buhurandina û hwd, ev hemû mirov wan fahm dike. Ev jî, çendî ku hatina fahmkirin, wê bi navakirina gotina aqil re wê dîroka wê werê ser ziman. Wê bi wê re pêşketinên jîyanî ên ku bûna wê werina ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de gotin bi hanîna ser ziman a jîyanî re mirov wê şenber dike û dihêne ser ziman. Her wusa bi wê re, gotin, xwe salix dike. Ev jî, wê têkilîya gotin û jîyanê bi hevdû re bi aqil ku hatî danîn wê werêne ser ziman. Em li vir, dema ku bahse gotinê dikin, em bahse çi dikin? Her wusa, gotin çi ji me re dibêje? Dema ku mirov li vir, bahse gotinê dike, Her wusa, ew pêvajoyên ku buhurîna wê gotinê re ku di mejiyê me de şenber bûna wê werina ser ziman. Her wusa, li vir, ev gotin, di vê çerçoveyê de têkiliya wê ya jîyanî ya. Gotin, dema ku bi wê re jîyan dihê ser ziman, di vê çerçoveyê de bi wê re dihê ser ziman. Gotin, di aslê xwe de, hişekî rewşê ê li jîyanê ya. Divê ku mirov gotinê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov gotinê weke hişekî şenber ê ji jîyanê werêne ser ziman. Bi gotinê re şenberîya ku di mejî de diafirê, wê di mejî de weke hişekî bê. Ev hiş, bi gotinê re hatîya salixkirin. Bi wê salixkirinê re jî di jîyanê de rewş hatîya bi têgihiştin kirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov dinerê, wusa dihê berbîra me û berçavê me ku zanîna me tenê jii gotinên zimanên me ya. Ya ku mirov li vir, wê têdigihê ev a. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ew rewşa jîyanê û ankû ew jîyane ku mirov wê dijî, ew bêî ku ew gotin hebe jî heya. Divê ku mirov wê werêne ser ziman. Ya ku bi wê re di aslê xwe de dihê ser ziman jî li vir ev a. Yanî, ew jîyana ku heya ew bi wê re dihê ser ziman. Li vir, dem ku em bahse gotnê û jîyanê bikin, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku gotin çendî jîyane dihêne ser ziman. Yan jî gotin, çendî şenbera di jîyanê de. Ya ku vê yekê dike mejiyê mirov a. Lê dervî wê, ew gotin, bi tene serê xwe bi wê darêjka xwe re heya. Gotin, çendî ku di jîyanê de were

şenberkiirin jî, dema ku mirov ji aliyê jîyanê ve lê nerî, wê razberîyekê bi xwe re weke ku bide dîyarkirin.

Li vir, dema ku em bahse gotinê di jîyanê de dikin, her wusa mirov bahse gotinê bi darêjka wê ya ku di mejiyê me de bi darêjkê ku hatîya bi hişkirin dikin. Lê gotin di aslê xwe de, weke ku di jîyanê de razber a, her wusa divê ku mirov bibêje ku ya ku wê şenber dike jî mejî ya.

Li vir, dema ku em li vir, bahse ziman bikin, em li vir, divê ku pêşî weyn û rola aqil û mejî divê ku mirov pêşî li berçav bigrê. Mejî, her wusa ew têgînên ku bi aqilî girtina, ew hişkirinên wan aqilan, wê ”weke rastîya jîyanê” bide dîyarkirin. Di wê çerçoveyê de mirov li jîyanê dinerê. Ya rastî, ji mirov wê ya tenê ew a. Heta ku mejî, carna wê hîsê mirov re dide çêkirin ku tenê ew rastî heya. Di vê çerçoveyê de aqil û mejî, weke mijaraka ku li vir mirov dikarê bi teybetî hilde li dest a. Ji ber ku ev wê her wusa bi weynî wê xwediyê rolaka mazin bin dijîyanê de.

Aqil, li vir, divê ku mirov carek din li wê vegerihê û wê werêne ser ziman. Ji ber ku aqil giringîya wê di hanîna ser ziman ya bi ziman re dihê dîtin. Her wusa, li vir, di serî de divê ku mirov wê pirsê bike ku aqil çi ya? Aqil, ew darêjka gotinî bi pêvajoyên wê re ku dihê dîtin a. Yanî, li vir, ew hevgirtina ku bi gotinê re ku mirov wê dibînê, her wusa, wê çerçoveya têgîna navaroka gotinê bi afirêne. Ev jî, wê hişekî bi mirov re bide çêkirin. Li vir, ew mejiyê me yê ku hiş dike, yanî ku di keve farqê de, di aslê xwe de ya ku aqil a ew a. Mejî, di wê de ew hişê ku dibe, wê di çerçoveyê de weke gîyanekê ji wê xwe bide li der. Ev jî, wê bi gotinê bibe. Her wusa, di çerçoveya hanîna afirandin û hanîn ser ziman de mejî xwe baş amede dike û diadilêne. Her wusa bo hanîna ser ziman, rastbûn û adilîna qiriqê, û her wusa di mejî de beşên girtina zanînê ên weke xêvê û hwd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi hevdû re di ahengekê de hilde li dest û werêne ser ziman.

Me li jor hinekî jî bê, bahse çerçoveya gotinê bi aqil re kir. Li vir, divê ku mirov di berdewama wê de werêne ser ziman ku ew çerçoveya wê ya ku weke ´pêşnûma´ ku mirov divê ku hilde li dest, wê çerçoveya gotina aqil jî bi wê hevgirtînîya gotinê re biafirêne. Li vir, têkiliya di nava gotin û aqil de, her wusa weke ku ji navikê ve bi hevdû ve girêdayî dihê dîtin. Lê dema ku mirov bahse aqil bike, divê ku mirov wê weke têgînekê û ankû tiştekî bi rêya ziman ku dihê ser ziman, divê ku werêne ser ziman. Her wusa, aqil, li vir, dîtina mirov ya ji jîyanê ya. Gotin, weke hevgirtinaka ku temenê wê li ser wê rastîyê ya. Mirov, wusa hasab bike ku mirov nabînê û deng nakê. Yekî ku nabînê û deng nakê, wê nikaribê

gotinên di mejîyê xwe de şenber bike û wan bihiş bike û werêne ser ziman. Ew gotin, wê ew jî, nebin. Li vir, mirov vê yekê, ji vê rastiyê fahm dike ku aqil û gotin bi hevdû ve girêdayî na.

Aqil û gotin, di vê çerçoveyê de bi hevdû re pêş dikevin. Emê vê yekê bi demê re bi awayekî vekirî bibînin. Piştî ku serdemên felsefeyê pêşketin, wê hin bi hin hizir werê ser ziman û zêde bibe. Bi wê re jî, wê di jîyanê de xwe werêne ser ziman. Hizir, bi wê re çendî ku hat ser ziman, wê di jîyanê de adilandinê bike. Têgîna li gotinan hatî kirin, wê piştre weke kirasekî xwe li jîyanê jî bike. Gotin, çawa di jîyanê de diafirênin, di vê çerçoveyê de êdî mirov wê kifş dike. Her wusa têgîna felsefeyê, wê di vê çerçoveyê de bi demê re wê xwe biadilêne. Bi wê adilanîna wê re wê bi demê re di jîyanê de jî ew adilandin bibe. Em serdemên pêşketina felsefeyê û serdemên berî wê werêne berçavên xwe. Li gorî rengên pêşketina wê, têgîn û hizir, di mejî de cih digirin û jîyanê didina kifşkirin. Piştre di serdemên felsefeyê de piştî vac û rasyonalîsm di nava felsefeyê û hizir de di rûnihê û şîrove bi wê re pêş dikevin, di wê çerçoveyê de wê adilandin di jîyanê de bibin. Şenberîya bi gotina vacê re ku di jîyanê de dibê wê bi wê esas girtina tiştên jîyanî ên li berçav re na. Ev jî, wê rastîyeka vacî ya têgînî werêne ser ziman. Tegîna vacê, felsefe li ser lingên wê rûnand. Piştre jî, weke mirovekî ku êdî li ser lingên ku bidest meşînê bike lê kir. Felsefeya bi vacê, bû mirovê ku bi ling û li ser ling ku dimeşê ya. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werêne ser ziman. Vac, wê kifşkirina wê bidarêjkî di nava felsefeyê û hizirkirinê de êdî di her demê de hebe. Tenê, wê rê û rêbazên wê yên ku tên esas girtin û hwd wê biguharîn bi demê re û hwd.

Em dema ku li ser feslefeyê re pêvajoyê pêşketina aqil dihênin ser ziman, em rastîya têgîna vacê jî baştir fahm bikin. Felsefe, bi xwe jî, wê întîbayê dide ku mirov ku aqilê bi vacê a. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov divê ku werêne ser ziman ku felsefe, serdemên ku di buhurêne, wê bi vacê re bi buhurêne. Di serdemên weke serdema ronasansê û hwd de, wê aqil derkeve li pêş.. Li vir dema ku em dibêjin ku wê aqil derkeve li pêş, em bi wê têgînê dihênin ser ziman ku aqilê bi vacê pêşketîya û serdest dibê.

Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li hizirkirinê binerê. Hizirkirin, wê her wusa, têgîna vacê di navaroka xwe de bicih bike û bi wê re werê ser ziman. Hizirkirin, dema ku dihêkirin, wê çawa werê ser ziman, li ser wê dihê hizirîn. Bi wê re jî, dema ku dihê hanîn ser ziman, li aheng, li hevdû kirin û her wusa ku nakokî di nav gotinên ku werênina

ser ziman de nebin li wê dihê lêgerîn. Di despêka hizirkirinê û heta dawiya hizirkirinê de wê li vê werê lêgerîn. Gotinên ku hatina ser ziman jî, levkirina di nava wan de wê weke aliyekî giring ê wê têgîna vacî ya hizirkirinê bê.

Em li vir divê ku vê yekê jî bibêjin ku dema ku hizirkirin dihê kirin, wê li ser çi were hizirkirin û wê çawa were ser ziman, li vir, bi vacî pêşî li tişta ku lê hatîya hizirkirin û piştre ew tişt xwediyê çi ya û çawa û teybetmendiyên wê çi û çawana, wê li wan bê nerîn û ew hizirkirina di derbarê wê de werê hanîn li ser ziman. Di destpêkê de, dema ku mirov li vê rewşa hanîna tiştê a li ser ziman dinerê, weke ku rewşa tiştê bi wûcan û awayê wê re û her wusa bi teybetmendiyên wê re wê weke teybetmendiyên hizirkirinê ên vacî bin.

Di nava jîyanê de di hanîna ser ziman a di temen û çerçoveya levkirinîyekê de wê vac xwe bide dîyarkirin. Ev jî, wê di hizirkirinê de giring bê ku mirov wê fahm bike. Li vir, tişt, û ankû made, bi teybetmmendî û xosletên xwe re xwediyê vacîyeka levkirinî ya bi xwe re ya. Di dema ku dihê hanîn ser ziman de, ew teybetmendî û xoslet wê, rengê vacîya hizirkirinê û hanîna wê ya li ser ziman jî, bidina dîyarkirin. Li vir, dema ku em li têgîna vacê dihizirîn, em divê ku bibêjin temenekî mirov ê ku mirov di çerçoveya têgîna vacê de li berçav bigrê heya. Ew jî, tişt û ankû made ya.

Lê dema ku mijar bibe mijar hizirkirinê û hizra ku werê hanîn li ser ziman bê, hingî divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku vac, wê xwediyê hinek xosletên rasyonalî bê ku mirov wan li berçav bigrê. Her wusa, raayonalîya pêşî, ew a ku bi vacî, tişta ku dihê şîrovekirin weke tişt û ankû madê, ku bi darêjk û hwd ku li jîyanê hebe. Di felsefeya serdema kevnera de wê ev xoslet, derkeve li pêş. Ya ku wê felsefeya serdema kevnera bênê ardê û li ardê dêne ser lingê wê û bi wê bide pêşxistin jî wê ev xoslet bê. Di vê çerçoveyêê de hewldana fahmkirina xwezayê ya felsefeya serdema kevnera di vê çerçoveyê de wê hin bi hin vacîtîya wê pêş bixe. Lê di serdemên piştre ên weke serdema jinûvebûnê û hwd de, wê hizirkirin derkeve li pêş. Her wusa, mijara hizirkirinê, wê derkeve li pêş. Gotinên ku bi aqil û şîrovekirinê di nava aqil de ku hatina şenberkirin, wê derkevina li pêş. Ev jî, wê têgîna aqil, weke fektoreke bi serê xwe êdî hin bi hin derxe li pêş. Fahmkirina aqil, di vê çerçoveyê de wê êdî weke mijaraka serdema aqil ya giring bê. Rê û rêbazên ku bi wan aqil dihê bidest xistin û reng û rewşa afirîna aqil û hwd, wê bi lêgerîna li wan re derkevina li pêş. Têgînên weke empirismê ku xêvê, hêstê, azmûnê

ku derdixe li pêş, wê êdî pêş bikevin. Empirism, wê nîşanaka wê bê ku weke têgîneka ku aqil, çawa heya û diafirêne. Her wusa, ew têgînên qebe ên madeyî ku di buhurin. Nikarin bersivê bidina pêşketinên jîyanê. Hizra ku diafirên, êdî weke têrkerîyekê xwediyê wê hêz û qûdretê ya. Her wusa, ev jî, wê aqil, bike weke hêzekê li jîyanê. Her tişta afrîner li jîyanê weke hêzekê pêş dikeve. Aqil jî, piştî ku afirand û pê de, li jîyanê serwerîya xwe denezend. Her wusa, têgînên rasyonalî, empirisim, vac, hebûnîtî(eksistanisyalism)yê, û hwd, wê têgîna ku vê rastîyê bi felsefeyê û piştre di dewama wê de ku bi zanistê re piştrast bikin bin. Her wusa, ev rengê felsefeyê ê serdemên nû ên felsefeyê na. Serdemên nû ên felsefeyê, wê weke serdemna ku di wan de aqil êdî serdest bûbe bê. Wê bi aqil, pêş bikevin. Her wusa, piştî serdema jinûvebûnê û hwd, wê êdî aqil bi hizirkirinê re k u zanînê diafirênê wê li jîyanê serdest bê.

Em dema ku bahse têgîna vacê bikin di serdemên nû ên felsefe û zanistê, emê rengê pêşketina aqilê wê li berçav bigrin û bibêjin. Her wusa, li vir, di vê serdemê de wê vac, ne êdî tenê ji rengê hizirkirina ji jîyanê wê were girtin bê. Ji wê zêdetirî û wirdetirî, wê bi hizirkirinê afirandina ku bibe, di wê de ku vac dihê bikarhhanîn wê bibe. Her wusa, afirandina bi hizirkirinê, wê weke têgîna şûbjeyî ya li jîyanê ya ku diafirênê bê.

Her wusa, nivîsandina roman û şanoyan, di vê çerçoveyê de mirov dikarê bi giringî werêne ser ziman. Roman, wê weke tefsîrna ji jîyanê bin. Lê ew tefsîr ku bûn û pê de, wê weke hizirna bi çerçoveyî ên ku li jîyanê dibine nerîn jî bin. Divê ku mirov vê yekê jî, di vê çerçoveyê de bi hizirkirinê re werêne ser ziman. Hizirkirin, afirandinê bi şûbjeya xwe re dike dest de. Ya ku wê têgîna îdealismê her wusa bi wê re serdest bike jî wê ev bê.

Hizirkirin, wê weke aliyekî giring ê afirandina bi aqil bê. Têgîna dahûrîyê ya felsefîkî şîroveyên ku pêş dixe, wê bi wan re rastkirina di jîyanê de jî bibe. Ku em bahse aqil û kifşkirina wê ya di jîyanê de bikin jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, di nava jîyane civatê de çendî ku hatina ser ziman bû, wê ew çendî bi wê re afirandina di jîyane wê de jî werê pêşxistin. Di serdemên nû ên hemdem de felsefe bi dahûrîyên ku xwe yên ´analîtîkî´ û hwd, wê her wusa, di vê çerçoveyê de kifşkar bê. Ramyarîyê jî, bi gelek rengên din ên weke wê re divê ku mirov di nava wê de bihasibêne û werêne ser ziman.

Li vir, dema ku em bahse vê rengê pêşketina aqil ê bi demê û civatîtîya demê re bikiin, divê ku mirov li ser ziman re lê binerê. Her

wusa, ziman, wê çerçoveyek civatî û pêşketina wê jî dîyar bike. Ev çerçova, wê bi dîrok û çand û kevneşopîyên wê yên dîrokî û hwd re xwe bêne ser ziman. Li vir, ya ku wê di pêşketina demê de xwediyê wate jî bê, wê ev bê.

Ziman, her wusa, ew çerçoveya wê ya ku heyî, bi pêşketina aqil re heya. Bi pêşketina aqil re jî, bi çerçova bûn û bi pergal bûn jî di wê de pêş dikeve. Bo vê yekê jî, ziman li vir, jiv ê aliyê ve jî, giring dibê ku mirov wê werêne ser ziman. Di vê serdema şariştanî de ziman, weke têgîneka bi pergal ya çerçoveyî ya ku civatîtîyê jî dide afirandin û pêşxistin dibe. Her wusa, pergale civatî, ew pergale zimanî ya. Mirov dikarê bi hevdû re werêne ser ziman. Ziman, çerçoveya wê ya ku heya, ew çerçova, wê pêşketinê jî bide dîyarkirin. Ziman, hebûna pergalî ya civatî bi xwe re salix dike. Bi wê re jî, ziman, têgînaka mirovî ya kifşkar a.

Dema ku em li dîroka ziman, dinerin, em dibînin ku dîroka wê diçê ta destpêka dîroka mirovatiyê jî. Her wusa, mirov, dema ku bidest axiftinê kir û pê de, di jîyanê xwe de bidest çêkirina pêşketinan jî kir. Ziman, rêya xwe hanîna ser ziman a. Her wusa, ziman, çoka ku di wê de di demê de herîkîn dibê ya. Di vê çerçoveyê de jî, divê ku mirov bahse wê bike û werêne ser ziman.

Dîroka ziman, dikarin bi destpêka têkildanîna bi hevdû re werênina ser ziman. Rewşa têkildanînê, ne tenê bi mirovan re heya. Her wusa, bi hemû zindiyên ku jîyane û dijîn re heya. Yanî, rewşa têkildanînê, ne rewşeka ku tenê mirov dikarê bi mirovan re werêne ser ziman a.

Î ro, dema ku mirov li xwezayê dinerê, mirov bi hezaran cûreyên zindiyan dibînê. Hemû zindî jî, her yekê li gorî rewş, şert û mercên xwe di nava rewşeka têkildanênê de ya. Rewşa têkildanînê, weke rewşeka xwezayê û pêwîstî ya her zindiyê ya. Her wusa mirov dikarê vê rewşê bi ziman re werêne ser ziman. Yanî, rewşa têkildanînê, xwe hanîna ser ziman û axiftinê, di vê çerçoveyê de rewşek xwezayî ya. Nebatek jî, rengê pêşketina wê, weke rewşeka têkildanînê ya.

Em divê ku têkildanînê, weke rewşeka xwezayî werênina ser ziman. Her wusa, di nava zindiyan de, weke mirovan û sawal, ajal û hemû cûreyên din ên zindiyan, rewşeka wan ya têkildanînê a teybet heya. Di temenê xwe hanîna ser ziman de ew têkildanîna wan, bi wan re pêş dikeve. Weke ku çawa em mirov bi hevdû re diaxifin û xwe dihênina ser ziman, her wusa zindiyekî din ê di xwezayê de jî, wê bi şert û mercên xwe re wê têkiliyê çêkê û xwe werêne ser ziman. Her wusa, rewşa di

nava hemû zindiyan de ya ´nêr´ û ´mê´´tiyê û hwd, rewşeka têkildanînê û xwe hanîna ser ziman a hemû zindiyan a.

.

**Ziman û zêhn. ..**

Di serî de divê ku mirov werêne ser ziman ku ziman, weke mijaraka dîrokî û zindiyî, divê ku mirov wê hilde li dest. Bi dîrokê re pêşketina ziman, divê ku mirov bi têgîna pêşxistinê werêne ser ziman. Her wusa, dema ku mirov bi têgîna pêşxistinê re werêne ser ziman jî, divê ku mirov li vir bahse aqil bike. Her wusa pêvajoyên aqil ên ku pêş dikevin, wê bo pêşketina xwe ziman, weke modela pêşketina xwe bi xwe re pêşbixin û bi dîrokê werina ta roja me.

Ku em di vê çerçoveyê de hildina li dest, divê ku mirov ziman, weke modela pêşxistinê jî werinê ser ziman. Her wusa ev ji aliyê aqil ve wusa ya. Lê dema ku em di destpêkê de hewl bidin ku pêvajoyên pêşketina ziman werênina ser ziman, divê ku em herina ta dema ku di wê de zindîyan bi nîşanakan ku bi hevdû re têkilî didanî. Nîşanaka, ya ku wan dide afirandin jî, bandûrên derveyî ên xwezayî na. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna ´hêstê´ê divê ku mirov di kevîya mejiyê xwe de zindî bigrê bo hanîna ser ziman. Li vir, bi bandûrbûn, wê têgînaka bi hêstîyarî bê.

Di nava xwezayê de, dîtina mirov a ji xwezayê, wê di çerçoveyê de mirov bandûra wê lê hebe. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têgîna hêstê, çend ku em ji serdemên berî pêşketina axiftinê werênina ser ziman ku em bi hîskirinê re werêne ser ziman wê rast bê. Hîskirin, di serdemên pêşketina serdemên berî ziman de wê hebê. Her wusa, hîs, weke rêyaka têkildanînê a weke ziman a ji wan serdem û zindiyên wê demê re, ku mirov jî di nava wan zindiyan de ya.

Bertekên ku mirov wan dide nîşandin, ew bertek, weke nîşanakna ku wê heya mirov herê ser wan bin. Ev jî, wê bi xwe re di temenê xwe de hîsekê ajoyî bi hawênin. Ev jî, wê di mejî de xatna bide afirandin. Em dibêjin xatna wê bide afirandin, ev xat, wê giring bin bo pêşketinên piştre jî. Mejî, wan xatan ji bîr nakê. Wan di xwe de qayd dike. Her wusa, êdî ev jî, wê hin bi hin bi temenê de bina temenê pêşketina ziman bixwe jî.

Ev xat, dema ku hatina nîşandin û bi bertekî hatina dayîn nîşandin, wê werina qaydkirin. Li vir, ev jî, wê bi xwe re weke hîsekê wê jîrekê biafirêne. Em dikarin, vê jîrê, weke jîra pêşî a ku wê ziman biafirêne jî werênina ser ziman. Mejiyê mirov, wê wê jîrê bi demê re pêş bixe. Bîrkirin û di temenê wê de xêv heya. Her wusa, zindiyekî ku li dijî ya din

bertekek da nîşandin û piştre ku ji hevdû cuda bûn û her yekê çû deverekê û piştre ku bi demekê re ku carek din rastî hevdû hatin, wê berteka ku berî hingî li ber wê dayî nîşandin wê bibîr bike. Ev jî, çi dide nîşandin? Di roja me de, bi sawalan re jî, ev bertekbûn heya. Minaq, sawalaka ku dema ku di rêyekê de dû deverekê de çû û li rastî sawalaka ji xwe maztir û bi hêstir hat û ku bi çend derbehişkên ku ji wê xwarin û êdî ku bi tirs xwe bi şûn ve dayê de, wê piştre ev di mejîyê wê de bimêne. Tirs, wê pirr zêde di mejî de bandûra wê hebe. Her wusa, wê di temenê wê bîrkirina wê rewşê de ya bi sawalê re de jî bê. Li vir, ji tirsê zêdetirî, ew bandûra ku zêdetirî lê bûya ku ew xata ku dimejiyê wê de xîzkirîya ku bi xortî û stûr daya xîzkirin. Mejiyê, her zindiyê xwediyê, teybetiyên xwe yên cûda na. Mejiyê mirov jî, her wusa, xwediyê teybetiyên xwediyê cûda na. Dema ku mirov destpêkirina pêvajoya hizirkirin û ankû bi xêvê fahm bike, divê ku mirov van teybetîyan jî kifş bike û li berçav bigrê di hewldana fahmkirinê de. Ya ku wê piştre wê bide bibîrkirin jî, wê ev bê. Piştre jî, di care dûyemin de ku ew sawal rastî sawala ji xwe maztir û bi hêztir hat, wê tirs li hemberê wê tevbigerihê. Ev, bandûra li mejî, dide nîşandin. Sawal, wê piştre, di çerçoveya xwe parastinê de bertekê bide nîşandin. Her wusa ev bertekên ku dide nîşandin, wê di temenê wê de salixkirineka bi wê rewşê di mejiyê wê sawalê de di temenê xwe de bi hawêne.

Sawal, wê bertekê dide nîşandin.Herwusa, sawal, derbehişka ku li laşê wê ket û ew bîrîndar kir û pê de, wê piştre wê êşa ji wê bîrîna xwe jî hîs bike. Her wusa, nalînên sawalê jî nîşanaka vê yekê na. Ev rewş û gelek rewşên din ên weke van, didina nîşandin ku têgîna têkildanîna bi nîşanakan re radixina li berçav. Ev jî, wê dimejî de xat û xîzên wan hebin. Mejî, piştre jî, bi mirov re wê li ser wan re hin bi hin xwe pêş bixe. Berteka ku ji sawalê li dij heman sawala din ku care duyemin rastî wê hat û da nîşandin, wê bîrkirinekê jî di temenê xwe de bide nîşandin. Her wusa, ev rewş, di destpêka girtina mejî de, wê bi mirovan re zêdetir hebe. Mirov, wê piştre hîskirin pêre pêş bikeve. Her wusa, hîskirina bi têkiliyên zayendî, bi êşa ji birînê û hwd, wê bandûra wan li mejî pirr zêde hebe.

Em di xate mirov de dema ku hizirkirina xwe bidomênin, emê di vê çerçoveyê de werênina ser ziman ku wê bi demê re êdî aqilê mirov bidest pêşketina xwe bike. Ew bertekên ku wê nîşanakan bi xwe re bêne, wê piştre bi hîskirinê tevgerna din ên ji laş weke rewşên têkildanînê wê bi xwe re werênin li holê.

Ev rewş, wê hin bi hin berbi deng derxistinê ve pêvajoyekê bi mirov re pêş bixin. Her wusa, mirov, wê êdî li ser wan dengan re, têkiliyê bi hevdû re dênê. Dema ku ji hevdû hêrsbûn bû, dengê xwe li hevdû zêdekirin û bi nerînê û xwe jidandina laş re li berhevdû sekinîn û hwd, wê xwe bide nîşandin. Dema ku dest ji êgir şawitî, dengê biêş derxistin, wê rengek bê. Dema ku bi şahî bû û ankû xwest ku bi keve têkiliya zayendî de wê dengê xwe bi guharêne. Ev rewşên ku deng bi xwe re diguharênin, wê piştre li ser wan re di mejî de salixkirinên zêhnî werin û bibin.

Ev rewşên ku me di paragrafa li ser vê de hanîn ser ziman, di wan de mirov dikarê nîqaş bike ku hêst hena û yan jî nîn in. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê ji wan fahm bike ku wê têgînna fahmkirinê wê li ser wan re bi demê re biafirin.

Têkiliyên serdemên pêşî ên berî pêşketina ziman, ku tevgerên laşî jî di nav de, wê bi tevgerî xwe bidina nîşandin. Ev jî, bi mejî re têkiliyê dênin. Salixkirina wan tevger û hebûna wan, wê jîreka zimanî bi xwe re werêne li holê. Ev jî, wê di mejî de bibê. Dengên ku pêşî dihatina derxistin û bêwatebûn, wê piştre biwate bibin. Ev jî, wê bi wê jîra zimanî ya ku di mejî de pêşketîya re wê bibê. Bi demê re wê êdî li ser wê re salixkirin, di mejî de bibin. Her salixkirinên ku di mejî de dibin ku xêv wan di xwe de qayd dike, wê temenê pêşketinên serdemên piştre ên zimanî û aqilî bin. Li vir, em vê yekê jî bibêjin ku salixkirina wan tevgeran, wê hin bi hin temenê pêşxistina jîra aqil bê. Jîra aqil, wê salixkirinên ku bibin re bibêt.

Aqil û ziman, wê bi hevdû re bidest pêşxistina xwe ya bi hevdû re bikin. Li vir, li şûna gotina ´peresendinê´ gotina pêşxistinê, wê vê rewşê baştir werêne ser ziman. Ziman, bi gotinî, ew dengên ku hatina derxistin û salixkirina wan a. Her wusa, têgîna di derbarê wan de ku pêş dikeve jî, wê temenê pêşketina aqil bixwe bê. Her wusa, êdî li ser vê re wê pêşketin bibe.

Aqil, weke rêgezekê ji ziman dixwezê ku bi salixkirinê re bi navkirinê werê kirin. Ev jî, wê temenê wê yê ku ew xwe hem bi wê werêne ser ziman û hem jî li ser wê re ku werêne ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de ziman û aqil, wê bi hevdû re pêşketina xwe bikin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ev bi hevdû re bûna ziman û aqil, wê temenê pêşketina zêhnê mirov û afirandina wê bê. Pêşketina hîskirinê, hêst û raman, salixkirin û xêv, nav û têgîn, û hwd, wê zêhnê bi xwe re biafirênin.

Ziman, bi demê re wê xwe pêşbixe. Her wusa, bi demê re ziman û aqil bi hevdû re wê pêş bikeve. Ev jî, bi demê re wê hevdû pêşxistina wan ya bi hevdû re bi wan re werêne. Aqil, li ser hizirkirina bi gotinan re wê pêş bikeve. Bi wê re jî, wê aqil, di çerçoveya fahmkirina bigotinê û gotinê re wê biafirê. Pergale, li hevdûkirina gotinê û her wusa têgîna darêjka gotinê, wê di vê çerçoveyê de weke têgînna ku bi aqil re lev dikin in. Rêzkirina gotina li dûvhevdû, wê bi aqil bibe. Her wusa, rêzkirina gotinan li hevdû wê bi pergelîyeka têgînî ku li ser wateya gotinê re dibê ya. Bi levkirina wateya gotinê re afirandina têgînên din bi hevokî, wê weke teybetîya zimanî a ku piştre pêş dikeve bê.

Di vê çerçoveya afirandina ziman de wê têgîna aqil pêş bikeve. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ziman, bi aliyê xwe yê têkiliya nav zindiyan re ku çandî û hwd a, wê bi aliyê xwe yê aqil, zêhnî û hwd jî, di mejî de xwediyê aliyekî fizyolojikî bê. Di vê çerçoveyê de ziman, pergalîyeka ku hê gelek aliyên wê ne hatina fahmkirin a. Çendî ku mirov pêşketina mejî û her wusa pêşketinên mejî fahmkirin, mirov wê hinekî jî bê, wê fahmkirinê bi wê pergalîya ziman re bike. Vê jî, mirov dikarê ji rewşa bi hevdû re gîrêdana gotinan, şert û mercên girêdana bi hevdû ve û her wusa piştî girêdana bi hevdû re rewşên ku diafirin û hwd, fahm bike. Pêvajoyên nivîsandinê, wê her wusa di dewama vê de werin, Ev jî, wê zimên bi afirênin. Di aslê xwe de, ya ku wê ziman werêne ser ziman ew nivîsandin bê. Ji ber ku têrkerîyek bi nivîsandinê, rengê nivîsandinê û çawa nivîsandina wê re heya.

Serdemên şariştaniyê ên weke demên sûmerîyan û hwd, di vê çerçoveyê de, dema ku mirov li wan dihizirê, wê têgînekê bidina me. Ev serdem, weke dem û serdemên ku di wan de nivîsandin jî êdî pêş dikeve. Bi nivîsandinê re wê êdî ziman pêş bikeve. Li vir, giringîya pêşketina nivîsandina di vir de ya ku mejiyê mirov hê di destpêka xwe ya pêşketinê de ya û di xêvê de wusa zêde girtin nabê û ankû hindik û hindik dibe. Her wusa, nivîsandin, wê giringîya wê ew bê ku wê karekî giring bo xêvê bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de xizmeta nivîsandinê ya bo xêvê, di wê çerçoveyê de çendî ku mirov li ser bisekinê wê cihê wê bê.

Ev destpêka nivîsandinê, di vê çerçoveyê de giringa ku mirov wê dahûr bike. Nivîsandin, wê di wê demê de du tiştên pirr giring bi xwe re pêş bixe. Yek ji wan nivîsandina ku ew mayindatiya wê dike ya. Ya din jî, ku weke teybetîya ku wê bi xêvê re hin bi hin pêş bikeve ´jiberkirin´ a. Jiberkirin, di hiş de hiştin a. Her wusa, ev jî, bi wê nivîsandinê re êdî dihê kirin. Ev, wê êdî weke alikariyek jî bê ji xêvê re. Mejî, dema ku li wan

nivîsandinên ku dibin dinerê, wan hem bi hebûna wan ya ku dinerê re di xwe de qayd dike û hem jî di navaroka wê de çi ya wê têgînê bizane dike di xwe de.

Nivîsandin, di vê çerçoveyê de wê ji bo mejî, weke pêngavek pêvjoyî ya giring bê. Her wusa wê, pêngaveka dîrokî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê tiştekî ku mejî, wê hiş bike wê li ber wê bê. Bi wê re jî, weyna xêvê bi wê re êdî hin bi hin bi hiş dibe û pêş dikeve. Di aqil de girtin û ankû jiberkirin, wê di vê çerçoveyê de were kirin. Di dema ku mirov li nivîsekê dinerê, di hundurê wê de çi dibînê wê di mejiyê xwe de qayd dike. Her wusa, wan xîzên ku bi wate kirina, wan di mejiyê xwe de qayd dike. Mejî, wa xîzan jî, bi wê têgîna watekirina wan re, di mejî de weke ajoyna hîmî di xwe de digirê. Hebûna tîpan, di vê çerçoveyê de wê weyneka giring ya hîmî bo xêvê jî bigrê

Tîp, weke hinek xîzên ku mirov ew afirandina û bi wate kirina na. Lê wê ji bo xêvê, weke nîşanakna ku mifteyî jî bin. Her wusa, xêv, vê teybetmendiya xwe li ser wan re pêş dixe. Dema ku lê hat nerîn, bi wê re çi bi têgîn kiriya, wê bibîr dike. Êdî, wê ji bîr nakê. Her wusa, ev rewş, wê pêngaveka din bê bo xêvê û pêşketina wê. Xêv, piştî ku pêşket û pêde, wê temenê hizirkirinê diafirêne. Her wusa, li vir xêv, giringîya wê, temenê girtina di mejî de ya. Nivîsandin, xêva girtina di jîyanê de ya. Divê ku mirov nivîsandinê jî di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, nivîsandin, karekî xêvî ê di jîyanê de jî bi xwe re dileyizê. Li vir, ya ku mirov wê kifş bike ew a ku piştî mejî vê kifş dike û pêde, wê pergaliyekê di nava xêvê û wê nivîsandinê de bi xwe re bide afirandin û li ser wê bi hizirê û bi dest afirandinê bike. Yanî, weke nivîsandin, gîyane xêva me ya di hundurê mejî de bê. Her wusa ji aliyê din ve jî, weke ku xêv gîyane hîmî a temenê nivîsandin û pêşketina wê bê. Herdû jî, dema ku digihijina hevdû, weke xêvekê kar dikin di mejî de. Ji xwe mejî jî, wa bi hevdû re di vê çerçoveyê de bo xwe bi wasif dike. Ji wan sûd digrê.

Xêv û nivîsandin, li vir, divê ku bi hevdû re têkiliya wan baş werê fahm kirin. Ev, wê têgînekê di derbarê pêşketina mirov, pêşketina aqil û bi wê re zêhnê mirov de jî bide mirov. Her wusa, xêv û nivîsandin, bi demê re hevdû li gorî hevdû rast dikin û ji hevdû bawerîya hevdû jî piştrast dikin. Pişta xwe didina hevdû. Bi hevdû re, weke yekê kar dikin di jîyanê de. Aliyê xêvê bi girtin û ji berkirinê û mayindakirina wê, bi nivîsandinê re weke ku were tememkirin. Her wusa, nivîsandin, weke aliyê xêvê ê bi demê re ku xwe mayinda dike ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê hilde li dest û werêne ser ziman. Xêv û nivîsandin, weke

aqil û ziman, felsefe û zêhn in ji hevdû re. Dema ku mirov li ser xêvê û nivîsandina bi hevdû re dihizirê, têgîna aqil û ziman bi hevdû re ku çawa girêdayîna dihê ber bîra mirov. Her wusa, rewşa aqil û ziman, li vir, têgîneka baş wê bide di derbar xêvê û pêşketina nivîsandinê de. Nivîsandinê, karê ku bo xêvê û mejiyê mirov kirîya, ji vê aliyê divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê û hewl bide ku wê fahm bike. Ev alî, wê weke aliyekî giring ê pêşketina mirov a bi demê re jî bê. Xêv û nivîsandin, bi demê re di temenê mayindakirina têgînê de wê hevdû temem bikin bi jîyane mirov re.

Xêv, di hundurê mejiyê mirov de ya. Lê xêva jîyanê jî nivîsandin a. Her wusa ev herdû alî jî di çerçoveya jîyandina mirov û pêşketina aqilê mirov de hevdû weke ku temem dikin. Nivîsandin, wê karekî giring li vir bo xêva mirov bike.

Xêv, piştî ku nivîsandin pêşket û pê de, wê zêdetirî zû pêşbikeve. Her wusa, wê êdî temenê wê(xêv) û girtina wê ya di jîyanê de werê pêşxistin. Nivîsandin, di vê çerçoveyê de, ne tenê giringîyeka di jîyanê de bo pêşketina mirov ku pêşketîya. Ji wê zêdetirî, weke pêşketina dîrokî ya ku wê êdî temenê wê pêşketina mirov ya xêvî bê. Ya ku li jîyanê mirov gihandiya wê têgîn û qûdreta nivîsandinê wê xêv bê.

Bi nivîsandinê re êdî xêv ketîya jîyanê de. Her wusa têrkerîyek bi xwe re pêşxistîya di jîyanê de. Tîrîtîya têgînî ya xêvî, di jîyanê de di vê çerçoveyê de xwe hanîna ser ziman.

Em dikarin, nivîsandinê bi xwe jî, weke xêvîya ku li jîyanê pêşketî werênina ser ziman. Her wusa, dema ku mirov wê werêne ser ziman, wê pirr rast û di cih de bê. Nivîsandin bi xwe jî xêvîya. Qaydkirin a. Her wusa bi nivîsandinê re mayindakirin a. Di vê çerçoveyê de weke ku aliyekî xêva mirovî a mejî, bi nivîsandinê û pêşketina re di temenê mayinda kirinê de hatîya temem kirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li wê binerê û werêne ser ziman. Nivîsandin, her wusa, dema ku mirov bi zêvê re dihilde li dest hevdû temem dikin.

Tîp û karakterên nivîsandinê ku li jîyanê pêşketina, bi wate kirina wan di xêvê û mejî de, wê wê nivîsandina li jîyanê dihê kirin hemûyî jî bike malê xêvê. Yanî, bi gotinaka din, wê xêvê bike xwediyê wê. Tehera di nava nivîsandin û xêvê de di vê çerçoveyê de xwediyê pergaliyekê ya. Her wusa, em li jîyanê, nikarin herdû xêv û nivîsandinê ji hevdû cûda werênina ser ziman. Ji ber ku herdû hevdû temem dikin. Weke ku yek bê ya din nabê. Di rewşek bi vî rengî de bi hevdû ve girêdayî na.

Hemû salixkirinên ku bi nivîsandinî mirov wan di jîyanê de dike û dihêne ser ziman, salixkirina wan di xêvê de ya. Her wusa, salixkirina nivîsandinê, ji tîpên wê bigrê û heta ku digihijê nivîsandina ku dihê kirin û têgîna ku di navaroka wê de hatî nivîsandin, wê hemû jî di vê çerçoveyê de bi hevdû re û di çerçoveyê de di ahengekê de bin ji hevdû re.

Em li vir, divê ku nivîsandinê, weke gaveka giring a dîrokî werênina ser ziman. Bi wê re jî, divê ku mirov di temenê nivîsandinê de xêvê werêne ser ziman. Aliyên mayindakirinê bi nivîsandinê re wê ji xêvê re alikarîya wan ew bê ku ji demê buhurîna li demê bin. Di hundûrê xêvê de, her pêşketina ku dibê, piştî ji demekê buhurîna li demekê, wê hevgirtin(sentez)ek bi wê re bibe. Her wusa, ev dema ku zaroyek ji dayika xwe bû, ku bi amedeyîyeka ku ji axiftin û piştre meşê û hwd amedeya ku dihê dûnyê, vê rastiyê radixe li berçav. Lê ew rengê hevgirtina ku di hundurê xêvê de dibê, wê bi nivîsandinê de cûda bê. Nivîsandin, bi rengê ku hatî nivîsandin re wê mayinda bibe. Piştre li ser têgîna navaroka wê re hevgirtin û pêşxistina wê dibêê. Ev rengê pêşketinê, wê rengekî din ê pêşketina xêvî bê. Ev jî, wê xêvê, hertimî zindî bihêle li jîyanê.

Nivîsandin, dema ku mirov wê werêne ser ziman, divê ku mirov bi gelek aliyên wê yên ku xêvê temem dikin re werênina ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li ser wê bisekinê. Xêvkirina di hundûrê mejî de, wê her wusa, vê rengê pêşketina di jîyanê de ê bi dîtinî û xwandinî ji nivîsandinê û hwd, bike temenê xwe de. Nivîsandin jî, wê fahmkirinên xêvî ku dîtinên bi mejî re bike temenê xwe û pêşketina xwe de. Di aslê xwe de, dema ku mirov bahse zêhnê bike, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi xêvê nivîsandinê de bahse wê bike. Ji ber ku xêv, her wusa, temenê wê pêşketina hişî û ankû zêhnî diafirêne di jîyanê de. Her wusa, temenê fahmkirina jîyanê ya. Jîyan li ser wê re dihê salixkirin bi pêşketinên wê ên demê û serdemî re. Her wusa, li vir, jîyane mirov dema ku mirov bahse wê bike, wê jî divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Her wusa, ew têgîna nivîskî ku dibê, wê têgînekê di vê warê de êdî biafirêne. Her wusa, mirov bi aqilê xwe yê ku êdî dinivîsêne re wê serwerê wê jîyane ku wê dijî bê. Nivîsandin, çerçoveyeka xêvî ya. Her wusa, di wê çerçoveya xêvî de hişkirin dibê. Xêv, li ser wê re xwe diadilêne. Bi wê re jî, çendî ku xwe adiland, wê piştre di dewama wê de adilandinê di ziman û aqil û hanîna ser ziman a bi nivîsandinê jî bike.

Nivîsandina ku em wê weke temenekî giring ê xêvê ê di jîyanê de dibînin, wê xêvê barî jîyanê bike. Lê li vir, dema ku em bahse nivîsandinê û xêvê bi hevdû re bikin, divê ku em di çerçoveya nivîsandin û rastkirina nivîsandinîyê de em divê ku bahse têgîna vacê ya ku bi wê re pêş dikeve jî bikin. Vac, çend ku weke têgîneka ku tê gotin ku di serdemên felsefeyê de xwe dide dîyarkirin jî bê, lê dema ku em di çerçoveya nivîsandinê de wê werênina ser ziman, em divê ku bibêjin ku wê xwediyê dîrokek demdirêj bê. Nivîsandin, wê hin bi hin rastkirinê di jîyanê de bike.. Her wusa hizra ku bi nivîsandinê re tê ser ziman jî, weke têgînna ku êdî wê jîyanê biadilênin bin.

Nivîsandin, wê weke heyîn û hebûnaka kifşkar ya di jîyanê de bê. Nivîsandin, her wusa, wê weke bi çerçovakirina aqil jî mirov divê ku werêne ser ziman. Li vir, li ser nivîsandinê re têkiliya aqil û ziman mirov divê ku li vir dêne. Hanîna li ser ziman, wê bi navaroka wê re weke aqilekî bê. Lê bi hebûna wê re ji aliyê zimanî ve jî, wê giring bê. Weke nivîsên bizmarî ew kevilbarên nivîskî ên ji demên sûmerîyan û hwd, wê bandûraka wan ya giring û mazin wê hebe. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku aqil, her wusa, êdî bi nivîsandinê re di jîyanê de kifşkarîya wê pirr zêde ya.

Aqil, bi nivîsandinê re wê di jîyanê de pirr zêde pêşbikeve. Nivîsandina aqil, wê temenê bi rêxistinkirin û bi awa û şeklkirina jîyanê û mirov û her wusa mejiyê wî jî bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku nivîsandin, weke xêva li jîyanê a li berçav a.

Çerçoveya nivîsandinê, weke têgîneka hizirkî, dema ku mirov wê dihilde li dest, her wusa ew aqilîya wê dihê dîtin. Xêv, li gorî salixkirinên ku li ser tîp û hwd re kirîya dimejî de, êdî xwandinê bi wê re dike. Ev jî, wê êdî bi xwe re çerçoveyekê werêne li holê.

Xwandin, bi serê xwe tehereka wê ya dîyelektikî ku bi nivîsandinê, xêvê û mejiyê mirov re heya. Xwandin, di vê çerçoveyê de dema ku dibê, ne tenê ew binetera nivîskî dihê xwandin. Her wusa, mejî, bi wê xwandinê de, weke ku çawa ku di xwe de û di xêvê de afirandîya û qaydkirîya, wê bi xwandinê re şîyariyê bide çêkirin. Ev jî, wê aliyekî din ê giring bê.

Bi den xwandin, her wusa, di vê çerçoveyê de, wê aliyekî wê yê bi vî rengî wê hebe. Ew jî, ew a ku wê weke çerçoveya nivîskî ku xêvê di xwe de qaydkirîya wê tenê ew nebê. Wê her wusa, ew deng jî bibe. Deng, di xêvê de, qaydkirina wan, weke dagerên têgînî dibê.

Bi xwandinê re, wê nivîs, di çerçoveya xêvê de awayekî teybet bistêne. Wê bê weke binetereka zindî k u dijî jî. Xêv, bi deng re gotinan di xwe de qayd dike. Her wusa, deng, weke dageran, wê qayd bibin. Xêv, di mejî de di vê çerçoveyê de ew ´kompleksa´ ku li ser deng re bi wê re diafirêne, wê bi bandûra wê ya di xêvê de bê.

Nivîs, deng û her wusa xêv, bi hevdû re wê çerçoveya wan ya zimanî, bi wê nivîsandina ku bûyî re wê hebe. Her wusa, xwandin, vê yekê, bi deng dike. Deng, bi du rengan mirov wê dike. Yek, bi bi dengî xwandinê re ew hebûna dengî ya. Yek jî, ew a ku dema ku xwandinê ku di hundurê xwe de xwandinê ya. Her wusa, rewşa xwandinê, weke rewşeka teybet ya ku mejî û xêvê li ser nivîsandinê re pêşxistîya ya. Mejî, xwandinê dike. Wê xwandina ku kir, wê di xwe de qayd bike. Her wusa, wê xwandinê li ser têgînên ku hatina têgihiştin ên navarokê re wê hewl bide ku bike. Ev bi dengî dihê û dibê. Lê bi dîtinê re, yanî bi çav dîtinê re wê ew çerçoveya ku hatî dîtin, bi xîzên wê ên ku bi hişarî tên kifşkirin re wê qaydkirina wan bibe. Li vir, dema ku em di vê çerçoveyê de bahse hişarîyê bikin, divê ku em hişarîyê, di çerçoveya şîyarîya xêvê de werênina ser ziman. Bi wê re divê ku mirov di çerçoveya kifşkirina bi mejî re werênina ser ziman. Di serdemên berî pêşketina ziman û nivîsandinê de, deng û dîtin, wê hin bi hin pêşketinê bikin. Lê piştî nivîsandinê re wê êdî her wusa weke temenekî bingihînî wê nivîsandin û her wusa gotin pêşbikevin. Nivîsandin, gotinê pêş dixe. Deng salix dike. Her wusa, dengê gotinê salix dike. Di wê çerçoveyê de jî, weke ku çawa xêvê li ser tîp û hwd re di xwe de qaydkirîya wê, bi wê salixkirinê re êdî wê di çerçoveyek afrîner de pêş bixe. Ev jî, wê weke aliyekî giring ê çerçoveyî bê. Bi wê re salixkirina gotinan bi tevgerîyan re jî, êdî weke ku dihê dîtin dihê kirin. Piştre êdî ´dîtin´, ´bihîstin´, ´bêhnkirin´, ´têjgirtin´, û hwd, wê li gorî rewşên ku fizyolojikî ên mirov re wê pêş bikevin.

Di Serdemên pêşî ên pêşketina ziman de, wê rewşên tevgerî ên ku hatina salixkirin bi tevgerî, wê bên bi dengkirin. Ev, pêşketineka xwezayî ya bi ziman re ya. Lê piştî nivîsandinê û hwd re, wê salixkirina dengan êdî bi gelek awayên wê re êdî pêş bikeve.

Ev jî di destpêkê de wê bi gotinên piçûk wê werê kirin. Minaq, weke ku di kurdî de heta roja me de, gelek gotinên kevn ên ji dema sûmerîyan hena. Minaq, **´ga´,** navê sawalak gir a. Lê piştre gelek awayên din jî lê hatina kirin di kurdî de. Minaq, wateyê têkiliyên zayendî ku bi hevdû re têkiliyê dênin jî, ji aliyekî din ve xwediyê wateyê ya. Di kurdî de bi dengî ku ji wan deman heta roja me hatîya tîpa **´a´,** dihê wateya ´herêkirin´,

´herê!´, ´bi deng derxistinê dengek dirêj û stûr ya ´a´ û bersiv dayina yekî li hemberê xwe ku di cih de ´herê´ bike û bêjê herê ya. Her wusa, li ser dengên tîpan re gelek gotinên ku hatina salixkirin, em dikarin bêjin ku heta roja me jî li herêma botanê a kurdistanê hatina bikarhanîn.

Dengê ´a´´yê, di kurdî ne tenê di wateya ´herê!´ de ya. Her wusa di wateya dayîna tiştekî li yekî bi deng gotina ´ji te re´ ku dengê ´a´ dihê derxistin, dikeve wê wateyê de jî. Bi heman rengî, dengê tîpa ´a´, di kurdî de bi têkiliyê yekî ku li hemberê xwe ku hinekî jê dûr lê ku bi çav dibînê ku nîşan bike û dengê bi nîşandayinê re ku dihê derxistin jî, bi wê re dihê ser ziman. Her wusa, ji aliyê mijara me ne dahûrkirina gotinên zimên in. Lê ku em gotinên zimên li berçav bigrin, emê di vê çerçoveyê de bi hezaran rewşên ku hê mana di zimanê kurdî de emê kifş bikin. Her wusa, gotinên kin ku du tîpî, pirr zêde hena di kurdî de. Di roja me de, ji ber nezanîya zimên ev nayên bikarhanîn. Lê pirr zêde hena. Gelek gotinên weke ´şa´, ´ka´, ´ha´, ´va´, ´wa´, ´na´, ´ra´,´ ta´, ´ ha´, û hwd, bi sadan gotinên ku em dikarin werênina ser ziman, gotinên ku pirr dengî û pirr wateyî na di zimanê kurdî de. Teybetmendiya wan, ew a ku du û ankû sê tîpî û pirr-wateyî na. Ev jî, ne yên roja me na. Her wusa, ji wan serdemên berê ên ku ma na.

Zimanê kurdî, divê çerçoveyê de mihtacê dahûrîyekê ya. Ev dahûrî jî, bi serê xwe divê ku were kirin. Ew jî, bila bo me bi mêne weke mijara lêkolîneka din ya ku em bikin bê. Ev dahûrîya ku bi awayekî rast zanistî werê kirin, wê gelek agahî û zanyarîyên di vê temenê de ku em hewl didin ku wan dahûr bikin û fahm bikin jî, wê derxê holê û werêne ber me.

Dahûrkirina gotinan, wê her wusa têgîneka baş bide me. Em dema ku gotinan, weke xwe ku ji wê demê mana û heta hata roja me, ku em wan di çerçoveya wan de hildina li dest, wê têgînekê bidina me. Her wusa, wê di derbarê rengê pêşketina van demên buhurî ên li ber diclê û firatê de jî têgîneka baş bide me. Di vê çerçoveyê de zimanê kurdî, bi zaravayên xwe re weke pirtûkxaneyeka dîrokî ya di derbarê wan deman de ku dest lê ne hatîya dayîn a.

Gotinên ziman, li ser temenê wê giring in ku werina fahmkirin. Her wusa, gotinên zimanê dayikê, bi ser wan re gelek nifş buhurîna. Bo vê yekê, di xêvê de giringîya wan weke ku pir heya. Her wusa, ew gotin, bo mirovê ku ew ji zimanê wî na, dikarin bikevina gelek wateyan de jî. Gelek ji wate ji wan were derxistin. Ev wateyên ku hatina derxistin, wê wateyên xêvî ên demî û serdemî bin.

Ziman, dema ku mirov wê hilde li dest, weke ku me hinekî li jor bi nivîsandinê û têgîna nivîsandinê û her wusa têkiliya wê ya bi nivîsandinê re û ya wê ya bi xêvê re ku me hanî ser ziman, wê di vê çerçoveyê de têgîneka baş bide me. Nivîsandin, di vê çerçoveyê de gotinê bi xêvê re di cemidêne. Ev jî, bi têgîna xêvê re nivîsandin şenberîyekê dide çêkirin. Şenberîya li ser nivîsandinê re bo xêvê giringîya wê zêdetir a. Her wusa, li ser wê re aqil, pêvajoyên xwe yên pêşketinê pêşxistina. Aqil, her wusa, li vir, em divê ku bi ziman re di heman rewşê de werênina ser ziman. Çerçoveya darêjkî a bi deng û gotinê re ku diafirê, wê çerçoveya aqilî bi xwe re werêne li holê. Li vir, weke temenê heyînî û hebûnî ê aqil, divê ku mirov ziman bibînê. Ziman, giringîya wê çendî ku mirov li ser bisekinê wê cihê wê bê. Her wusa, bi aqil re me li jor hinekî hanîbû ser ziman. Li vir jî, di çerçoveya mijarê de mirov dikarê weke aliyekî din ê wê ê zêhnê werêne ser ziman. Bi nivîsandinê re zêhn, pêş dikeve. Zêhn, weke têgîna ji nivîsandinê ya. Her wusa ji zimanê ku heyî ya. Her wusa, ji xêva ku fahmkirî ya. Zêhn, zanîna aqilê ku pêşketîya ya. Wê zanîna aqil, mirov dikarê bi gotina ´jîrê´ re jî werêne ser ziman. Her wusa, piştî ku jîr bû û pê de, wê bîrewerî pêş bikeve. Ev jî, êdî wê taqabûlî pêvajoyên pêşketina aqil bike.

.

**Pêvajoyên pêşketina aqil. ..**

Thales, weke filosofekî serdema kevnera(antikî) ku weke ´filosofê pêşî´ jî tê bi nav kirin a. Thales, weke ku tê gotin ji ´Miletûsê´ ya. Lê Heredot di ´dîroka´ xwe de wî weke ´fenikeyî´ jî dide nîşandin. Thales, weke filosofekî ku di derbarê wî de jî zêde ti tişt nayêna zanîn a. Ji wî, heta dema me, wusa zêde ti nivîsên wî bixwe ku nivîsandina ne ma na. Hizrên wî yên ku weke yên wî tên ser ziman jî, bi devkî û ankû bi rêya Heredot û ankû Xinasefon hatina ta roja me. Lê Thales, dema ku bahse wî dihê kirin jî, weke destpêkekê di pêşketina felsefeya antikî de bahs ji wî dihê kirin.

Thales, weke ku bo wî dihê gotin ku di serdema xwe de pirr gerîya ya. Heta Ber ava Nîlê yanû Misra kevn jî çû ya. Dema ku bahse jîyane wî dihê kirin jî, ev beşa jîyane wî ya ku tê gotin ku wî li Misrê buhurandîya, weke demek hinekî dirêj jê dihê bahs kirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku Thales, li ber diclê û firatê, hizrên xwe di serê xwe de pêş dixe. Her wusa, mirov vê yekê ji kûderê fahm dike? Mirov ji rengên hizrên wî ên ku bi navê wî dihên ser ziman, mirov digihijê wî têgîhiştinê. Thales, di serdema xwe ya ku dihê gotin ku dijî de jî, li dora 624-547´an û wan, berî

zayîna îsa dijî.

Di wê serdemê de jî, li ber firatê bi teybetî, ev herêma kurdistanê a rojavayê kurdistanê, weke welatekî ya û li wê jî têgîna Mîtrayî ku di dewama wê de ya Zerdeştî tê lê serdest a. Ev têgîna Mîtrayî, di temenê bawerîya li ´yazdan´ de ya. Her wusa, vegotinên ku li ser afirandina dunyê ku bi navê yazdan re dihên ser ziman, di wan de jî, bahse "meyandina ardê" dihê kirin. Dihê gotin ku "hemû dever û dunya av bû." Ji ber firatê û heta ku digihijê ber ava Nîlê, wê ev têgîn weke têgîneka serdest hebe.

Têgîna "hemû tişt ji avê ya", wê ya weke têgîneka Thales jî ya bingihîn bê. Thales jî, piştre bawer dike ku hemû tişt ji avê ya. Di vê çerçoveyê de, weke ´çavkanîya´ hemû tiştî avê dihêne ser ziman. Her wusa, Thales, ew her çar elementên ku li ber firatê bi wan bawerî dihat kirin ên weke ´av, agir, ax û hewa´yê jî weke elementna bingihîn di temenê hizrên xwe yên ku dihêne ser ziman de dihêne ser ziman. Thales, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke filosofekî ku xwe di nava wê têgîhiştin û bawerîya yazdayî de bi perwerde kirîya ya.

Ev serdemên ku Thales di wan de dijî, wê weke serdemna ku di wan de êdî felsefe pêş dikeve bê. Her wusa, Thales jî, li gorî wê xwe bi zanebûn dike. Di vê çerçoveyê de têgîna ´stêrzanî(astronomî)´yê û hwd jî, pêş dixe. Li ser bi rêveçûna jîyane li dunyê jî, ew bi ´xwûdayan´ re dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî, li gorî Thales, ´her tiştê li jîyanê bi jîyan a´. Ew di vê çerçoveyê de lê dinerê. Hizrên Thales, wê piştî wî ji Anaximenes, Pythagoras, Xenophanes, Herodotus, Heraclitus û Democritus re bê peyxam û wê ev filosof û ên weke wan ku piştî wan re derdikevin jî, wê hizrên xwe li ser wê temenê ku Thales avêtîya demezrênin. Bo vê yekê ya, ku mirov divê ku Thales, weke destpêkekê di pêşketina felsefeya kevnera(antikî) de bibînê.

Gelek hizrên Thales, wê ji jîyan û gerên wî werina derhanîn. Her wusa, minaq, weke ku tê gotin ku 28 gûlana 585 ´rojgirtina´ ku tê gotin ku wî kifşkirîya, divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Ev vegotina ´rojgirtinê´, di serdemeka ku artişa Medîya û ya Lîdya ku ketîya ber hevdû li ber ´cemê sor(hayls)´, di wê demê de dihê û dibê. Ev şerê ku li anatolîa di nava artişa Medîya û Lîdya de ku ser 5 salan re ku didomê, wê di rojeka ku artişên herdû aliyan cardin dihê berhevdû de wê heyv bikeve nava roj û dunyê de û dunya reş bibe. Ev rewş, wê ji aliyê Medîyayîyan ve jî û ji aliyê Lîdyayîyan ve weke "hêrsbûna xwûdanên wan li wan´ wê were xwandin. Piştre şêwirmend û aqilmendên herdû

aliyan li hevdû dicivin û bi hevdû re digihijina wê qanaatê ku xwûdanên wan li wan hêrsbûna û nexwezin ku ew bi hevdû re şer bikin. Bo vê yekê, êdî ew jî, weke ya rast di nava xwe de kifş dikin ku aşîtîyekê çê bikin. Weke peymana wê aşîtîyê jî, keça keyê Lîdyayî ê demê Alîyêt Aryanîs wê bi kurê keyê Medî Qîyakser Astîyag re were zewicendin. Ev zawac, weke zawacaka wê aşîtîyê jî ya. Heredot, vê rewşa rojgirtinê di dîroka xwe de jî dihêne ser ziman.

Di wê dema ku ev bûyar li dûv hevdû di nava Lîdyayîyan û Medîyayîyan de rûdidin de Thales li rex keyê Medî di nava şîwirmendên wî de rûniştîya û li herdû aliyan hisandîya. Her wusa di dewama vê de, divê ku mirov vê jî werêne ser ziman ku wê Thales, hizrên xwe pêş bixe. Thales, weke ku bi navê wî re tê gotin ku wî hizirkirîya ku dema ku têhn dide avê û av jî êdî dibe ´bûhar´ û li hewayê belav dibe. .. Bi wê re jî, tê gotin ku Thales têgihiştîya ku Ardhejên ku li ardê dibin sedema wan av di bin ardê de ya.

Li gor vegotina Heredot, teybetiyên Thales pir bûn. Ew şêwirmendê dewletê, endazyar û zanyarê dema aqil bû. Beşek ji jiyana xwe li Medîya derbas kiriye û ji Medîyan fehm kiriye ku bingeha her tiştî av a. Dîsa li gorî heredot, çûya Misrê jî û li vir jî maya. Weke yekemîn geometrîvanê yewnanan jî tê bi navkirin. Wî sîya pîramîdan pîvaya bo ku bilindiya wan derxê holê. Bo wî tê gotin ku bo ku dûrbûna keştiyan ji qiraxê bi pîve, wî hinek rêbazên geometriyê bi pêşve birina. Li gor Thales bejî, li ser avê avjeniyê dike. Teoriya yekem wî, li ser sedemên erdhejê çêkiriya. Thales dibêje ku lepta erdê weke ya keştiyeke li ser avê ye. Ji loma jî, erdhej çêdibin. Li gor wî, her tiştê li ser rûyê erdê xwedî can e û cîhan bi xwedayan tijî ya. Bi hizrên xwe yên ku hanîna ser ziman, bi awayekî xweza hewldaya ku têgîna miqnatîsê jî şîrove bike.

Î ro ku mirov li rengê mîtolojiya ku li ser Thales bi bandûr bûya dinerê, mirov ya li berfiratê zêdetir dibînê. Di vê çerçoveyê de wî hewl daya ku xwezayê û jîyane xwezayê fahm bike. Li ser herîkîn û tevgerên xwezayê hizirîya. Ji wan xwestîya ku bigihijê hizirna. Her wusa, hizrên weke ´ji rojê bûyîna dunyê´ û heyvê, wê vê rastîyê di serê me de xorttir bikin. Bi wê re jî Thales, tişta ku di gerên xwe de didît, ji wan fêr girtîya û hanîya ser ziman. **Î ro**, dema ku hizrên Arîsto jî tên dahûr kirin, ji wan jî hin hizirna ku tê gotin ku Thales hanîna ser ziman, dihên ser ziman. Pergale hizrî ya ku Arîsto ku hanî ser ziman, her wusa wê di van waran de hizirna di serê mirovan de jî bide çêkirin. Hizrên li ser ardê, avê, jîyanê û hwd, ku Arîsto bi dahûrî hanîna ser ziman, wê di vê çerçoveyê

de jî, weke hizirna dewamî werina ser ziman bin. Arîsto, weke filosofê pêşî Thales bi nav kir û hizrên wî di rexnevîyeka biaqilî de buhurand.

.Thales, weke filosofekî li ser demsal, salê û rojê jî hizrên xwe di serê xwe de afirandina na. Di roja me de gelek zanyarên ku li ser wî dihizirin, dibêjin ku wî pîvandina bi rojê jî fêr bû bû. Filosofê romî Apuleius ku li dora 125-180´yî jîya ya, dinivîsêne ku "Thales, di salên xwe yên dawî de pergalek hijmartinê a rojê ya pêşketî pêşxst." Çend ku ew vê bêje jî, ti birhan di dest de tûna na ku em bi wan bibêjin ku Thales xabetek bi vî rengî kirîya. Lê li vir weke ku John M Steele di xabeta xwe ya bi navê "Eclipse Prediction in Mesopotamia." dinivîsêne ku ´babilî, di xabate pîvana bi rojê û stêran re de pirr zêde pêşketî bûn û xwedîyê têgîheka astronomîkî na ku pir zêde pêşketî bû´. Ev jî, weke rafaransê bo pêşketina van hizrên di serê Thales û hwd de, têgîheka ji xwe re di serê mirov de dide çêkirin. Danûstandinên Platon ên bi Sokrates re dihêne ser ziman ku ´Thales, hewl dida ku bi stêran fahm bike.´ Di vê çerçoveyê de wê di nava filosofên demê de nîqaş werin û bibin. Nîqaşên li ser stêran, wê têgîhên astronomîkî bi xwe re bide pêşxistin. Bi wê re jî, matmatik û geometrî. Hizreka rêmildarên Medî hebû, ku digotin ku "bi derketina tava rojê re stêr ji berçav winda dibin." Ev hizra rêmildarên Medî, wê piştre weke hizrek felsefîkî jî were ser ziman. Medî, ti kesek weke wan di astronomîyê de ne pêşketî û bi kevneşopî bûn. Ew xwediyê kevneşopîyek demdirêj a astronomîyê a bi pergal bûn. Ev hizir, bi pergalî di nava rengê bawerîyê de dihatina ser ziman.

Minaq, Mîtrayîyan, pergalek astronomîyê pirr zêde pêşketî di serdemên hûrî-mîtannîyan de pêşxistibûn. Şîroveyê vê pergalê, di dema aqil de, wê bi xwe re pêşketinên felsefîkî werênin. Bi vê re jî, em dikarin bibêjin ku êdî bi demê re bi astronomîyê re wê êdî werzê(matamatik) û geometrî jî pêşbikeve. Filosofên girêkî ên weke Pythagoras, Solon, Herodotus, Platon, Democritus, û Euclid, wê weke Thales rêwîtîya wan bi ber welatê Medîya û Misra kevn de jî wê bibe. Bi pêşketinên astronomîkî, wê hin bi hin têgîhên werzêyî jî bi xwe re pêş bixin û werênina ser ziman. Euclid, wê xwe bigihêne têgiha geometriyê. Ber Nîlê û ber firat û diclê, li vanderan têgiha astronomîyê pirr zêde pêşketî bû. Her wusa, avakirinên weke pîremîdan misra kevn ên berdiclê û firatê, bi heman rengî avakirinên ku hatina çêkirin, bi serê xwe didina nîşandin ku çendî têgiha astronomîyê û bi wê re jî ya werze(matamatik)yê û geometrîyê pirr zêde pêşketîya bi wan re.

Di vê çerçoveyê de, bi vir ve girêdayî bi kortasî mirov dikarê bi vê rengî têgîna wî ya werzê werêne ser ziman ku li gor Heredot û Eudemos, girtinarojî bi pîvanê pêşî kifşkirîya. Di wê demê de jî, ên ku karê pîvanê dikirin jî ên stêrzan in. Stêrzanî bi hijmatin û pîvanê dihêne ser ziman. Bi pîvana sîyê re di warê werzê de jî pîvanên wî bi vî rengî na. Xeleka hevrast li duyan beş dike. Du keviyên wekhev, sêkika wê ya hîmî wekehevdû ya. Du rastên ku li hevdû na, vajîyên wan li hevdû tên. Ku kevî li ser xalekê bê û hevdû dibînê, rast a. ...

Li vir, divê ku mirov bahse hizrên Thales ên astronomîkî bike. Ji van hizrên wî, wê hin bihin têgîna hijmartinê bi aqilî pêş bikeve. Ev jî, wê rê li pêşîya pêşketina matamatik û geometriyê veke. Thales, di rêwîtîya xwe ya li Misrê de li vir di vî warî de biqasî ku dihê ser ziman, xwe pêşxistîya. Bi sîya wê, pîremîdan dike bi pîvê. Her wusa, li asîmana hebûna stêran, heyvê û rojê, dinerê û dixwezê ku fahm bike. Hizreka ku herî zêde wê di wê demê de pirr navdar bê, wê hizra bi rengê rêmîldarên demê ên medî bê ku digotin ku "stêr, di bin rohnîya rojê de vêşarî dimênin" a. Ev hizir, wê weke hizreka afrîner wê bide hizirkirin. Her wusa, hewldana fahmkirina rohniyê weke "perdeyekê" wê di vê çerçoveyê de bibêt. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ew destpêka ku Thales bi aqil kirîya, wê piştî wî re Anaksagora wê hinekî wî ji aliyê hişmedîya aqil ve pêş ve bibe. Lê ji aliyê geometriyê ve hizrên ku Euclid hanîna wî ya li ser ziman, wê weke hizirna ku Thales temem dikin bin.

. **Di** dewama mijarê de pêvajoyên pêşketina aqil, divê ku mirov li ser wan bisekinê. Li jor, me hinekî ew hanîbû ser ziman. Lê li vir, bi pêşketina ziman re, ji ast û pêvejoyekê pê de, wê aqil çawa bi dîrokê re pêş bikeve mirov divê ku wê werêne ser ziman. Me li jor, bahse nivîsandinê kir û têkiliya wê ya bi xêvê re hanî ser ziman. Her wusa, nivîsandin li vir, dîsa weke têgîneka hîmî ku em di çerçoveya pêşketina aqil de werênina ser ziman bê.

Dema ku bahse pêvajoyên aqil dikin, em divê ku em bibêjin ku em bahse pêvejoyaka ku êdî mirov dihizirê û dikarê bi hizrê re bibînê dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de êdî bi aqil li jîyanê û hewirdorê nerîn dibê. Pêvajoyên pêşketina aqil ên bi temem, em dikarin bi destpêka nivîsandinê re werênina ser ziman. Ev pêvajo, her wusa, pêvejoyên destpêkê ên aqil û piştre felsefeyê jî na. Mirov dikarê bi vê rengî jî wan werêne ser ziman. Ev pêvejo, wê weke pêvajoyna ku êdî aqil li jîyanê hin bi hin pêş dikeve bê. Nivîsên ku hatina kirin, ku piçûk û yan jî mazin,

farq nakin, wê kifşkirina wan bi demê re hin bi hin derkeve li holê di jîyanê de. Her wusa, bi hizir dîtin û kifşkirin, êdî wê pêş bikeve. Bi hizirkirinê re kifşkirin, wê bibe. Pêşketina nivîsandinê, her wusa bi hizirkirinê re kifşkirina di jîyanê de jî ya. Mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de jî werêne ser ziman.

Serdemîn sûmerîyan, di vê çerçoveyê de bi dest nivîsandinê kirina. Her wusa, wê bi demê re pirtûkxaneyan tişî nivîsandinên ku kirina bikin. Wê ew nivîsên wan û ankû vegotinên ku wan qaydkirina ku tê vegotin, wê êdî hizirna bidina mirovan. Mirov, wê li ser wan re li jîyane xwe binerê. Li hewirdora xwe binerê. Ev nerîna bi aqil a.

Her wusa, serdemên sûmerîyan, ji xwe weke serdemna şariştanî na. Serdemên şariştanî, ji xwe aqilê pêşketî ku dide kifşkirin ê felsefê û hwd, aqilê van deman a. Bi demê re wê aqilê şariştanî felsefe pêş bikeve.

Têgîna hizirkirinê, wê êdî bi demê re hin bi hin bi aqil werêne ser ziman. Serdemên hizirkirinê, heta ku têne serdemên ku tên gotin ku demên mitolojiyê na, wê pêvajoyna giring ên dîrokî bi buhurênin. Demên toteman hin bi hin di buhurin. Anamism û totemism, wê hin bi hin bi aqil re cih bi guharêne. Di aslê xwe de, têgînên van demên weke anamismê û totemismê jî, em divê ku di çerçoveya aqil de werênina ser ziman. Lê ev dem piştî ku cihê xwe ji serdemên mitolojiyê re di berdê, wê êdî demek nû bide destpêkirin. Her wusa, aqilê mitolojikî, aqilê pêşî ê buhurîna li dema aqil û piştre li dema felsefeyê ya. Lê dema ku em em li dema mitolojiyê dinerin jî, em dibînin ku wê têginên dema buhurî, ku ji nû ve hatina şîrovekirin, wê di wê de bijî, têgînên wê demê ên ku pêş dikevin dijîn û her wusa temenê destpêka dema felsefeyê di wê temenê de di wê de tê avêtin. Yanî, di zikhevdû de wê pirr-dem bi hevdû re pêş bikevin.

Serdema mitolojiyê, wê weke serdemeka ku êdî aqil bi têgînên xwe yên piretîkî ku êdî hin bi hin bi pergal pêş dikeve bê. Pergalîya têgînên mitolojikî, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku pêş dikeve. Vaca, di nava rengê vegotinên mîtolojikî de, wê hîmê xwe ji rewş û bûyînên di nava xwezayê de ku dibin, wê ji wan bigrê. Her wusa, hemû rewşên ku dibin û dihên dîtin, hewldana bi watekirin û ankû şîrovekirina wan bikin. Pirr bi **fîşalî** hanîna ser ziman, vê rastiyê nadê guharandin. Di aslê xwe de, pirr bi fîşalî hanîna ser ziman, wê temenê mazin hizirîna wê jî ji aliyekî ve bide avêtin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman.Bi **fîşalî** hanîna ser ziman, wê teybetîya zimanê hanîna ser ziman a vê demê bê. Ev rengê bi fîşalî hanîna ser ziman, wê piştre bê temenê lêpirsîn û dahûrkirina ´rastî´ û hizrên wê demê ku hatina hanîn li ser

ziman. Ev jî, wê dema felsefeyê ya piştre ku tê wê bibe. Wê bi serdema felsefeyê re wê êdî lêpirsîna têgînan wê destpê bike. Ev jî, wê bi xwezayî, temenê pêşketina têgîna vacê ya bi aqilî bê. Her wusa, hewldana ´rast´ û li gorî rastiya wê ku bi awayekî maqûl hanîna ser ziman, wê di vê çerçoveyê de wê temenê bi afirêne.

Gotina ku wê piştre felsefe ´rastîyan´ bi cidîyetekê hilde li dest û şîrove bike jî, wê di vê temenê de werê ser ziman. Felsefe, wê hertiştê li jîyanê hewl bide ku bi aqil dahûrî hilde li dest û bi hûrgilên wê re hertiştî fahm bike. Di vê çerçoveyê de felsefe, weke hewldana ´fahmkirina rastîyan´ jî dihê hanîn li ser ziman.

Li vir, pirsa ku dihê pirsîn jî, ew a ku ´rastî´ çi ya? Û ankû ´çi rast a´? Ev pirs, wê tenê pirsna li ser rastiyê bin.

Dema ku dem tê serdemên kevnera, wê êdî serdemek aqil ya hemdem bi xwe re destpê bike. Wê serdemeka aqil ya ku êdî aqil di xwe de û di wê de bi fahm bûya wê destpê bike. Pêvajoyên ku pêşketina aqil a bi demê re buhurandina, aqil hem di xwe de û hem jî bi demê re bi têgihiştin û fahm kirîya. Aqil, bi sedsalan xweza û hewirdor xwand û jê girt. Her wusa bi wê re jî, temenê hizirkirina xwe ya bi aqilî û zanînî pêşxist.

Serdemên kevnera, wê weke serdemna ku êdî di wan de felsefeya bi zane dihê ser ziman bê. Her wusa, wê bandûra vê rengê pêşketinê êdî di demek kort de li hemû rengên pêşketinê ên di jîyanê de li wan bibe. Heta ku ol bixwe jî, wê biafirin. Rengê olan û navaroka wan û şîroveyên wan ên ku pêş dixin, wê bi pergalî li gorî wê çerçoveyê û têgîn û zanîna navaroka aqil bin.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bêje ku êdî serdemek bi pergalî û bi aqilî destpê dike. Wê piştî serdemên kevnera, serdemên navîn wê werin. Di van serdeman de fêrbûna ku bi sedsalan dibê, wê temenê pêşketina aqilê hemdem ê bi felsefeyî ku êdî zanistê pêş dixe bike.. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Dema ku em li demên buhurî dinerin ên weke kevnera, em dibînin ku Medîya xwediyê pirtûkxaneyên ku tişî pirtûk in. Her wusa, zaneyên weke Zerdeşt û hwd ku dihên û aqilê xwe dihênina ser ziman, wê temenê pêşketina ´civatên hemdem´ pêş bixin. Zerdeşt, weke zaneyekî û filosofekî, hê jî bi tamî mihtaacê rast fahmkirinê ya.

Piştî wî re li ber bahre reş, ji Thales, Aristo û platon bigrê wê gelek filosofên ku hizrên mazin ên felsefîkî dihênin ser ziman wê derkevin. Hizrên ku wan hanîna ser ziman, hizrên felsefeyî na û felsefeyê di jîyanê

d hin bi hin bi rêxistin dike. Piştî wan re, li mesopotamya zaneyên weke Manî û hwd wê derkevin. Ew jî, wê biaqilê xwe re temenekî nû ê li gorî demê bidina avêtin. Li ser wê temenê, filosofên têgîna felsefeya hemdem ên weke Sipînoza, Kopernîk, Gelileo, Newton, Descartes û hwd, wê werin. Hizrên ku ev dihênin ser ziman, wê di nava felsefeyê de temenê felsefeya zanistê bide avêtin. Her wusa, li gorî wê jî, zêhnekî pêşketî didênin li holê. Her wusa, felsefeya zanistê, wê êdî bi têgînên xwe yên demî ên weke ´rasyonalismê´, ´estetism´, ´empirismê´, ´vacê´ û hwd, wê pêşketina xwe ya demê bide çêkirin. Li vir, bi gotinekê jî bê, divê ku em bibêjin ku weke felsefe, kifşkirin û hanîna ser ziman a vacê, wê di vê çerçoveyê de felsefeyê bi awayekî zanistî pêş de bibêt. Serdemên kevnera, serdemên navîn û hwd, heta ku dem tê dema ronasansê wê bi nîqaşên felsefîkî ku di wan de li têgîna vacê dihê lêgerîn û di vê çerçoveyê de têgîn û felsefê dihên lêpirsîn wê pêş bikevin. Dema ronasansê, piştî ku hat û bû, wê hemû fêr, cerb û azmûnên demên buhurî ên aqil û dîroka aqil bike temenê xwe de û pêş bikeve. Wê ronasans, wê fêreka dîrokî bê, bo mirovatiyê hemûyî.

Serdemên felsefeyê ên nû, wê bi zanistê re pêşketina xwe bi dîrokê re bidomênin. Her wusa, di vê çerçoveyê de pêşketinên dîrokî wê bi aqil derkevina li holê. Aqil, her ku baş dihê xwandin û ankû fahmkirin, dibê alikarî ji mirov re di pêşketina mirov de. Lê ku fahm û têgihiştin nebê, wê tenê weke barekî li ser mil bê. Yan, wê mirov fahm bike û bi fahmkirinê wê barê xwe sivik bike. Û yan jî, wê di bin giraniya wê de bitafisê. Dîroka aqil, her wusa ev yak piştrast kirîya, aqil bi fahmkirin û têgînê mazin dibe. Her wusa, dema ku dem tên van serdemên ên weke dema ronasansê wê û hwd, wê ev yek werê dîtin û fahm kirin. Mirovê bi fahm, mirovê ku xwediyê pêşarojê ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov giringîya aqil werêne ser ziman. Aqilê, demê divê ku mirov wê fahm bike. Aqilê ku di wê demê de ku mirov bide jîyandin jî, wê ew bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê her wusa fahm bike ku rengê aqilê serdema zanist û ankû felsefeya zanistî, wê bi zanîn û zêhnê re bê. Ev jî, wê bi têgînên demî ên weke ´rasyonalismê´, ´estetism´, ´empirismê´, ´vacê´ û hwd re, xwe bide dîyarkirin. Emê hinekî din jî, hewl bidin ku bi rengê pêşketina aqil re van deman fahm bikin.

Dema ku em bahse aqil pêşketina dikin, em bahse dîrokeka demdirêj dikin. Her wusa, weke serdemên felsefeyê ku li ber diclê û firatê, mirov dikarê bigihêne serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan. Ev serdemên ku li ber diclê û firatê jîyane ên kurdistanê, serdemna hemdem ku bi aqilê têgîhiştî

ê felsefîkî pêş dikevin in. Minaqe rengê pêşketina aqilê van deman, mirov dikarê bi mirovên weke Mîtra û Zerdeşt re fahm bike. Her wusa, Mîtra, dema ku mirov aqilê wî û pergale wî ya têgîhiştinê fahm dike, mirov vê rastiyê bia wayekî vekirî dibînê. Piştî Mîtra re wê Zerdeşt were. Zerdeşt, dema ku ´avêsta´ ya xwe ku dinivîsêne û pê de, wê pêvajoyaka din ya aqilî bi têgîna jîyane civatî ku bi felsefê xwe pêş dixe, wê werêne ser ziman. Bo vê yekê, avêstaya Zerdeşt, mirov dikarê, weke binetereke, hîmî a pêşketina civatên hemdem jî werêne ser ziman.

Ji xwe, wê piştî Zerdeşt re, wê ´civatên avêstayî´ wê biafirin. Civatên avêstayî, ên ku li gorî wê rengê jîyane ku di wê de Zerdeşt ku hanîya ser ziman ku dijîn in. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wan bike. Di vê çerçoveyê de, li ber diclê wê pêvajoyaka giring a aqilî pêş bikeve. Piştî Mîtra re Zerdeşt, weke pêvajoyaka nû ya nûjen ku bi felsefeyê pêş dikeve mirov dikarê werêne ser ziman. Di aslê xwe de Zerdeşt, weke şîroveyeka nû ya Mîtra, Melekê Tawis û hwd a. Temenê têgîna Zerdeşt, wê xwûdayê melekê Tawis yazdan bê. Ev jî, dide nîşandin ku di rengekî de di dewama wan de xwe dihêne ser ziman. Mîtra di serdema Mîtannîyan de, bi hizrên xwe yên ku hanîna ser ziman, temenekî têgînî ê felsefîkî ê pêşketî wê bi afirêne. Li ser wê temenê Mîtra re, wê pêşketinên li ber diclê û firatê û heta ku li herêmên anatolîa û hwd, wê bandûra hizrên Mîtra xwe bide li der. Hizrên Mîtra wê li van herêmên Belav bibin. Piştre jî, li giştîya herêmên asya wê belav bibin. Ev jî, wê bi têgînî hem felsefeyên nû ên bi têgîna nûjen û felsefîkî bide afirandin û hem jî wê ji aliyê bawerîyî û olî û hwd ve jî, wê bi heman rengî afirandinên nû ên demî bi xwe re bide afirandin. Felsefe çawa weke bawerîyekê kar dike, emê bi Mîtra re bibînin. Lê bi Zerdeşt re emê bibînin ku çawa jîyan li gorî felsefeya aqil û hemdem bi civatîtîya wê re dihê adilandin. Serdema Zerdeşt û demên piştî ên di dewama wê dema wî de ku tên, vê vê yekê bi awayekî vekirî bidina rayîxistin li berçav. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman, ku di dewama hizrên Mîtra û Zerdeşt de, piştî wan, em divê ku Manî û hizrên wî fahm bikin û werênina ser ziman. Manî, wê li gorî dema xwe, wan ji nû ve şîrove bike û werêne ser ziman. Manî, nûjeniyekê bi demê re wê bike ku bi wan re û bi hizrên wan re bide çêkirin. Di vê çerçoveyê de hizrên Manî giring in ku mirov wan werêne ser ziman.

Hizrên Manî, divê ku mirov wan werêne ser ziman, ku wê weke pêvajoyaka nû ya bi aqil jî bin. Her wusa, aqilê van serdeman, wê têghiştî

bê. Di nava wê aqilê de zanîn bi hiş pêşketîya. Hizrên Manî, wê vê yekê rayixina li berçav.

Têgînên Manî ên ku wî hanîna ser ziman, wê di serdema wî de, di çerçoveyeka pergalî a hizrî û civatî de xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, wê têgihiştina pêşketî a di nava hizrên Manî de wê were dîtin. Bo vê yekê, zaneyên demê û filosofên ku derdikevin, wê qasta Manî û mirovên li dora wî bikin. Her wusa, Manî bi hizrên ku hanîna ser ziman, wê dema xwe û hinekî piştî wê re bide dîyarkirin. Zane û filosofên weke Sipînoza û hwd, wê bandûraka xort ya hizrên Manî û hwd li ser wî hebin.

Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku Manî, hizrên xwe pirr zêde hanîna ser ziman. Manî, heta ku ji wî hatîya wî hizrên xwe nivîsandina. Mirov ji zêde nivîsandina wî fahm dike ku wî giringî daye aqil û nivîsandina wê.

Serdemên kevnera ên ku pêş dikevin, wê bandûra Mîtra û Zerdeşt û pergale wan ya hizri pirr zêde lê hebe. Her wusa, li ber bahre reş zaneyên weke Thales, Platon, Aristoteles û hwd, derdikevin. Bandûra, li ser van û ên weke wan jî, mirov dibînê. Têgînên ku Platon têgînê ser ziman, her wusa, wê wî nêzî Zerdeşt bike. Weke ku wî Zerdeşt û hizrên wî pirr xweşik û baş xwandîya. Mirov vê yekê ji hizrên wî ên ku hanîna ser ziman fahm bike. Kirpandina di nava gîyanê û laş de ku Platon bi hizrên xwe re kirîya, wê ji ya dûalistekî Zerdeştî ne dûr bê.

Hizrên felsefîkî ên serdema kevnera, dema ku mirov li navaroka wan dihizirê, mirov wan bi awayekî pêşketî dibînê. Her wusa, mirov divê ku werêne ser ziman ku weke ku li ser temenekî mazin pêşketîya ya. Ya rastî jî, rastî wusa ya. Her wusa, di zik-anatolîa de Mîtannîyan, hizrên ku hanîna ser ziman û hwd, wê pêşketinên li anatolîa û hwd jî bide dîyarkirin. Di serdemên Hîttîtîyan de, wê qasta wan ya li zanîna hûrî û mîtannîyan pirr zêde hebe. Ev rewş, wê piştre jî bidomê. Piştre jî, li anatolîa, piştî desthilatdarîya hittîtîyan diçêt, wê desthilatdarîyên ên weke lîdya, fenîke, Frîgya û hwd wê derkevina li holê. Ev jî, wê di wê çerçoveyê de pêşketinekê bi xwe re bidina çêkirin. Fenekeyî, wê ji ber diclê û firatê, ji hûrî û mîtannîyan, wê nivîsandinê barî anatolîa bikin û pêş bixin. Her wusa, nivîsandina ku fenikeyîyan pêşxistî, wê piştre bê temenek ji pêşketina herêmên berbahre reş re jî.

Zaneyên weke Thales, Platon, Aristoteles, Heredot û hwd, wê gerên mazin li van herêman bikin. Berî wan, hemerosê kor, gerên mazin li van herêman kirina, Piştre jî, berhemên xwe yên weke ´Îliyada´ û ´ Odiseya´ dinivîsêne ku wê piştre bine temenê pêşketina serdema kevnera û hwd jî.

Weke berhemên nivîskî, wê bandûra wan zêdetir bibe. Her wusa, li ser wan re çend filosofên ku derdikevin jî, wê şîroveyên xwe li ser wan re pêş bixin. Berhêmên Homeros, weke ku çawa avêstaya Zerdeşt, di pêşketina felsefe û civatîtîya avêstayî a li herêmê re rol û weyneka mazin leyist, wê ew jî di pêşketina serdema kevnera a ber bahre reş û piştre di pêşketina mitolojikîya ewropî de heman rol û weynê bileyizê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ev serdemên kevnera ên li berdiclê û firatê, di wan de pirr zêde nivîsandin hatîya kirin. Welatê Medîya,, wê pirtûkxaneyên wê tişî nivîsandinên ku hatina kirin bin. Avêsta´ya ku Zerdeşt nivîsandîya, tê gotin ku li ser şazdeh (16) hezar çermê sawêl hatîya nivîsandin. Hinek jî, dibêjin ku ev hijmar zêdetir a. Ev awayê nivîsandina avêsta ku bahse wê dihê kirin, di derbarê nivîsandina di wê demê de li herêmê jî, têgînekê dide me. Her wusa, dide nîşandin ku giringî dayîna li nivîsandînê pirr zêde heya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku li ber diclê û firatê, têgîna nivîsandinê heya. Lê çendî ku bi heman rengî li vê herêmê zêde nivîsandîn heya û pêşketî jî ya, wê zêde berhemên nivîskî ji demê ne buhûrina li demê. Sedema wê jî, sefer û şer û talanên ku li herêmê hatina kirin û meşandin in. Serborîya Avêsta, tenê bi serê xwe, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de hizrekê didêt me. Avêsta, di dema sefera îskenderê zûrqerneyn (paşnavê ´zûrqerneyn´, kurdan piştî wê sefera wî ya li kurdistanê û kirinên wî yên xadar li wî kirin. Wateya zûrqerneyn´tiyê jî di kurdî de tê wateya ´qernê ku jê îbret were girtin´ a.) de, hat tûnakirin. Piştre, ku bandûra seferê ji herêmê çû û pê de, bawermendên wî hewldana ku wê carek din berhev bikin. Lê piştre, di dema hatina îslamê de, wê carek din sefer li herêmê werina kirin û wê çanda zerdeştititiyê jî di nav de hemû rengên din ên pêşketîna bi wêjeya wan ya nivîskî re wê werina ji holê rakirin û tûna kirin. Ev jî, wê care duyemin ku avêsta were tûnakirin.

Pêşketina li ber diclê û firatê, weke ku me di destpêka vê beşa nivîsê de jî hanî ser ziman, wê bi mirovên weke Thales, heredeot û hwd, re werê barkiirn li ber bahre reş. Piştre jî, bi pêşketina ´serdema kevnera´ û hwd re, wê dema felsefeyê li wê herêmê pêş bikeve. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman, felsefe, wê weke aqilê têgihiştî wê êdî pêş bikeve. Piştî serdema kevnera re, serdemên navîn û hwd ku tên, wê bi wan re ev yek, were dîtin. Ev serdemên ku temenê wan li ser ´fêrbûnê´ ya na, wê hewl bidin ku bi wê têgîna fêrbûnê, navaroka wê aqilê têgihiştî

fahm bikin û bixwênin. Ev jî, wê aqil, gaveka din bi pêşketina wê re pêşdetir bibe.

Fêrbûna ku di serdemên navên de bû, wê temenê hizirkirina piştre ku bi dema jinûvebûnê re ku dibê re bê. Ev jî, wê êdî bi xwe re pêşketina aqilê bizane werêne. Dema ku em bahse aqilê zane dikin, em li vir, di farqê de na ku em bahse pêşketineka zêhnî û jîrî ya bi demê re jî dikin. Ev jî, wê hin bi hin xwe bide dîyarkirin. Di serdemên piştre ên nû de, wê êdî bi têgîna zanistê re ev werê pêşxistin. Zêhnê mirov ê ku pêş dikeve, wê êdî rêya têgîna aqil werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de temenê fahmkirina aqil, bidestxistin û afirandina wê, werêne ser ziman. Di serdemên jinûvebûnê de li kurdistanê bi seydeyê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ahmedê Xanî û hwd re wê pêşketina demê bibe.. Weke van zaneyên ku hena wê bibin. Zaneyên kurd, ên weke Ebûlîzê Cizîrî jî, wê li ser geometri û werzeyê xwediyê têgîneka ku dihêne ser ziman. Bi aqilê ´teknîkî´, dihizirê û dihênê ser ziman. Êlî Herîrî, tiştekî pirr baş bi pêşketina xwe re dide nîşandin. Vê jî, mirov divê ku bi têgîne zêhnê û jîrê re werêne ser ziman. Têgîna şîrovekirin û xweşikaxiftinê, wê bi wî re pirr zêde pêş bikeve. Dema ku bahse êlî Herîrî dihê kirin, ew pêşketina zimanê wî de û di hanîna xwe ya ser ziman de ku çendî bi hûner a, ew di cih de dihê berbîra mirov. Ev aliyê Êlî Herîrî, wê di derbarê zêhnê wî yê pêşketî de têgînekê bide me. Her wusa, di derbarê pêşketina bi rêya zêhnê re jî, wê têgînekê bide me.

Aqil meşandin, weke têgîneka zêhnî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa bi wê re di axiftinê de li dûv hevdû rêzkirina gotinan û bi hevdû re di ahengekê de hanîna wan ya li ser ziman jî, bi heman rengî mirov divê ku bi têgîna xwe ya zêhnî re werêne ser ziman. Dema ku mirov bahse xweşik axiftinê dike, her wusa mirov bahse rêzkirina gotina li hevdû û di ahengekê de bi hevdû re dike. Di vê çerçoveyê de têgîna zêhnê, li ser têgîna rêzîna ziman re xwediyê awayekî têgîhiştinî jî ya.

Çendî ku ziman, pêşket, mirov êdî wê rêzîna gotina li hevdû baştir dike. Her wusa, serwerîya mirov a li ziman jî, bi pêşketina aqilê mirov ve girêdayî ya. Li vir, dema ku mirov vê yekê werêne ser ziman, dema ku bi zimên re serdestî û serwerîya mirov li gotinê dibê, mirov di kîjan awayê de ku bi wê re pêwîstî bi têkilî danîna gotinê re biafirê, mirov wê bike.

Di vê çerçoveyê de li ser zêhnê û têgîna wê re biaqil mirov divê ku hinekî din jî bi aqilî pêde herê. Aqil, li vir, mirov bi zêhnê wê re pêşketina wê di çerçoveya bikarhanîna wê de kifş dike. Aqil, xwediyê zêhnê xwe yê ku li ser serwerîya mirov ya zimên re ku xwe dide li der a.

Têgîna hizirkirinê, wê her wusa di vê çerçoveyê de hizrekê bide me. Hizirkirin, têgîneka ku em dikarin biaqilî werênina ser ziman a. Minaq, di nava civatên kurdan de dihat gotin ku bi ”bihizira û piştre bibêje.” Li vir, têgîna hizirkirinê û bêjînê, bi hevdû re dema ku mirov wê dihilde li dest, di vê çerçoveyê de hanîna ser ziman, weke têgîna nirxî derdikeve li ber me. Di vê nirxîtîya wê de zêhn xwe dide li der.

Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê gotinên xwe zêdetir bike. Minaq, ”bizane û piştre pê bawer ba.” Li vir, jî, bi heman rengê, mirov têgînê dihêne ser ziman. Li vir, dema ku mirov bahse hizrê dihê dike, bi hişbûna di derbarê de re mirov êdî fahm dike. Bi wê re êdî yeqînîyek bi wê re diafirê. Ev jî, weke ji wê bi fahmbûnê were bahs kirin. Yanî, li vir, gotina ..pê bawer ba.”, weke têgîneka ku temenê wê li ser yeqînî, hişbûn û fahmbûnê ya. Di vê çerçoveyê de, mirov divê ku hinekî din jî pêde herê. Li vir, têgîna zêhnê, li ser aqil re di vê çerçoveyê de bi fahmkirinê re xwe dide dîyarkirin.

Li vir, dema ku em bahse zêhnê bikin, divê ku mirov ji vê aliyê ve jî lê binerê. Her wusa, bi zêhnê re gotin, ´serbixwebûn´ekê bi xwe re distêne. Minaq, dema ku ´”dayikê ji zaroka xwe re got, ´şekir di dolabê de ya´”, hingî, çi dibê birhana wê ku şekir di dolabê de ya. Dema ku zaro, çû li dolabê nerî û di wê de şekir nedî, wê êdî bihizirê ku dayika wê ji wê re ´rast´ ne gotîya. Di vê çerçoveyê de wê aqil bimeşêne. Lê dibê ku dayikê, şekir xistibê dolabê û piştre karekî wê derketibê û çûbûbê devereka din bi karê ve. Hingî jî, di wê dema ku ew li wir ne amede ya û zaro jî ne li vir a, yekî din weke kesê sêyemin hatîya ew şekir derxistîya û birîya û xwarîya. Hingî, li vir, dema ku zarokê, li dolabê nerî û şekir nedî, ku dihizirê dayika wê ji wê re ´rast´ negotîya, weke gotinaka ji wê rewşa danîna şekir li dolabê a ji aliyê dayika wê ve serbixwe pêktê. Ev rewş, weke aliyekî ku gotina hizirkirinê, weke hevok, bi serê xwe werêne li holê. Li vir, li ser vê têgînê ve mirov dikarê ji aliyê gotinê ve jî nêzîkî mijarê bibe. Dema ku gotina pêşî ku dayikê got ´şekir di dolabê de ya´ jî, weke gotinaka serbixwe dimêne. Yanî gotina dûyemin ya bi nerîma zaro re ku dihê ser ziman, a bi nerîna wê re ku tê ser ziman ku ´şekir ne di dolabê de ya´ jî, ser bixwe dihê ser ziman. Ji vê aliyê ve jî, mirov dikarê lê binerê û bihizirê, ku dema dayikê got ´şekir di dolabê de ya´, ku zaroyê çûû û nerî, dikarî şekir jî di wê de bibinê. Hingî, piştî şekir dît û piştre, wê bibêje ´şekir di dolabê de ya´. Lê ev gotina zaro a ´şekir di dolabê de ya´jî, wê ji ya dayikê a ´şekir di dolabê de ya´, wê serbixwe bê. Ev wê bi rewşê re bê. Bi hevokê re, heta ku zaro, ´rastîya wê gotinê´ fahm bike, ew

dikarê weke ya ne rast jî hebe. Li vir, bi nirxî, kifşkirina ´ya rast´ û ´ya xelat´, wê weke du hevokên ku li dijî nirxîtîya hevdû bin. Li ser vê yekê re, dema ku bi nirxî, daraza gotinê hat kifşkiirn, wê daraza gotina din jî, li gorî wê vajî wê û ankû weke wê daraza nirxî bistêne. Ev jî, têgîna zêhnê, dide nîşandina wele têgîneka zanînî a hişî. Li vir, her wusa, bi xweşik axiftina Êlî Herîrî re dema ku em hizirîn, me hanî ser ziman ku ”Êlî herîrî, xweşik diaxivê.” Gotina xweşik diaxivê, weke gotinaka nirxî ya bi serê xwe ya. Li gorî vê jî, heta Êlî Herîrî xweşik diaxivê, wê nexweşik neaxivê.

Li vir, bo fahmkirina vê rewşa zêhnî, mirov dikarê dîsa ji zarokê vê mînaqê bide. Li vir, nava axiftinê de ´têgîna rast´ û ´têgîna xelat´, dema ku gotin û ankû hevok hat ser ziman, bi çêbûna wê re, wê nirxîtîya gotinê were kirin. Ev jî, ji aliyekî ve têgîneka ku di derbarê rewşê de ku çend ku bi darazî jî bê, wê hewldana fahmkirinê bide dîyarkirin. Biqasî, rêzkirina bêjeyan, bi heman rengî wilqasî jî, piştî rêzkiirnê û avakirina hevokê re têgîna ´rast´ û ya ´xelat´ û hwd, wê di vê warê de du aliyên ku çaprazên hevdû bin. Lê li vir, rêzkirina gotinan, wê çawa bê, ew jî li gorî rewşê ya. Yanî li vir, têgîneka ku wê dide kirin heya. Bi gotinaka din, aqilekî ku wê dide kirin heya.

Di vê çerçoveyê de fahmkirina wê, wê rengê wê yê ku bi fahmkirinê bide dîyarkirin. Her wusa, gotina ´ezê biçima malê´ û ya ´ew çûya malê´, weke du hevokên ku bi demî ji hevdû çûda na. Lê hevoka duyemin, weke têgîneka ku dikarê weke bersiveka ku piştî ya yekemin re jî bi xwe re werêne ser ziman, bi xwe re dide dîyarkirin. Ev jî, weke ku wê dike têgîneka nirxî jî. Li vir, divê ku mirov vê yekê ji vê gav biavêje û bibêje ku zanîna bikarhanînê, zanîna têgînê û ankû aqil û zanîna rêzkirinê û ankû rastkirinê û hwd bi hevdû ve girêdayî na.

Weke mirovên mazin, zarok jî, di nava axiftinan de û ankû li axiftinan guhdarkirina wan, wan dikişêne nava dûnya zêhnî. Her wusa, bi gotinên ku hatina ser ziman re, tiştên hatina ser ziman bi ´rastî´ û ´ xelatîya´ wê re di mejiyê xwe de kifş dikin. Her wusa gûharîna nirx û daraz û bawerîyan, cûdabûna xwestekan û mêl gûharîna mirov a bi wê re, kifşkirina hêstan û çêbûna hêstiyarîyan û hwd, wê bên kifşkirin.

Her wusa, di nava malbatekê bi xwe de jî dema ku têgînên zêhnî ku dihên bi hevdû re parvekirin, bi rehetî hêstîyarî ku dihên ser ziman û bi hevdû re dihên parvekirin, di wê rewşê de pêşketina zêhnî zêdetir xwe dide li der. Her wusa, li vir, li ser temenekî ku têkiliya zêhnî, aqilî û hêstiyarî bi hevdû re hatîya danîn û parvekirina bi axiftinî ku dihê kirin,

weke temenekî pêşketina zêhnî jî ya. Her wusa, ev rewş jî bi aqil û pêşketina aqil ve girêdayî na. Lê bi giştî û teybetî, bi têgîn û pêşketina ziman û serwerî û serdestîya li ziman ve girêdayî na. Li vir, divê ku mirov li vir bigiringî carek din li vir balê bikişêne li ser ziman. Me li jor, bahse ´xweşik axitina´ Êlî Herîrî kir. Her wusa li vir, em dikarin çend wateyên sereke ji têgîna xweşik axiftinê bi zêhnê xwe re derxin. Yek, ew a ku bi serwerîya li ziman a. Serwerîya li ziman, her wusa, bi pêşketina têgîna wê ya bi mirov re ya. Mirov bi hiş bûya. Di dema ku gotinên xwe bi hevokî rêz dike, wan di ahengekê de bi hevdû re rêz dike. Di dema axiftinê de jî, ku diaxivê, di dengdayîna gotinê de, bi zane ya. Wê gotinê çawa bike ku di mejî de cih bigrê, di wê çerçoveyê de dengê ku derdixe, bi bandûr a. Gelek caran, me kurdan ji mazinên xwe bihstîya ku gotina ku ”me li civatê li filankes hisand û hingî xweşik axift, gotinên wî di mejîyan xwe de cihê xwe girtin.” Li vir, di hevokê de dawîya gotinê ya bi rengê ”...gotinên wî di mejîyan de cihê xwe girtin”, li ser temenê xweşikaxiftinê û ankû li ser destpêka hevok a birengê me li civatê li filankes hisand û hingî xweşik axift,..”, dihê bicih kirin. Ev, li vir, dema ku mirov li zêhnê hevokê dinerin, em vê rastîyê bi wê re fahm dikin ku hevok, bi têgîna xwe ya ku mejî de maya ya mayinda bûya. Li vir, ya ku bi hişî balê dihisêne li ser xwe evder a. Zêhnê mirov, di kifşkirina rastiyê de bi hiş tevdigerihê. Li vir, ji vê gotinê ya weke ´rastî´ ku ji gotinê dihên fahmkirin, têgînên ´xweşik axiftinê´, û piştre ´dimejî de mayindabûna wê´ ya. Li vir, her wusa dikarin, hevoka xwe divê temenê de jî werênina ser ziman. ”Êlî Herîrî, bi xweşik axiftina xwe ya ku dikir re xwe di mejîyan de da bicih kir.” Li vir, dema ku em dahûrîya vê hevokê bi zêhnê xwe re dikin. Her wusa weke kirdeya aqilî Êlî Herîrî ya. Bi wê re jî, têgîna ´xweşik axiftinê´ ya. Her wusa di dawiyê de jî ya ”.. xwe dimejîyan de bicih kir.” dihê kifşkirin. Li vir, aliyê kifşkirinê, weke têgînekê, di meji de bicihkirinê, weke têgîneka ku dikarê ´rast´ jî û ´xelat´ jî bê nirxandin a. Ev, wê bi têgîna nirxîna hevokê re wê ku li gorî rewşê dibe re wê were kifşkirin. Di dewama wê gotinê de, mirov dikarê vê yekê jî, her wusa werêne ser ziman ku weke pirsekê mirov bike. ”Çi xwe di mejî de bi cih kir?” Li vir, hevoka li rex wê ku mirov bi teybetî werêne ser ziman weke bersivê jî bê, ”xweşik axiftinê, xwe di mejî de bi cih kir” a. Li vir, têgîna xweşik axiftinê, pirr razber a. Li şûna wê, hevoka ´Êlî herîrî, xwe di meji de bicih kir” mirov dikarê werêne ser ziman. Di nava hevokê de têgîna ´Êlî herîrî´, di mejî de xwediyê venasînekê ya.

Li vir, dema ku mirov li rewşê dihizirê, mirov têgîna zêhnê kifş dike. Zêhn, temenê wê bi gotina ´rasyonalismê´ re ku bi awayekî rêk û pêk meşandina aqil di çerçoveyek vacî de ku werê kirin dide dîyarkirin. Her wusa, li vir, dema ku mirov hebûna zêhnê, li berçav dike ku fahm bike, têgîna rasyonalîsmê û vacê bi hevdû re di temenê wê de na. Me li jor, mijara vacê jî û ya rasyonalîsmê jî, hinekî hanîbû ser ziman. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov di çerçoveya fahmkirina zêhnê de hewl bide kûr herê, bi awayekî vekirî vac bi rasyonalîteya xwe ya hîmî xwe dide dîyarkirin. Vac, weke rasyonalîsmê, dibê kirdeya têgînî ya zêhnê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku vac, dema ku me li jor jî hanî ser ziman, weke têgînaka navaroka wê jî, me bal kişand li ser rasyonalîsmê. Lê li vir, dema ku mirov rasyonalîsmê, weke têgînaka navaroka têgîna zêhnê a hîmê hilde li dest, divê ku mirov vacê di rex wê de jî bicih bike û werêne ser ziman. Rasyonalîsm, çendî ku xwediyê vacîya têgînî ya, bi heman rengî vac jî di nirxandin û hewldana fahmkirina xwe de rasyonalîteyekê bi xwe re di temenê xwe de dihawêne. Yanî, hevdû ji hevdû re weke ku çawa ku weke kirde pênase dikin, bi heman rengî weke têgînna felsefîkî xwediyê afirandina zêhnî ya jîrî na.

Dema ku mirov bi dîrokê re hewl dide ku aqil û dîroka wê bi pêşketina wê re werêne ser ziman, di vê çerçoveyê de mirov aqil bi cîdîyetekê dihêne ser ziman. Di temenê vê gotina ´cîdîyetê´ de, têgîna rasyonal û vac, bi hevdû re hena. Ev jî, her wusa, têgînê, li ser esasê wê bi me didina têgihiştin.

Vac, di çerçoveya rasyonalîteyeka jîyanî de ku weke tişta ku li jîyanê heyî, bi çerçoveyeka ´formel´ dike ku werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de vac, dema ku mirov wê werêne ser ziman, mirov çawa bi wê re xwediyê nêzîkatîyê ya, bi salixkirinê re divê ku mirov werêne ser ziman. Lê aqil, hertimî afirandinê bi xwe re çê dike. Di vê çerçoveyê de, hertimî jî, nêzîkatî, bi wê re dihê şîrovekirin.

Li vir, dema ku em weke têgîn rasyonalîsmê, hildina li berçav, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku çerçoveya têgînî ya vacê, bi rêgezî li gorî şert û mercên jîyanê xwe diadilêne. Ev jî, bi aqil dibê. Her wusa, di serdemên piştî demên jinûvebûnê de ku feslefeya dîyardetîyê û her wusa ya îdealismê pêşket û pê de, êdî di vê çerçoveyê de bi hizirkirinê têgînên nû derketina li holê. Li vir, di aslê xwe de bi têgîna vacê û ya rasyonalîsmê, aqil xwe diafirêne. Her wusa, aqil, razberîyeka xwe ya ji jîyanê jî diafirêne. Em vê yekê jî divê ku li vir kifş bikin. Her wusa bi

hizirkirinê re pêşketina nivîsandin, bi roman, şano û hwd re, nîşanaka û birhana vê rastiyê na.

Aqil, wê di serdemên aqil ên nû de, di vê çerçoveyê de xwediyê pêvajoyna pêşketinê bê. Pêvajoyên dîrokî ên hizirkirinê, wê aqil bi demê re di çerçoveya ku di her pêvajoyê de bi hevgirtinekê re wê pêş dixin û li gorî demê ji nû ve diadilêne re pêşxistinê dike. Li vir, di aslê xwe de, her hevgirtin, wê weke çerçoveyeka di vê warê de ku mirov wê bi teybetî hilde li dest bê. Yanî, her hevgirtin, wê hinekî din, aqil, bi têgîna rasyonalîsmê û ya vacê re, hinekî din di nava wê de û biwê re wê weke têgîneka razber pêş bixe. Her wusa, serdemên piştî demên ji nûvebûnê, wê di wan de têgînên ´empirismê´ pêş bikevin. Hinekî jî, ew aqilê bi rasyonal û vac bûyî û bi xwe re bi têgînî û hebûnî ku razberîtî pêşxistî, wê temenê pêşketina wê bê. Her wusa, wê weke arda ku li ser wê re bimeşe û xwe pêş bixe bê. Li vir, êdî meşandina aqil, wê weke têgîneka zêhnî û jîrî bê. Li vir, êdî di vê çerçoveyê de mirov hebûna aqil fahm dike. Aqil, bi vê rengê pêşketina xwe ya bi demê û dîrokê re wê êdî weke têgînên rêzbar ên ku bi rasyonalî û vacî hatina adilandin re xwe bide domandin. Her wusa, li vir, divê ku mirov, hin bi hin bi pêşketina aqil a bi demê re pêşketina razberîya wê jî, divê ku mirov di vê çerçoveyê de hilde li dest. Razberîya aqil, wê weke pêvajoya wê ya pêşî têgîna mitolojikî û piştre felsefe bê. Piştre jî, zanist bê. Di serdemên felsefeya zanistê de, ji wê razberîya aqilî, bi ber jîyanê de, meşîn û ankû aqil meşandin, wê bişibihê, wê pêşketina aqil ya ji destpêka pêvajoyên dîrokê ên pêşketina ku bi ber aqilbûn û felsefebûnê ve ku diçê bê. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov bahse pêşketina zêhnê bike. Li vir, zêhn û pêşketina wê, weke têgînaka aqil ku li ser vê rengê pêşketina wê re xwe dide dîyarkirin a jî.

Pêvajoyên aqil, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wan hilde li dest. Her wusa, em dema ku bi felsefeya zanistê a hemdem de têgînê û zêhnê hildina li dest, divê çerçoveyê de wê hinek rastiyên pêşketina aqil ê bi dîrokê re jî bi xwe re werênina ser ziman. Zêhn û bi wê re jîr, wê her wusa, di vê çerçoveyê de ji razberîya aqil a ku afirîya bi ber jîyanê ve weke meşandina aqil û hizirkirinê bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aqil, giringîya wê ya li vir, bi pêvajoyên wê yên ku buhurîna re dihê ser ziman. Ew pêvajo, weke fêr, azmûn, cerb û her wusa dîyardetîtîya wê ya ku pêşxistina vacîtî û rasyonalîsme wê didina dîyarkirin, wê her wusa êdî di vê çerçoveyê de têgînên ku ji wê razberîyê bi ber jîyanê ve ku dikin

şenberîyê biafirênin bin. Zêhn jî, di vê çerçoveyê de wateyeka wê heya. Ew jî, her wusa bi wê çerçoveyê re tiştekî dihêne ser ziman. Bi têgînekê re û bi wê re kirina fahmkirina rewşênn jîyanî ên bi mirov û hwd re, divê çerçoveyê de wê aliyekî giring ê zêhnî û têgîna wê eleqeder dikin bin.

Sînorê fahmkirina mirov, hewldana gihîna zanînê, hanîna ser ziman a fêr, azmûn û cerb û hwd, wê alîyna ku mirov li vir mirov bike pêşbixin bin. Têgîna ´fahmkirina li ser aqil re´,, her wusa wê di warê wê razberîya aqil de hizrekê di serê mirov de bide çêkirin. Dema ku mirov bahse ´bi aqil fahmkirinê´, mirov bahse meşîna li ser aqil re dikin. Her wusa, di vê çerçoveyê re, gotina ”xwe gihandina aqil” jî, di vê çerçoveyê de gotinaka ku mirov divê ku werêne ser ziman a. Ev gotin û gelek gotinên din, ên weke wan, têgîneka razberî aqil di temenê xwe de dihasênin. Bi demê re aqilê metafizikê, bi têgînên weke kosmogonikî û kosmolojikî û hwd re, di vê çerçoveyê de hewldana xwe gihandina têgîn û ankû aqil gerdûnê salix dike.

Li vir, divê ku mirov vê jî di dawiyê de kifş bike ku aqilê me, bi pêvajoyên xwe yên ku buhurandina, aqilanîya xwe ya ku pêşxistîya, bi wê re bi demê û dîrokê re razberîya têgînî afirandîya. Her wusa, di vê çerçoveyê de, êdî bi aqil re xwe gihandina hertiştî, weke têgînekê bi xwe re afirandîya. Têgîna ´bi aqil xwe gihandina hertiştî´, weke têgîneka ku di vê çerçoveyê de pêşketîya û serdest dibê ya. Di serdemên buhurî de, di nava zanyar û filosofan de, yeqînî û bawerîya xwe ´bi aqil xwe gihandina hertiştî´, û ankû nekarîna xwe gihandina hertiştî bi aqil hebû. Zanyar û filosofê kurd Êlî Herîrî, di wê bawerîyê de bû ku mirov dikarî bi aqil xwe bigihanda hertiştî. Lê wî, dem weke fektorekê didît. Wî digot ´bi demê re mirov dikar xwe bigihêne hertiştî´. Wî, ev têgîn û aqilê xwe weke bersivekê ji mirovên zanyar û filosofên ên weke Îbnî Sîna, Îbnî Rûst re digot. Di wan serdeman de di vê çerçoveyê û rengê de wê gelek nîqaş bibin. Her wusa, ´destûra xwe gihandina hertiştî´ di destê kê de ya? Weke lêgerîneka li bersiva vê pirsê re bû.

Lê aqilê mirov, çendî ku pêş dikeve bi demê re, wê bersivên mirov ên demkî jî bi xwe re yan kevn bikira û bi guharanda. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov têgîna kevnbûn û guharandinê, bi felsefeyê re li ser temen û hîmê bi demê re pêşketina wê re dênin û werênina ser ziman. Ne bi demê re lê di hundurê demê de guharîn dibê.

Serdemên aqil ên serdemma felsefeya zanistê, divê çerçoveyê de aqil razber, weke têgîneka ku bi wê xwe gihandina zanîn û jîrê pêşxistîya. Aqilê mirov, di vê demê de gihiştîya ast û radayaka mazin a bilind. Her

wusa, pirr zêde hatîya ser ziman û naqşkirin. Li ser vê re, ev bûya. Lê serdemên ku buhurîna û her wusa ku dihên jîyîn, wê bi wê jîyandinê re wê wê aqilê razber hinekî din bi pêşde bibin. Em li vir, divê ku vê yekê werêne ser ziman ku î ro lêgerîna li zêhnê û jîrê, di vê çerçoveyê de ya. Her wusa, aqilê mirov wê çawa fahm bike? Wê çawa baştir fahm  bike? Weke pirsna ku di temenê hewldana xwe gihandina ya ´baştir´ a mejiyê mirov de na. Mejî, bi xêva mirovî a ku êdî girtinê di xwe de dike re û bi wê nivîsandina li jîyanê ku pêş dikeve re, salixkirinê dike di jîyanê de. Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de hertişt dikevê nava di çerçoveya aqil de. Weke ku me li jor jî hanî ser ziman, têkilîya xêvê û nivîsandinê ku di jîyanê de pêşketîya, wê di vê çerçoveyê de pirr dîrokî û afrîner bê. Her wusa, temenê pêşketina bi watekirin û salixkirina mirov jî bê.

20.02.2015/Abdusamet Yîgît, kurdistan/Cizîra bota....

’’’’’’’’’’’’